

Bariyê Bala

Deh bûyer

Weşanên Zengezûr

Barîyê Bala

Deh bûyer

Bîşkêk
Weşanên Zengezûr
2012



***Şev nîvî ye, xewam na yê, nizam
çima,
Minê bûme nav mitala, keder, xema.
Çiya, banya hildigirim, him datînim,
Erş û kursî gav-gav, pî-pî hev dixînim,
Çar hawirdor mêze dikim, baş nabînim.***

Barîyê Bala
DEN BÛYER . – Б.: Салам, 2012.

“Неh hîkmet” шестая книга талантливого курдского поэта-прозаика Барийе Бала. Он автор книг «Мой мир» (1974 г.), «Куда идти» (1994), «Моя Дильбар» (2008), «Мать» (2009), «Не заядшие цветы» (2011).

В данной книге содержит его новые стихотворения, философические сказания из народного фольклора и воспоминания о известных курдских личностей.

Weşanên Zengezûr

Rêdaktorê sereke: Hejarê Şamîl

hejare_shamil@hotmail.com

PÊŞGOTÎN

Barîyê Bala helbestvaneke hunerwer û berhemdare. Ew pirtûka wiye şeşaye ku, hûn destê xwe de digirin. Heta niha wan pirtûkên wî hatiye weşandinê: “Dinya min” (1974), “Kuda herim” (1994), “Dîlbera min” (2008), “Dayîk” (2009), “Kulilkên neçilmisî” (2011).

Mijarên bingehîn berhemên Barîyê Bala welatparêzî, fêrên jiyane û hezkirinê mirovaye.

B.Bala helbestvanê hezkirinêye. Hemû helbestên û malikên wî da hezkirinê welat, ax, mirov û sirûşt berbiçave. Gorî Barîyê Bala hezkirin, ked rijandine, bê ked û emel peyva ‘hezkirin’ bê hîm û bîngeh dimîne:

Bangorî bûm rebbê jore,
Ev çi qehir, ev çi zore?
Te çima em xuliqandin
Ser erş, kursî bê war şandin?

Jor nazil bû zîz dengeke,
Got: - Bendê min, zurya meke.
Min daye we zêr Kurdistan,
Herin, li wê bibin xwedan!

Bariyê Bala helbestvanê şiretêye – hîmê pir berhemên wî perwerde û hevotînê cihalan ava dibe, tê da tore û telîmê gel esas tê girtin:

Ne gezgezk be, ne jî sirîn,
Bibe bi edeb, tem şirîn.
Aqil xezna lel û dure,
Kes nafroşe, kes nakire.

Çavkaniyê helbestên B.Bala hîkmetên gel, xezneya folklorê Kurde. Ev gotinên ku, dirêjiya hezaran sal sefinokê gel derbaz

bûye gihîştiye roja me, helbestvan erka xwe dibîne, wekî wana ji bo nifşên nû dubare bike:

Gel gotiye: “Dev dikane
Her tişt tê da tê firotan.
Pişt dirana tim zimane,
Zimanê xwe bibe xwedan”.

**

Te çî reşand, wî diçîmî,
Çî dirêjî, wî hitlînî.
Dinya dore, ne bi zore,
Te çî kiriye, wî dibînî.

Ew fikir di nav helbestên Bariyê Bala weke xetten sorîn derbaz dibe – pêwîste mirov ji fêrên (dersên) jiyane encam bigre, qencî û şaşiya xwe bike çirayeke pêş xwe. Xêncî hîkmetên gel, helbestvan ezmûnên (tecrube) jiyana xwe jî dike mijara berhemên xwe:

Firsend ku hat bernede zû,
Te ku berda, nekeve dû.
Kî firsendê dide dere,
Tim dimîne xwelî sere.

Bilî helbest, Barîyê Bala pexşan nivîsariyê jî dike. Bîranînên xwe ya dewlemend bi pexşan tîne ziman. Di vê pirtûka da jî du bîranînên Barîyê Bala derheqa Şamîl Esgerov û Mehmedê Siloyê Bava da bixwînin.

Barîyê Bala îro 75 salî ye, lê dilê wî hele gence. Behremên wî jî dide nîşandan, wekî ew dema pêşketina aferînderiyê xwe jiyane dike. Em bawerîn ku, helbestvanê hêja di demên pêş da berhemên xwe va nû xwendevanên xwe dilşa bike.

Hejarê Şamîl
Nivîskar, lêkolînvan.

HELBEST

BENDÊ XWEDÊ, MİRİN HEYE

Pî rast dayne ser mêzînê,
Baş mêzeke rewşa dinê.
Hemû derda derman heye,
Tune ilaca mirinê.

Hespê boze, bê zîn, basûd,
Vekirîne pêş wê hudud.
Ku dixwaze peya dibe,
Qenc û xirab, fitê nade.

Ew mêvana tew bendeye,
Bersîvdarê pêş xwedêye.
Hatina wê kes nizane,
Çûna wêye pir girane.

DİÇİM, DİÇİM

Rê dirêje, diçim, diçim nîvî nakim,
Çar hewirdor, dûr û nêzîk mêze dikim.
Ne îns hene, ne cins hene, kes ranabe,
Çi ecêbe, ax tu car bê xwedî nabe.
Rebbê jorîn ev ax boy kê xuliqandiye,
Mirovên vira çi pêkirye, kuda şandiye.
Çi dibînim, nakêlimin, bê dengiye,
Tew daristan dûyê reş da qimiliye.
Cem û kanî şêlû bûne, sor dikişin,
Hemû bînber tewifîne, rêz nakişin.
Bombên jehrê erd kolane, cel çêbûne,
Sosin digrin, hemû kulilk cilmisîne.
Tofan rabûye, Decal zîz diqîrîne,
Roxan nake, erş û kursî hev nabîne.
Dît, kalekî hiz-hizî xwe veşartiye,
Cile xilmet, nîv bedena wî devraye.
Lez nêzîk bûm, zû jê kire pirs, hewale,
Got: - Mamo can, çi qewmiye, ev çi hale?
Kuda çûne, keç û xortên tûnsiz, delal,
Bav, dayikên qedir, qîmet, ked-hed helal?
Kanî dengbêj, sazbandê geş, govend, dîlan,
Bûkê nazik, çît û perde, meclîs, mêvan?
Egît, mêrxas, bok-beranên simêl palik,
Kal û pîrên destê wan da nevyên rindik?
War-warkozên koçervana, ela giran,
Ken-henekên bêrîvana, bêryên miyan?
Kon-çadirên pêz vegirtî, dûyê koçkan,
Çize-çiza tem kivavên dil, gurçikan?
Kake-kaka kew, bilbilê dora gula,
Qire-qîra qaz, werdekên nava gola?
Seyrangehên rind, bedewên lê razayî,
Karxezalên mêrg, çîmana terh vedayî?
Hoke-hoka eşq şivana, zengilê nêrya,

Xas menekên zîn, basûde ber deriya?
 Kulînên tijî rûn, dew mast, sêpyên danî,
 Hasila nû, ruzê zara, can kevanî?
 Gund û bajar, sûk, kolanên fire, kêamber,
 Bircên sipî, gulistanên dergevan ber?
 Kî xwînxara kafkûn kirin, hûn zêrandin,
 Bi çi çekê agir, alav wê barandin?
 Kal ricifî, hejya rabû, min hihêrî,
 Kirê îskîn, keser kişand, him kewgirî.
 Got: - Kurê min, welatê min Kurdistane,
 Him ser, him bin, lel-cewahir, xezne, kane.
 Xwînxar tu car destê xwe jê venakşîne,
 Me ra aniye zulm, koletî, girî, şîne.
 Tank, balafir ev welata wêran kirin,
 Çûk û mezin kî kete ber, tew qut kirin.
 Zêrîn gihîşt asîmanê herî jore,
 Qetilkara nedane hev, mecal, dore.
 Bû zêre-zêr, laş ser laşa bûne parte,
 Xwîn kişiya, bûn lêpe-lêp çal û korte.
 Filitî çûn Qendil, Zapê, Avaşînê,
 Boy vê zulmê bikin şêwra serxwebûnê.
 Berya gotye: “Zor gizêrî cî radike,
 Beraz bê kut, şûna girtî vala nake”.
 Lawê Kawe, pêş neyara xwe mêl nake,
 Azayî nayê stendin bê tivinç, çeke.
 Ayê beranê kol, beranê kel ra namîne,
 Kê çi kiriye, wê cezayê xwe bikşîne.
 Ala meyê bimilmile hemû qulça,
 Welatê me wê aza be gura, hirça
 Serokê me wê derê ji taristanê,
 Gulê vebin çiya-banyên Kurdistanê.
 Axa meyê dîsa bibe heq cinnete,
 Tu dila da wê nemîne tel hesrete.
 Wî culetê kalê mêrxas ez şa kirim,
 Bask dane min, çend qata ez evraz kirim.
 Sih kir xwînxar bêhna dawiyê dikşîne,

Yekbûna gel koletiyê wê hilşîne.
Fedî mekir tirs û xofê, ne mirinê,
Da ser riya Qendil, Zapê, Avaşînê.
Gihîştîme wê axa ziyaretîye,
Çûm huzura bok-beranê dinê diye.
Mitheyr bûme, wê dîdemê, ewê rewşê,
Ewan qayda wan qanûna, wê timtêşê.
Min wir dîtî esil maqûl, comerd, mêrxas,
Keç û xortên welatheze esil da xas.
Gelek kesên boy azayê dibin feda,
Pir serokên peyda nabin li tu erda.
Min rebbê jor şikir anî hezar care,
Gelêm yeke, tekoşînê nayê xare.
Wê serxwebûnê bistîne sedî, sede,
Neyarên har nexenqîne, dest bernade.
Laşên wiya wê binaxke, êdî yek car,
Ala meyê bimilmile kubar-kubar.

KUDA HERİM, KU BİGERİM

Min pî danî kîjan axê,
Çol û mergê, gund û taxê.
Dengek hate guhê mine:
-Heye xwedan, xweyê mine.

Ketim nav mitalên kure,
Hîvî kir esmanê dûre.
Cem xwe şûnek bide mine,
Got:-Şûna te cem min tune.

Bangorî bûm rebbê jore,
Ev çi qehir, ev çi zore?
Te çima em xuliqandin
Ser erş, kursî bê war şandin?

Jor nazil bû zîz dengeke,
Got: - Bendê min, zurya meke.
Min daye we zêr Kurdistan,
Herin, li wê bibin xwedan!

Xwînaxar ji wê bikin dere,
Mehêlin ew biger sere.
Boy wê bidin ruhê xune,
Êdî medin yekî dine.

Hişyar bûm, xewa mirinê,
Danî pêş xwe nexşa dinê.
Dît ev çiqas sal, zemanê,
Axam kirna bê xwedane.

Hildan çek, sîlahên xune,
Çok veda pêş dayka xune.
Got: - Aza mekim axa te,

Helal nebe min şîrê te.

Dûvê dinê pir dirêje,
Alîk paqij, yek qirêje.
Ba hêlekê na domîne,
Zulm bêdawî qet namîne.

Ketme nav berf û baranê,
Him zozanê, him aranê.
Tiving danye ser milê xwe,
Aza dikim welatê xwe.

BARÎ ME

Hatim dinê, wa dest pê bû dîroka min,
Bûme bêbav, agir kete nav dilê min.
Sêwîtiyê li min kar kir, bûme hîro,
Riya bavê xwe nihêrî, him şev, him ro.
Hogirên min “bavo” gotin, ez giriyam,
Goristana gora bavê xwe geriyam.
Kesî negot, min gîtiye, ew li vire,
Destê negirt, ez nebirim tu car sere.
Hezar lenet bê Hîtlêrê hovî, hara,
Gora bavê xwe nedîtiye qet tu care.
Zarotiya min buhurî keder, xeme,
Kesî banî min nedikir, herim ceme.
Deh saliyê da min pî danî dibistane,
Zarên hevt sal kenyan, tinaz kirin mine.
Bahar, havîn tezî, pêxas bûm golikvan,
Bin piyên min kul dikirin kereng, pîjan.
Birînê min diaxivîn, kê m digirtin,
Dayîka min her ro arxavk lê dikirin.
Ew rebena ne gihîşt bû sala siye,
Ser hev sêwya rûniştibû êdî biye.
Şev û roja dişuxulî ew bê dore,
Diheliya nolî mûmê dihat xare.
Boy parî nan digiriyam gelek cara,
Tew xewna da bavê min nan dida min ra.
Sal, pey sala difiriyam yeko, yeke,
Şer xilaz bû, veqeriyam pir hindike.
Şahî kete hinek mala, şêmîk, derya,
Çavê min qerimîn, bavê venegerya.
Biryê minî mezin Mehemmedemîn,
Bû bavê min, nedihîşt dilê m bike kizîn.
Sibeke eşq, wî ez birim dibistane,
Xênî kurda min nizanbû tu zimane.
Gav û rojên giran, şewat diheliyan,

Ser dilê min tenê rêçên wana diman.
Hêdî-hêdî emir diket riya xune,
Digot: - Bavê m çûnê, tu sipartî mine.
Ez gerekê weyseta wî biqedînim,
Dinya heq da pêş wî şermeze nemînim.
Min ew gotin boy xwe kire tim rênişe,
Pir çerçirîm, wekî her dem herim pêşe.
Rebbê jorîn qudreta xwe da ser mine,
Paqijayî, helalî kir para mine.
Gihîştîme wê armanca ku min dixwast,
Xwe ra bijart rêke bê doz, tîlane rast.
Timê dûr mam kîn kudreta, derew, lafa,
Boy gelê xwe pir xizmet kir, kişand cefa.
Barê giran min hilda ser milê xune,
Bûm helbestvan, şakim dilê gelê xune.
Şikir xwedê îro hatye baş dewrane,
Keç, xort gerek emir mekin berhêwane.
Boy gelê xwe bikin kara paqij, helal,
Bê telp bijîn nolî ava kewser, zelal.

MÊZE DİKİM, BAŞ NABÎNİM

Şev nîvî ye, xewam nayê, nizam çima,
Minê bûme nav mitala, keder, xema.
Çiya, banya hildigirim, him datînim,
Erş û kursî gav-gav, pî-pî hev dixînim,
Çar hawirdor mêze dikim, baş nabînim.

Dibim avjen, nav beran da dixuldirim,
Wek teyrê baz, bask vedidim, dimilmilim.
Mîna şera daristana dihejînim,
Ça qewalek kasil-kasil dilîlînim,
Dûr û nêzîk dinihêrim, baş nabînim.

Dixalifim, digihîjim serê dinê,
Kerîşa ra dişiqîtim binê dinê.
Ber her zerê, her zinarî pî datînim,
Emrê çuyî pêş çavên xwe dibim, tînim,
Pejmûr, pejmûr dipokinim, baş nabînim.

Kîjan hêlê difetilim sexir, sêwya,
Kal û pîren bê kes mane, ber deriya.
Bûkên stuxar, zêre-zêra xwîşka, dîya,
Dewsa avê golê xwîna bêguneya.

Gure-gura tanq, teyarên agir reşîn,
Gund-bajarên kaskûn bûye zelûle, şîn.
Kuda diçim ku dizvirim, wan dibînim,
Dawiya dinê wa bimeşe, baş nabînim.

Dibêm xwezil, nexulqîma ez vê dewrê,
Min gelê xwe qet nedîta nav vê zulumê.
Demek usan bihatama rûyê erdê,
Wekî aza bigeryama ser axa dê.

Doz, koletî, zulm, sexîrî nedîtana,
Hemû bende mîna bira tev bijyana.
Dinya qasek rihet bûya bîn bikşanda,
Kesî, tu kes ne zêranda, ne êşanda.

Min erş-kursî safî, zelal tim bidîta,
Keç û xorta hub bida hev, naz bifrota.
Aşitiyê penc bavîta rûyê dinê,
Hemû sînor bihatana naskirinê.

Tew bibûyana xwediyê axa xune,
Kurd jî rihet rûnişta ser para xune.
Welatê xwe min bidîta dew, doza dûr,
Bê tirs, bê xof bijiyana hemû gir-hûr.

Min çok veda pêş rebbê jor, şikir bikra,
Serkeftina gelê xwe zû pîroz bikra.
Nav van xema, mitala da dikewgirim,
Dubar, dubar erş û kursî hev dixêrim.
Ber çavên xwe valahiya kûr dibînim,
Dinya wekî wa bimeşe, baş nabînim.

DÎLO, PÎR MEÊŞE, GELEK ZÛYE

(Ser kirinê dinya bêdûm mitheyr mame)

Lez mekeve, şûna xwe da rihet rûnê,
Hevî dikim, meqetîne min vê dinê.
Bihêl bijîm westê ji xwe dûr bavêje,
Rexne bikim evê dinya telp, qirêje.
Wekî zane hewcê bûye parî nane,
Nezan bûye him hukumdar, him xwedane.
Kedkar bûye sêwî, sexîr, birçî, tezî,
Kedxwar bûye xwedî destûr, xeznên tijî.
Însaf, murvet, dil, mejûya derxistiye,
Zulmê, qetlê nav ruha da cî kiriye.
Kes li kesî nabe xwedî, ne piştovan,
Bê sûç, gunê zîqa dibin tew bê xwedan.
Hinekî jî sebir bike, tişt nebêje,
Hogiriya min, xwe usan zû mavêje.
Xwezil, kî ça xuliqî bû, usan bima,
Kes pêş kesî feqîr, stuxar tu car nema.
Çi pêwîst bû, ewqas millet hatin dinê
Ewqas hezar zar û ziman ketin holê.
Bila hemû zaravekî biaxviyana,
Tev hatibûn, nolî bira bijiyana.
Wê nebûna dîl û xwînrêj, ne jî hejar,
Rûyê erdê wê bibûya tenê bahar.
Xwezil, mirin bîra benda derneketa,
Boy nefê xwe, kesî tu kes ne zêranda.
Xwedê bende ku xuliqand sê renga da,
Çima wî ra ezim, ezim, temaq jî da?
Wê nebûna ewqas qetil, ev dozana,
Hemû bendê paqij, dilpak tim bimana.
Wekî dinê ser milê min cî bibûya,
Minê hilda, hêsa, rihet bikişanda.
Mesekinya, wede zûtir peya bûya,
Gema wêya minê zexim hilkişanda.

YA XWEDANÊ ERŞ Û KURSÎ

Him jor, him jêr emir, ferman dest te da ye,
Dayîn, stendin, ew tenê bi hukmê teye.
Hineka bin baskên xwe da xweyî dikî,
Hineka jî nabî xwedî, xwe dûr dikî.
Qismek benda nav heyê da dibirsînî,
Qismekî jî feqîr, birçî dibinsînî.
Parek te ser suryê berîn xuliqandiye,
Boy kêf bike, kêreke tûj jê ra şandiye.
Parak ji ser dûvê berîn cîwar kiriye,
Dewsa kêrê, neynik, pêçyên ko şandiye.
Roj vedroje, şev vedroje, tişt nabîne,
Pêçiyên wî venakişin kêr, birînê.
Dinê dijî ji ser emir tişt fehî nake,
Dema dimre, tu kes boy wî şînê nake.
Qismekî ra emir dikî tim cinnete,
Gav rojê wan naçin bê kêf, bê dewete.
Nav heyê da kubar dijî ew heteva,
Dema diçin, dişewite dilê tewa.
Ya rebbê jor, rica min te tenê ewe,
Boy tew benda risq bişîne weke heve.
Bila bende ruzayê xwe bibin xwedî,
Ji dinya te bila meçin pir xeydî.

YA XWEDANÊ BÊ XWEDANA

Dema te ax par-par kirin,
Para gela verêkirin.
Çima ne got bendê xune,
Çav ne kutin parên dine?
Her kes bijî ser para xwe,
Boy wê bide ruh, canê xwe.
Ax şerefe, him hebûne,
Wek wê baha tu tişt tune.
Ew û dayik nolî hevin,
Cuda nabin, time tevin.
Ewa kesê bê welate,
Bê qedrî û bê qîmete.
Dero-beroy ne zindiye,
Zûda dinê bar kiriye.
Bê hêlînî sergerdane
Şeva, roja ser riyane.
Dereng bê jî nika bêje,
Xwînxar axa me bavêje.
Em jî sih kin bêndê tene,
Nemirine, şikir hene.

GELÊ KURDA, DEM HATIYE, HEMÛ RABÎN

Dema serokwezirê dewleta Tirkiyayê Receb Tayip Erdoxan, 2011-ê, meha cotmehê miqabilî gerilayên kurde ser Qendîlê, Zapê, Avaşînê û ciyên din fermana şerê hewayî da, min zendegirtî bangorî rebbê jor bûm, got:

- Ya rebb, him jor, him jêr hemû emr, ferman dest te da ne. Bê destûra te tu tişt nabe. Ya tu dizanî, kes nizane. Lê carana hinek qewmandina tu duxuliqînê dawiya wana boy bendê te dibine heşirmîzan, gola xwîne. Ji wan qewmandina yek xuluqandina Adolf Hîtlêrê xwînxar bû. Qurna bîtsî, emrê xwe bi xwînê va xitim kir. Ez ecebmayî dimînîm. Nika jê Hîtlerekî duda te xuliqandiye, ew jê dixwaze nav qurna bîst û yekêye ewil emrê xwe bi xwîna kurda va xitim bike.

Ez dilekî xemî, xeyalî, zendegirtiyî pir zelûl banî hemû kurdên xwedî şerefe, welatparêz dikim, dibejim: “Gelî kurda, boy azabûna welatê xwe hemû hevra rabin, qîret bikin. Ruhê xwe nehêvşînin. Mirina namûse boy serkeftina welêt, ev şerefe. Gel wan şehîda tu car bîra xwe dernaxe, pêş wan bejna xwe ditewîne. Dawiyê gora wan dike ziyareta miqerim. Dubar banî gelê xwe dikim, dibêm:

Gelî kurdên pir zêryayî, hemû rabin,
Dest bidine destê hevdu, tew komkar bin.
Êdî bese, koşka zulmê bihemdînin,
Heyfa xweye kevin, teze dest hilînin.
Decal hatiye, agir, alav jê dibare,
Fitê medîne, gurê gewrî pir xedare.
Dîroka reş dubar, dubar bînin pêş xwe,
Pir demên wa, we dest dane bi destî xwe.
Neyar durû, him fêlbaze, nabe pake,
Dem hatiye ji axa xwe derxe, rake!
Ew axa ku kal-bavên me lê razane,
Bila xwînxar pêpez meke, gora wane.
Hamûs, qîret rebb şandiye boy bendane,

Bê namûsî merezeke bê dermane.
Dermanê wê hezar-hezar tûk, lenete,
Boy qenc kîrnê, destê tebîb bê taqete.
Ku sikitî, tu kes wiya bîr nayîne,
Laşê wiya bê kes ser riya dimîne.
Rabin, rabin, fîrsendê dest medîn dere,
We ku da der, hûnê bibin xwelî sere.
Wê we qutkin, bîngêr ser te bigerînin,
Kan, xezneyên te, wê bê kefil bikişînin.
Tu bimînî kole, xulam û bindeste,
We te bigrîn kevr, kuçik, çok û beste.
Qetîkarê qotê te da zexm lêxîne.
Ciwata da te bikene, der dexîne.
Şerefa xwe pêpez mekin, rabin piya,
Tîm serkevtin bibe sonda we hemûya.
Kî neyar te pîrs bike, wê bersîv mede,
Boy nefa xwe çerxa zemîn wê çep bade.
Rast gotine: “Namûs, xîret çot birane,
Bê namûsî ne senetê mêrxasane”.
Rabin, rabin, qotê neyar bipelxînin,
Destê zorê serkevtina xwe bistînin.
Qîret bike, dayîk û bav hîvya tene,
Gurê gewrik welatê xwe dûr bixine!

SEROK BERZANÎ LI ENQERÊ AXIVÎ.

*Dema serokê Federasyonê Kurdistanê Mesûd Berzanî
01.10.2012-salê li Enqerê srebajarê Tirkiyayê kongrêya AKP-ye
çara da kelim pêşda hat, min hîs kir, wekî orta min xwedê da
bihostek valayî maye.*

Şikir, îro wek teyrê baz,
Bilind bûme erşê evraz.
Esmanê şîn dimilmilim,
Sih dikim bê derd û kulim.
Nav serokên nîvê dinê,
Serokê kurd hate xanê.
Gelek maqul, pir merdane,
Tîna xwe da rûniştiane.
Dengekî zîz ban kir wana,
Lenet anî qetla, xwîna.
Got: - Edlayî heqe, ferze,
Bê wê dinê pir mereze.
Hemû çeka bihelînin,
Bende hevdu bihebînin.
Êdî red bin dew û doze,
Dinya xweke xemla teze.
Esman safî, zelal bibe,
Erd gul vede, hêsa bibe.
Hemû sînor bê naskirin.
Gel xwediyê axa xwe bin.
Piçûk bijîn bê tirs, xofe,
Dibistana bibin refe.
Welat, welat tev bigerin,
Şa welatê xwe vegerin.
Her der bibin gul, gulistan,
Mal nemînin bê dost, mêvan.
Kes tu kesî meêşîne,
Zulm, zelûlî qet namîne.

GELÊ QAZAX, CEJNA BÎST SALIYA SERXWEBÛNA TE PÎROZ BE

Ez kurdekî bêhêlînî, welêt dûrim,
Xêlek deme, bê xof, bê tirs, rihet virim.
Pir dîroka hevdixêrim pêl û pêle,
Dîroka te, wek dîroka gelêm tele.

Welatê te tîş-tîş kirne gelek cara,
Hespê xwe lê bezandine pir xwînxara.
Hêbûna te destê zorê tew birine,
Gir, hûrên te qema ra derbaz kirine.

Lawê Qazax pêş neyara mêl nebûne,
Boy axa dê ruh-canê xwe buhurîne.
Derbên giran ser neyar da xar kirine,
Welatê xwe hovî, hara xilaz kirine.

Resûlê xwedê dinê ra îslam anî,
Kurd Selheddin temelê wê qaîm danî.
Rûyê Pyotr Evropayê rewaq vekir.
Bok Nûrsûltan Astaneke nû zû çêkir,
Ber gelê xwe dergê dinê fire vekir.

Însanê mezin,

Patşê dinê te anîne welatê xwe,
Da nîşandin erf û edet, dîroka xwe.
Riya hervirmûş nav denge, him şerefe,
Bajar, gundên te çêkrine, bûne zehfe.

Qazaxistan te kiriye êdî cînet,
Kirnên teye mejûya dûr, bûna erbet.
Nêron Roma kire rijî, lê mêze kir,
Te welatê xwe xemiland qutnî lêkir.

Kirinên te pir kirina evzeltirin,
Gelek mizgevt, dibistan te bilind kirin.
Dîrok tu car te bîr nake, qelbê mezin,
Bin siya te em vir dijîn, nakin gazin.

Nav emir da bîst sal demeke hindike,
Gel ku yek be, çi bixwaze, wê wî bike.
Welatê dê tew dinê ra te kire nas,
Hemû dayîk naynin dinê lawê mêrxas.

Sed sî millet li vir bûne dost û bira,
Ev edlayî, qet tunene li tu dera.
Boy xatirê me mêvanê bê ref, dûr war,
Xwedê te ra emrê dirêj bişîne par.
Ala Qazax wê tim xan be nav ala da,
Navê teyê bê weklandin tew qurna da.

HELBEST ÇIYE...

Helbestvan henin kû, ne qedrê helbestên lel-dur bahatir dizanin, ne jî çawa helbestvan qedirê xwe dizanin. Xwe her dem pêş mirovên tiştê fehmnekirî wek zilekî nizim dikin. Cî, bê cî helbestên xwe her kesî ra dixwînin. Meclîsa da xwe nikarin rê bibin, gelekî veduxun, xwe unda dikin. Kurte gilî, xwe dikine pêkenî. Loma jî ez wan helbestvana ra dibêjim:

Ey helbestvan, sivik nebe,
Malê teyî pir bahaye.
Bilind bigre, erzan meke,
Helbesta xwe wî kesî ra,
Aza, serbest tu bixwîne,
Ew helbesta te fehm bike.
Helbest behreke bê bine,
Alemeke xemle dine.
Ew tebîbe, him loxmane,
Wek wê şîrîn tu tişt tune.
Av kewserê zelaltire,
Lel, cewahir bahatire.
Meydaneke ber, fireye,
Kihêleke zehf quleye.
Kulîlkeke nûhe, bîne,
Tem, lemekî pir şîrîne.
Hingiv, qende, him şerbete,
Melhemeke bê qîmete.
Çiyayeke ser bilinde,
Bedeweke nazik, rinde.
Tel gezgezke, tûj sirîne,
Ku axivî, kûr birîne.
Xezaleke çavbeleke,
Al sitîke kêf, heneke.
Wekî hînbî zarê wêye,
Tu ewledî, ewe dêye.

Wê bimeşe roj, şev, tev te,
Mehez bike dev, lêvên te.
Wekî bigrî hurmeta wê,
Wê navê te bihêl dinê.
Zane peş te xwe xar bikin,
Wek asîman bilind bikin.
Gencê maç bikin destên te,
Girê bine tewafa te.
Ne qismetê her kesiye,
Şewq, şemala rû dinêye.
Baş sih bike, êy helbestvan,
Rûnê, rabe aqil, giran.
Bê cî meke leme-leme,
Pirs dane te bikêlime.
Kîbûna xwe baş nas bike,
Pêş tu kesî xwe mêl meke.
Ew xilfîne, him nazike,
Wê nafroşe nanê zike.
Boy wê dijîn Xeyam, Rûmî,
Kal Fîrdovsî, Kurd Nîzamî.
Herîr, Feqî, Batê, Xanî,
Hejar, Goran, Cegerxwînî.
Mêr hatiyî, mêr bimîne,
Wek mêranî tişt tu nîne.

DOSTÊ MINÎ PÎR JÎ XWE RAZÎ

Ji xew rabe, baş bibihê van gotina,
Nav emir da lez mekeve qet tu dema.
Qewmandinên giran, sivik, dayne, hilde,
Hev bijbêre, kîjan kêr tê, ewe rinde.

Çi ku hene bi ziravî timê dişkên,
Mirov gelek qalim dibin, paşê dişkên.
Hinek nerm be, hukmê ne pak zû-zû mede,
Tevî gel be, ezim-ezimê ji dest berde.

Rokê baran, rokê dertê tava rengîn,
Pir hur nebe, îtbar tune çerxa zemîn.
Dûh şêrbûyî, emir dida ser her kesî,
Îro mişkî, pêwîst nînî tu tu kesî.

Milahîmî nîgara rûyê bendane,
Qedir, hurmet, nav dengê rewş girane.
Çûka ra çûk, mezina ra bibe mezin,
Boy kirinên te bila kesek meke gazin.

Dîtî bêjin: Sed aferim eslê te ra,
Ev maqûla pir pêwîstî gelê me ra.
Nav dengê te, bê kişandin li her deran,
Gel gotiye: “Diran tên pêşiya ziman”.

Riya emir kaş-kerîşe, him sirîne,
Bê amine, him dibe tel, him şirîne.
Bîr dermexe, tu kî bûyî, nika kî yî?
Ne eyane, paşerojê bibî kîyî.

Qîmet qedrê salên dirêj berav kirî,
Şaşîkê da unda dikî pey digirî.
Berê bipîv, paşê bibir, nebên qelpe,
Kesê aqilî paqije, him bê telpe.

Bibe comerd, nefê bide gelê xune,
Boy mal-dewlet naguhere navê xune.
Gel sûra zêr, ziyareta bê himbere,
Bav-biraye, him dayike, germ sitare.

Gelek hatin, zû bilind bûn, gel avîtin,
'Ezim' gotin, qetil kirin, pir xwîn rêtin.
Dawiyê da bûna hewcê pârî nane,
Kapê heqyê stuyê wan bû mêvane.

DOSTÊ MINÎ XAP-XAPOK

“Dostekî” minî serî, sîçeyî nav êlê da xwediyê qedir qîmetekî pir bilind heye. Ev çend sala ji min piçûktire û salên dirêjin, wekî hevdu nas dikin. Em gelek cara xêr-şerên êlê da û qewmandinên cuda-cuda da rastî hevdu ten. Bi hurmeteke bilind va jî hevdu diqetin. Min ew mêrekî xwediyê şertê xwe nas dikir. Carekê em meclîseke heytehûte girîng da dîsa rastî hevdu hatin. Ew hate cem min, ez hemêz kirim, kete ber milê min. Va alî, wa alî hejandim. Çawa dibên, erş-kursî bin piyê min da kire du tîşa. Deşt, zozan, bax, baxçe û gelek-gelek tiştê mayîn tew baxişandine min. Dawiyê da dîsa ez hemêz kirim û got: “Xalo can, ez herdu çavên te bixum”.

Ez vebîşirîm, mat-mat rûyê wî nihêrî û got: “Kuro, qet gunê te min nayê, wekî herdu çavên min dixwazî bixwî? Lê ezê bê çav çawan bijîm?”

Ew dîsa kenîya, dubar-dubar got: “Xalo, ezê zûtirekê bême zîyareta te”.

Me xatirê xwe ji hevdu xast. Dêmekî eşqî, şa hevdu qetiyên. Min ew gelekî raçav kir, ewqasî riya wî nihêrî, çavên min qerimîn. Saet bûne roj, roj bûne meh. Çend-çend hevte hatin û buhurîn, lê ew ne hat, nehat. Niha hîviya salê me. Feyde tune, ewê salê da jî nayê. Min boy ne camêrtiya wî “dostê” bê îtbar ev helbest nivîsî.

Te gilî da, tu nehatî,
Te eyan kir, ne comêrdî.
Barê vir ha pir şerm bike,
Çi dikarî, ewî bike.
Pî dirêjke wek bera xwe,
Bibe xwedî gotinên xwe.
Berê bipêj, hê birêje,
Derew lafa qet nabêje.
Gel gotiye: “Dev dikane
Her tişt tê da tê fîrotane.
Pişt dirana tim zimane,

Zimanê xwe bibe xwedane”.
Jiyan pirtûke, jê hîn be,
Tevî qenca rûnê, rabe.
Riya xar da tu qet meçe,
Dawiya te bibe pûçe.
Got, nehatî, firqî nake,
Derew rûya pîr reş dike.
Wekî qenc be, navê teye,
Bibe xwedî şertê xweye.
Laf pî digre, lê nameşe,
Rastî rewşa here başe.
Rastî nava tim jor dike,
Derew serya berjêr dike.

Xêlek wede derbaz bû. Derheqa wî hinek rûspiya ra hewalda.

Wana gotin:

“Malik avao, te çi unda kiriye, tu çi digerî? Her kesek dikişîne şîrê dayka xwe. Hêla dê da tamareke wiye xirabe. Loma ewqasî derewbêj derketiye”.

Piştî gotina wan ev çar xetta nivîsî:

Şîrê dayka ku paqij be,
Ziyan nayê tu car jêye.
Behra darêye şîrîn be,
Darê nayê jêkirinê.

**

HEZKİRİN

ÇAVBELEKA MİN

Çavbeleka buru qeytan,
Carek bibe mêvana min.
Mêze bikim wan xal, xetan,
Xewê rabe, kal dilê min.

Biaxivin ribirû ye,
Şa be dilê min te teve.
Rica dikim meçe, zûye,
Hesret dilê min derkeve.

Sîngê sedef bikim meydan,
Şevbirekê lê derbazkim.
Xastinê xwe bînim ziman,
Rebbê jorîn şikir bikim.

Mehez bikim bisk, keziya,
Têr destê xwe bialînim.
Bîkrim êşa, tew qeziya,
Cinneta heq ez bibînim.

GERIYAM

Ciya geriyam, tu nedîtî,
Deşta geriyam tu nedîtî.
Bûme avjen, ava geriyam
Tu ava da te nedîtî.
Rê dirêj bûne, bûn nîvî,
Tew buhurya min kir hîvî.
Zarêm derket yek naveke,
Ji wan pirsî min nevseke.
Tewe li min mêze kirin,
Hev nihêrîn, deng nekirin.
“Dîlber, Dîlber”, min got bilind,
Ah, zarên min kevir heland.
Yekî deng da dengê mine,
Hêsir rêtin hat cem mine.
Got: - Birê min, melûvîne,
Baş mêzeke halê mine.
Ez jî ketime roja teye,
Rebb ew kiriye para meye.
Wê megere tu vê dinê,
Bûye rêwiya dinya dinê.
Poşman-poşman hatim şûnda,
Şikir anî emrê xweda.
Xuliqandî tenê ewe,
Xeniqandî dîsa ewe,
Fermana wî boy tewaye.
Xwedanê herdu dinyaye.
Min bawer kir rehma wiye,
Çok veda pêş navê wiye.
Dinya neheq avît bîre,
Boy dinya heq kir tevdire.

BERFA EWİL

Nerm dibare, kulî hûrin,
Ez delale ji hev dûrin.
Qet nizanim nika kuye,
Yeqîn ew jî bin berfêye.
Reş keziyên zirav, çûke,
Sipî kiriye berfa pûke.
Berf dihele, dilop dike,
Çav, buriyên wê şil dike.
Xwezil min jî nolî berfê,
Hêdî danya ser lêvên wê.
Biheliyama bimam wire,
Hesret dilêm biçiya dere.
Sih bikira hetev ezim,
Tu cî naçim, ez ne lezim.

XWEZİL

Xwezil, xwezil, wê baharê
Belg vekirbûn çiqîlê darê.
Digeriyan nav daristan,
Diaxivîn heyran, heyran.

Direviyam, dikeniyam,
Dilitimiy, dihejiyam.
Dema digirt min destê te,
Dinyake nû dida min te.

Dora merxa me çerx dîkir,
Car-car hevdu hemêz dîkir.
Bûbûn dilê eşqa hubê,
Dida ser me tava sibê.

Şam û çînar şedê me bûn,
Şîlan, çivîç hogrên me bûn.
Bajin-bala spîndarê,
Pêş te xuber dihat xarê.

Bilbil xewê ranebûbûn,
Kewa hêlîn germ kiribûn.
Kara xezal li dû makê,
Kale-kal bû ne carekê.

Avya lêvê sorgula ter,
Şil kiribû kulîlkên per.
Sosina me mêze dîkir,
Rihana bejn quloz dîkir.

Xweza rewş xemilî bû,
Gezoy sibê hê ne çûbû.
Te ez kiribûm bextewar,
Dimeşiyam kubar, kubar.

Teyrik pêş me xof difirîn,
Te nişkêva dikir qîrîn.
Xwe davîte hemêza min -
Diketme dinyake din.

Xwezil, xwezil ew bahara,
Dîsa paşda vegeriya.
Minê destê te berneda,
Boy te jiyana feda bida.

NAZİKA KURD

Ne zem-zemî, ne kewserî,
Tu ji wana zelaltirî.
Ne kulîlkî, ne sorgulî,
Tu ji wana zehf bîntirî.

Ne cewahir, ne lel-dûrî,
Tu ji wana bahatirî.
Hingiv jî nakim himberî,
Tu ji hingiv şirîntirî.

Ne roj, hîvî, ne sterkên dûr,
Ne çem, kanî, ne behrê kûr.
Kulûr, kulûr benda yekî,
Bê hemberî, hebûnekî.

Xuluqiyî ji qudretê,
Kesk, sor û zer bejna te tê.
Haveynê te nişa xase,
Eslê teyî dinê nase.

Dîtî dibûn te hişmetkar,
Wek te tune nazik, kubar.
Rebbê jorîn hewesa xwe,
Niqîşandî bi destê xwe.

Şîr daye te dayka mêrxas,
Rinda ra çi xemil, kiras?
Ça hatiyî, usan heyî,
Xanim, xatûn, bijareyî.

Biska bade, guliya şeke,
Çav û burya qet kil meke.

Reng hîlnade dêmê alav,
Tu bedewî bê misk, gulav.

Dayik, kedkar, him şervanî,
Melhema ser birînanî.
Namûs, xîret tacê teye,
Tew Kurdistan xemla teye.

GULÊ

(Kilama lîrîkî)

Gulê, Gulê, gula çiya,
Ez ramûsim herdu rûya.
Xal sûreta min dûr meke,
Na, na nebê, nazya meke.
Were, were, hîvya te me,
Dîl, merûmê huba te me.

Gulê, Gulê, Gulê canê,
Gul-kulîlka Kurdistanê,
Biska bade, gulya şeke,
Xizêm dayne çava kilke.
Were, were, hîvya te me,
Dîl, merûmê huba te me.

Gulê, tu min meêşîne,
Derî, eywan megerîne,
Dem hatiye, nebuhure.
Erê, erê, erê bêje,
Dil hinavên min nepêje.

NÛRA MÎN

(Kilama lîrîkî)

Ez eywanê, tu eywanê,
Nûrê, Nûrê, Nûra min.
Bahar, havîn, zivistanê,
Tu delala dilê min.
Ez ramûsim te mêvanê,
Nûrê, Nûrê, Nûra min.
Ez ramûsim, te mêvanê,
Tu delala dilê min.

Ez kaniyê, ku kaniyê,
Nûrê, Nûrê, Nûra min.
Zêra dayne ser eniyê,
Tu delala dilê min.
Ez ramûsim te cindiyê,
Nûrê, Nûrê, Nûra min.
Ez ramûsim, te cindiyê,
Tu delala dilê min.

Ez Tewrêzê, tu Tewrêzê,
Nûrê, Nûrê, Nûra min.
Mêvan were ser paîzê,
Tu delalê dilê min.
Ez ramûsim te tûnsizê,
Nûrê, Nûrê, Nûra min.
Ez ramûsim te tûnsizê,
Tu delalê dilê min.

ÇARXET

RAMAN

Gul bê hogir, hejare,
Hîv bê esman bê ware.
Kes ku axa dê dûre,
Kuda here stuxare.

**

Bê per-baskim, ez îro,
Welêt derim ez îro.
Kevrê xerîb dihele,
Kevir qesptirim ez îro.

**

Ber nabin, cem nakişin,
Baran bê ewr narijin.
Welat hêlîna germe,
Bê welatî pir şerme.

**

Delalê min, çiya man,
Berf heliya, çiya man.
Xwezila min wan kesa,
Welatê xwe dûr neman.

**

Delalê min, vê rê da,
Yar buhurye vê rê da.
Herdu çavê m qerimîn,
Çima naçe vê rê da.

**

Rastî xemleke însîne,
Her bende ber dora xune.
Emrê xwedê heq û ferze,
Kes namre pêş yekî dine.

**

Kaniya tijî min av hilda,
Gulpek vexwar destê rinda.
Comerd ewe boy gelê xwe,
Gelek danî, hindik hida.

**

Emir tel û şîrîn dibe,
Çem hevna xî şêlû nabe.
Dil neynûke, telp ku lê ket,
Ew tu cara paqij nabe.

**

Mêrê mêrxas nizim nabe,
Zane ciyê qenc, xirabe.
Mêr ku dibe bê qîrete,
Tûk û baran boy wî yeke.

**

Her kes diçe eslê xune,
Xwe dijbêre, riya xune.
Xaîn çiqas mehez bikî,
Nîşana xwe dide dere.

**

Bende xemla rû erdêye,
Wek wî baha tişt tuneye.
Jor kefilê wî xwedaye,
Jêr kefilê wî loxmane.

**

Xarî, xare, ew rast nabe,
Cî da şêlû zelal nabe.
Bîrê xwe da av tune be,
Av kirinê tîjî nabe.

**

Te çî reşand, wî diçînî,
Çî dirêjî, wî hitlînî.
Dinya dore, ne bi zore,
Te çî kiriye, wî dibînî.

ŞÎRET

Lawo, dema xwe raçavke,
Ewil xwe ra hêlîn çêke.
Hêlîne ku binî xas be,
Kes nikare, wê belake.

**

Kurê min, xwe biguhere,
Xeysetê xwe biguhere.
Sewdê aqîl, cewahire,
Qaîm bigre, wê dest here.

**

Kurê delal, binihêre,
Kuda diçî, binihêre.
Dinya şevêk, rojek nîne,
Paşerojê binihêre.

**

Fikrê mede gotina da,
Kevir qespe şûna xwe da.
Kal û bava rast gotiye,

Bûk şîrîne piş perdê da.

**

Zarê şîrîn bawer meke,
Kûr nas bike, hê begem ke.
Qezya ku hat, nebe lolep,
Bila bêjin mêrik loke.

**

Fîrsend ku hat bernede zû,
Te ku berda, nekeve dû.
Kî fîrsendê dide dere,
Tîm dimîne xwelî sere.

**

Dema ketî, xwe şaş meke,
Nexastiya pir şa meke.
Feqîrî boy mêra nîne,
Xaîn, xaîn jî dimîne.

**

Êlê çi got, bila bêje,
Pejmûr nebe, bila bêje.
Paqijayî rewş, nîgare,
Ew hîlnade telp, qirêje.

**

Ne gezgezk be, ne jî sirîn,
Bibe mehlem, temê şîrîn.
Aqil xezna lel û dure,
Kes nafroşe, kes nakire.

**

Aqil dijî bê mereze,
Tîmê dibe serevraze.
Berxa aqil dibe dû mak,

Bê bin dibe, şuxlê leze.

**

Dost bijbêre, angor te be,
Wek te rûnê, wek te rabe.
Wekî ew te kêr, zêdeye,
Dawî timê poşmanî ye.

**

Boy swarbûnê lez mekeve,
Hevsûdiyê tim dûr keve.
Aqil rûnê, aqil rabî,
Kevrê kesî te nakeve.

**

Nav emir da lez nekeve,
Dû her gotina pir nekeve.
Dinya timê pêlekane,
Mêr dikeve, him radibe.

**

Mesel maye ji beriya,
Peza qetya ji keriya
Ya gur dixwe, ya diz dibe,
Dema dimre bê kes dibe.

**

Mêranyê da bê himber be,
Kêr kirna da piling, şêr be.
Telp, qirêjê dûr bimîne,
Dostayê da pir îtbar be.

**

Delalê min, hişyar be,
Agah, serwext, hişyar be.
Neyar gurê peraniye,

We te mehvke, hişyar be.

**

Lawo, deva kê mêmêzeke,
Hemû hêla temaşe ke.
Dinya cinnet, him xezneye,
Xwe ra tê da cîkî çêke.

**

Kurê min, xwe biparêze,
Kêr kîrnên xwe bike rêze.
Dît bêesil, pir har bûye,
Xwe ji wiya biparêze.

**

Lawê min, qenc xirav meke,
Şîverêkê boy xwe veke.
Bila kêmber li dirêjbe,
Aqil kêmber fire dike.

**

Kurkê qure, biedile,
Gir nebire, biedile.
Doz hatinê deyax nakî,
Cîkî rûnê, biedile.

XWEDÊ

Bapîra da mesel maye,
Rebbê jorîn tek, tenêye.
Şev û roja ew cem meye,
Kefîldarê ruhê meye.

**

Boy kîrnên xwe ew pîrs nake,
Ji tu kesî fedî nake.

Xwe datîne, hasil dike,
Risq û ruza par-par dike.

**

Ferman dayî tenê ewe,
Xwediyê erş, kursî ewe.
Yekbûn tenê boynet wiye,
Ew ne daye bendê xweye.

**

Xwedê rastiyê hez dike,
Xêr û gune kom-kom dike.
Her kes gunê xwe distîne,
Xaîn bê ceza namîne.

REWAKİRİN

ZANYARÊ NAVDAR

Zanyarê dinê eyan Nadirê Keremê Hecî Nadir, heystê saliya te pîroz be.

Rehma xwedê dayka te be,
Tu anî dinê kurd şabe.
Te bilind kir nav-dengê me,
Wek Xanî yî boy gelê me.
Pir bilinda bilintirî,
Ulum da wan zêdetirî.
Ber û çiya wek ne nînin,
Ber te tenîsk, nizm dimînin.
Zanê nemir kê mên dinê,
Dur her cî nayê dîtînê.
Qazax dibên: - Şikir xwedê ra,
Lomonosov daye me ra.
Baweriya min sedî, sede,
Sterkek ser navê te be.
Wê şewq vede asîman da,
Venaêse tew qurna da.
Gelekê bin wê şewqê da,
Bibin zanê gotnê te da.
Tev Helîme xanima xwe,
Mezin bikî piçûkên xwe.
Bizewcînî wan wede da,
Amade bî şahiyên wan da.
Tim te dûr bin rojên reşe,
Hergav bijî wa eşq, geşe.
Sed saliya te ser axa dê,

Pîroz bikin îzna xwedê.
Sed sal boy te pir hindike,
Sedî jortir ne geleke.
“Wekî najî tu sed salî,
Boy wê tu xwe gunekarî”¹.

¹ Îqfbas ji Osman Sarivellî.

XİZMETKARÊ GELÊ KURDÎ NEWESTIYAYÎ

Rewayî rêdaktorê rojnama “Dîplomat” Tahirê Silêmanê Mûsa dikim.

Wek te mêrxas kê-m-kê-m hene, Tahirê bira,
Reheke qenc ez dibînim eslê te da.
Her kes sîngê xwe nade pêş nolî beran,
Heqê gelê xwe qal nake hemû deran.

“Giha ser rehê şîn dibe” got beriya,
Hindik vedikin pêş gelê xwe rê, deriya.
Barê giran te hildaye, sipas te ra,
Mêraniya te bê gotin gelek dewra.

Benda tenê rebbê jorîn dixulqîne,
Ruhek didê, dem hatinê jê distîne.
Pey her kesî qenc û xirav nav dimîne,
Navê teyê nava gel da tim bimîne.

Te ez derxistime ser çiyayê quve,
Li wir da min, ruhekî nûh, bilind nave.
Jan, êşên min te gîhandin gelê mine,
Her kesî ra Barî nabê birê mine.
Hezar, hezar sipas te ra, birê delal,
Cewahir ra qîmet dide şîr da helal.

TAHIR SİLÊMAN

Bêje, bêje dubar bêje,
Xem kederên xwe birêje.
Boy jan, êşên axa daykê,
Dilê min te tev diêşe.

Kes tune me xwedî derê,
Were rehmê, bêje erê.
Hûne heqin, ew neheqin,
Hûn adilin, ew meşrîqin.

Hûn bê gune, ew gunekarin,
Hûn maqûlin, ew xwînxwarin.
Hûne eslin, ew bedeslin,
Hûn aqilin, ewe nesin.

Hûn egîtin, ew tirsekin,
Hûn fil, şêrin, ew gurekin.
Hûn rusqetin, ew bê rusqet,
Hûn bedewin, ew elêwet.

Hûne bextin, ew bêbextin,
Hûn ne tehlin, ew jehr-mewtin.
Hûn pir kevnin, ew hatine,
Ser axa we pî danîne.

Tew Şerqa Kal we aza kir,
Xwînrêj, xwînmêj we hûrxaş kir.
Ew tunebûn rûyê dinê,
Kurd mêrxasin hemû demê.

Tune, tune, ew xêrxazek,
Ser me raxe per û baskek.
Bêje, doza weye heqe,

Textê zulmê cî bileqe.

Neyarê we xwîn vereşin
Rojên wana timê reş bin.
Hêlîna wan bibe tarmar,
Rûyê wan nekene bahar.

Tahirê Bira, pîr pejmûr nebe.

Mala xwedê li ser sebrê bûye ava,
Ro dernayê, tav germ nake tu dera.
Dem hatiye, roya meyê tavê bide,
Kurdistanê wê serûbin gulilk vede.

XELATA TE PÎROZ BE!

*Dema serokkomarê dewleta Kazaxistanê Nûrsûltan Nazarbayêv
nîşana dewleta Kazaxistanêye “Yekbûna zêrîn” pêşîra kurê
kurdayî comerd Ezîzê Ziyoyê Berdirxan da dardakir, min got qey
dinya hemû dane min...*

Pîroz, pîroz, hezar pîroz, birê hêca,
Nîşana zêr dixemlîne sîngê qenca.
Xema dûr bî, tim gelê xwe bikî are,
Gav, rojên te kulîlk vekin wek bahare.

Nîşan dema ne cîda be, birq venade,
Nîşana te xût cî da ye, wê şewq bide.
Dereng be jî wê êdî dît şûna xune,
Rebbê jorîn ser te dayne siya xune.

Keda helal, hêca dibe bahê bilind,
Zêr tim zêre, unda nake ew navê rind.
Helalzade dilê gel da xwe cî dike,
Heramzade minafiqe, gel qut dike.

Virha şûnva tu nebînî êş, mereze,
Bê çilk, bê telp emir bikî ser evraze.
Ez qelbekî dilovanî, pir dostanî,
Culet dibêm: Lawê Ziyo, qehremanî!

XİZMETKARÊ ÇAND Û HUNERA GELÊ KURD EMERÎKÊ SERDAR RA

*Birayê minî nebîrkiriyî delal. Min îro keda teye salên dirêje
mînanî neynûkêye zelale, bê telp stend. Şabûna min gihîşte erşê-
ezmîn. Bila xwedê te timê wa şa bike.*

Pir raçav kir, him ro, him şev,
Dît mirovên ne nolî hev.
Ji hemûya kir pirseke,
Kesî neda baş caweke.
Nebûm poşman, ne pejmûre,
Tim mêze kir rîya dûre.
Şikir min stend xelata te,
Wêya hilda têr bêhna te.
Belg-belg xwendin nîyarên te,
Lel, cewahir dît xezna te.
Eşqam gihîşt asîmane,
Baz difirin li esmane.
Tew rêza da min tu dîtî,
Dît meremên teye cindî.
Jiyan nabe, qet bê lece,
Tên şêkrandin kirinên qence.
Nav axê da narize zêr,
Unda nabe, ew tîye kêr.
Kê cî çêkir dilê gel da,
Tê bîrkin te w qurna da.
Berya gotiye fikra xune,
Her kes diçe eslê xune.
Esilzade doza dûre,
Dikêlîme gul û nûre.
Esilxirab mewte, jehre,
Şahmerekî ziyankare.
Firsend ketê wê li texe,
Dil, hinavê te wê vexe.
Kesê agahî hişyare,

Pir tevdîrî bikar, bare.
Firsend gule, diçilmise,
Qend, hingive, him dimise.
Ket destê te mehêl here,
Te ku berda, venagere.

*Bi xastinên here qenc,
20-ê Cotmehê 2012.
Bajarê Almata.*

DOTA URÏS

Helbestvana eyan Marina Stukalina, rojbûna te pîroz be.

Xuliyîyî roke şa da,
Pir esnafî ulmê xwe da.
Av vexwarye kayna Pûşkîn,
Zar daye te kal Karamzîn.

Loma usan bûyî nazik,
Gelêmhezî bi dil, bê şik.
Feqî, Xanî dihebînî,
Pêş wan bejnê ditewînî.

Dilê min da girtiye war,
Çanda me ra dibî kubar.
Nêtên mine dure zêrîn
Dikî zarê xweyî şirîn.

Sed heyf emrê minî can da
Em nebûne hogirên hev.
Me kar nekir rewşekê da,
Nebuhurî emrê me tev.

Nika bibe hogira min,
Eşqê têxe nav dilê min.
Em tev herin baxçê gula,
Binicrînin huba dila.

Pîroz, pîroz rojbûna te,
Jan, êş nebin mêvanê te.
Pir sal bijî bê xem, rihet
Xwedê bide te gav, sihet.

HESÎP QEPLAN

Silavê alavî lawê kurdayî mêrxasî, comerd Hesîp Qeplan ra.

Silav, silav, Qeplanê kurd,
Egît, mêrxas, lewendê kurd.
Hezar hurmet dayka te ra,
Şîrê şêra daye te ra.
Loma usan bok-beranî,
Tirsê, xofê qet nizanî.
Boy gelê xwe feda dibî,
Jan-êşên wî tu dûr nabî.
Dengê teyî zexmî, pîr rik,
Dihejîne gurê gewrik.
Gur dimîne timê gure,
Ew dilê xwe naguhere.
Fîrsend ketê wê te bixwe,
Dil-hinavê te wê vexe.
Oxira te vekirî be,
Perê xwedê li ser te be.

**

Dilop kevir kur qul dike,
Yekbûn çiya cî radike.
Neyar fêlbaz, derewbêje,
Ruhê wiya tew qirêje.
Wê, we dîsa bixapîne,
Gêlê ser te bigerîne.
Par, warê xwe jê bistînin,
Lana wî da bifetsînin.
Doza we heq, gotnên we ferz,
Şuxulê xêrê kurd dikin lez.
Lez bin, lez bin, gelî mêran,
Neyara xin derbên giran.
Bila ser çok rûnê pêş we,
Aza bikin welatê me.

QADİRÊ MÎN

*Qadir, neviyê minî kurîna ewile. Ewî êdî xêlekê mezine.
Zareke hinekî ji emrê xwe gelectir qewmandinê dine ji hevdu
dijbêre. Qenc, xirab, rast, çepê xwe baş dizane. Loma ez vê şîreta
xweye qîmet bilind çawa bîranîn didime wî. Kengê dem ku bê,
bila bixwîne, nav emir da xwe ra têke rênîş.*

Bedesila rind mestîne,
Wê te rezîl rusva bike.
Zengûya wê qetil, xwîne,
Dawiyê wê te zuwa bike.

Bedewî pêlê berêne,
Him valîne, him walîne.
Îro heye, sibê tune,
Pê alyayî xilaz tune.

Qedrê teyê bê hildanê,
Kes te nade xeberdanê.
Mirovên qirêj wê bên, herin,
Derdorên te tim bigerin.

Jê ketiyê mewt û jehr bin,
Şerûd, qirêj, dewekar bin.
Wê nanê te bihermînin,
Qulçê hebsa da bimînin.

**

Dinê biger fitil, fitil,
Biçerçire hutul, mutul.
Eslxaseke baş bibîne,
Jîna tev wê pir şirîne.

Bila ne rind him kinik be,
Ruhê xwe va wê rindik be.

Ewê emrê te zêde bike,
Ji bilinda bilind bike.

Dost, hogirên teyê pir bin,
Hatî, çûyê teyê hebin.
Dergê teyê vekirî be,
Rû, rûmeta teyê hebe.

Êlê pêş te temenne be,
Hîvîdarê gotina te be.
Gelekê bên dîndara te,
Wê rûsipî nas bikin te.

BOY ZAROKAN

KEWRÎŞKA MÎN

Kewrîşka min rindike,
Guh fîte, pîl kinike.
Dizî-dizî digere
Kê dîbîne direve.
Him ro dertê, him jî şev,
Çav vekirî dike xew.
Ew ser xurca Nergîzê
Şîrîn-şîrîn radîzê.
Him nîn dimê, him jî av,
Car-carana şîrê xav.
Belo qet wê hez nake,
Ku bigre wê belake.
Ne xureye, çav têre,
Nolî berxa diçêre.
Pişke pişka wê ku tê,
Zû diçime, ez cem wê.
Timê avê lê dikim,
Temerzî za dikim.
Guhê wêya kaş dikim,
Pişta wê mehez dikim.
Hevalê xwe dibîne,
Êdî cem min namîne.
Wan ra dibe dost, heval,
Birçî dibe, hê tê mal.

SALA TEZE

Hat kalekî rûdan qerqaş,
Libasê wî etles, qumaş.
Got: - Navê min zivistane,
Ez mezinê çar birame.
Ku datînim pî û pare,
Xwe ra tînim berfa sare.
Diqersînim ez kaniya,
Qerqaş dikim deşt, baniya.
Min heznakin bax û bostan,
Vala dikim deşt û zozan.
Min nas bikin gelî zara,
Kombin, hemû werin vira.
Got, meşîya dora merxê,
Zarok dû wî ketin çerxê:
-Tu baş hatî kalkê delal,
Bide me da aqil, kemal.
Sulhê bîne tamam dinê,
Em nebînin keder, xemê.
Tew sînora bide hildan,
Piçûk hevdu bibin mêvan.
Bila şabin dayîk, mezin,
Pîrik, kalik mekin gazin.
Te aniye kakil, qendik,
Mewicê zer, badam, findiq.
Timê were, kalkê delal,
Me ra bîne hewa zelal.

BÎRANÎN

SEYDA ŞAMÎL



Çend bîranînên mine nebîrkirî derheqa Şamîl Eskerov da.

Şerê Qerebaxa Çiya ra girêdayî hezar nehsid nodê salê, yanzê meha îlonê (rêzber) min mala xwe cîguhezî Komara Adirbêcanê, bajarê Bekûyê kir. Piştî hinek çetinahiya şûnva mala xwe avayîkî çar ode (jûr) da ciwar kir. Boynet xebateke sade hemû pelikên

xwendinê xwe hildan çûme qebûla serweriya nehiya Nerîman Nerîmanovê.

Serweriyê çawa xebatkarê perwerdê ez şandime cem serkarê para perwerda nehiyê. Warxanê ku ez tê da dijiyam, wê nehiyê da ciwar dibû.

Piştî xêlek hevpeywandinê şûnva wî ez para perwerdê da mufetişê dibistana hildame xebatê. Xêlek wede buhurî. Min hevalê xweyî xwendevaniyê kîjan ku ew êdî çend salên dirêj bûn, bajarê Bekûyê da dijiya Ehmedê Hepo ra têtêlêfon vekir. Wî wedê dengê min bîhîst, gelekî şa bû. Kîngê ji min pirsî ku vê demê ji ku xeberdidim, min got: “Ezî êdî bajarê Bekûyê me”.

Min derheqa hemû qewmandina jê ra qal kir. Hinekî pejmur bû. Paşê kêfxweşiya xwe anî zimên, wekî ez neçûme ciyên dinê, carekêva hatime Bekûyê.

Ew hate mala min. Me hevdû hemêz kir, ser hevdu da kelogirî bûn.

Min got:



Şamîl Eşgerov û Ehmedê Hepo

-Ehmed, birê delal, mitala meke, riya emire kevir, koçik, kaş-kerîşe. Ew meriya dike kevkanîyê xwe kuda dixwaze wir da davêje.

Vê roja şûnda me êdî zû-zû hevdu didît. Derheqa

emrê xweyî xwendevanîyê da, çand, dîrok û halê gelê

xwe da gelekî hewal dida. Carekê min ji wî pirsî:

-Ehmed, xwedê hevînakî, tu qet mamoste Şamîl dibînî? Tevgirêdanên we tevî hevdu hene, yanê na?

Wî min nihêrî, kenîya û got:

-Malik avayo, ew çî pirse tu ji min dikî? Çawa tevgirêdanên me hevdu ra tunenin? Dema piyê wî dikeve Bekûyê ew ewil min dibîne, paşê pey şuxulên xweyî cuda-cuda diçe.

Min ji wî hîvî kir, wekî careke din ku Kek Şamîl tê Bekûyê ese cawê bide min, ez bême zîyarera wî, pê ra bibim nas.

Êvar bû, min nav mitala da tevî neferê xwe têlêvîzyonê mêze dikir. Dengê zengilê têlêfonê ez ji mitala qetandim. Min destekê têlêfonê hilda, dengê Ehmedî eşqî, şa bihîst. Wî got:

-Barî, çavê te ronik be. Kek Şamîl vaye cem min rûniştiye, ez derheq te da wî ra qal dikim. Ew jî dilekî bê sebir dixwaze te bîbîne.

Min û Kek Şamîl hetanê wê demê qet hevdu nedîtî bû. Lê min gelek nivîsarên wiye pirtûka, rojnema û kovara da ku hatibûne weşandinê xwendibûn. Ez bibûme maşuqê nivîsên wî. Ew pêş çavên min timê çawa çiyakî gelekî bilindî destnegihîştî dihate xanê.

Piştî wê cawa Ehmede şirîne weke lel-dur, min hewzanibû temem dinya baxişandine min. Min zû-zû cilê xwe xwekirin û lez berbi mala Ehmed çûm. Piyê min bin min da erd ne girtin. Dilê min dikire tîpe-tîpe, destê min diricifin. Kelexwîkê danî bû ser min.

Welaxir min derê Ehmed kuta, Ehmed dêmekî geş derî rûyê min vekir, destê min girt berbi oda mêvana birim.

Min Kek Şamîl dît, lê çavê xwe va bawer mekir, wekî ew, ew kesê, ezî salava hesreta dîtina wî me?! Hêdîka dilê xwe da wekiland: Ya rebb, ew Kek Şamîl e, yanê na?!

Pêş min bi çiv, çinên xwe va esil kurdekî ji serê çiya nû berjêr bûyî sekinî bû. Min hez kir berbi wî herim. Lê, piyê min xebera min nekirin, ciyê xwe da nolanî merivekî bê ruhî, qerisî sekinîm. Hişmetkar-hişmetkar wî mêze dikir. Ber xwe da hêdî-hêdî got: “Ya rebb, şikir vê dayîna te ra. Axir ku, ez gihîştîme vê xasteka dilê xwe”.

Kek Şamîl min nihêrî, vebîşirî. Ciyê xwe rabû, berbi min hat, selama min vegirt. Berê destê xwe dirêjî min kir, paşê ez hemêz kirim, em hatinê rûyê hevdu. Min xwest destê wî maçkim, nehîşt. Destê min girt, ez cem xwe dame rûniştaninê.

Lê, hela min xwe tindurust mekribû, bê sebir hîviya destpêka axavtina wî bûm. Demekê şûnva, ew bi zarava kurmanciya maqul û ferih min ra axivî. Min bin çava va kûr wî mêze dikir. Ew axavtin û hereketê xwe va esil kurd bû. Destê xwe badikirin, geh hêrs dibû, geh jî nerm dibû. Bejnê va ewqasî ne bilind bû, nîvçe bû. Lê namileke wiye pene usan hebû meriv bê xastina xwe dibû hijmetkarê wî. Porê wîyî hinekî kej bû, çavên wiye zerîn bûn. Dema ku diaxivî, dibû kurdekî nûh serê çiya hatî. Meriv dibû hişmetkarê zarê wîyî şirînî, ulmî. Meriv ji dîndara wî ter nedibû. Lêvên wiye qalim, pozê wî beranî bû. Çawa kurd dibêjin “poz beranî bû”. Dême wîyî zelalî fire bû. Dihate kivşê, wekî rebbê jorîn nişa hevîrtirşkê wî ji ulim hilstra bû. Hemû axavtinên wiye kûr û ulmî bûn.

Xêlek mitalê kûre, dûr şûnva ez berbirî rebbê jorîn bûm. Got: “Ya rebb, te nav çiya û baniyên Kurdistanana Sor da boy gelê kurdî tengazar lokekî neteweyî usan xuliqandiye, xelatên wa tu car nadî hemû gelan.

Em xêleke xurt cem hevdu rûniştin, derheqa gelek mesela da axivîn. Dawiyê ez ew û Ehmed çûne bûlwara devê behra Xezerê. Xêlek geriyên û ser mijarên cuda cuda axivin.

Sibê min û Ehmed ew verêyî nehya Kelbecerê kir. Xwîn xwarê ermenî Kelbecer hê zevt nekiribûn. Ew çûnê şûnva min ev helbesta rewayî wî kir:

SEYDA ŞAMÎL

Mamosteyê mamostayî, Şamîl Esker,
Zimanê te pir şirîne, wek av kewser.
Tu yî kana ulim, kemal, merîfetê,
Nişa xasî, xuluqîyî ji qudretê.
Nav-dengê te bela bûye tamam dinê,
Kêr-kirinên te, welatê me kiriye xinê.
Av vexwariye behra Xanî, derya Hejar,
Duxulxulî nolî Dicle, Firat, Hekar.
Şêx Nîzamî, kan Fîzûlî mamostê te,
Vagîf, Vûrgûn mihikîne nav xwîna te.
Şev û roja şer dikî boy heqîqetê,
Tim qutdikî reh-rîçalên kîn-kudretê.
Lawê Zalî, neyarê har tu natirsî,
Hebûna te namûs, xîret, him bê qelsî.
Ez ji te ra kanî, behr qet nabêjim,
Hemberî te kanî, behr pir tenîskin.
Ez ji te ra çiyayê bilind qet nabêjim,
Himberî te çiya nizmin, pir piçûkin.
Rebbê jorîn dikim hîvî, him jî rica,
Me bê rehmê, welatê me bibe aza.
Sed saliya te derbazkin li Ameda kal,
Bê xof bibe zimanê meyî qurna da lal.
Bimilmile ala meye kesk, sor û zer,
Tarî herin, ronik bibe, her qulç û der.
Em tevayî rûnên sîngê Zagros, Sîpan,
Axa welêt têt-têt maçkin, bibin qurban.

Xêlek wede buhurî bû. Rojekê endamekî dewletê hate ofisa Navenda Çanda Kurda û elam kir, wekî sibê çend endamê navenda me pêwiste herine qebûla serokokomarê dewleta Adirbêcanê Ebulfez Eliyêv. Êdî tu tiştê cuda me ra negot, xatirê xwe xwest, çû.

Roja paşîn Kamil Hesenov (serokê Navenda Çanda Kurd “Ronahî), akadêmik Têmir Ehmedov û Ehmedê Hepo (rêdaktorê rojnama “Dengê Kurd) û ez çûn qebûla Ebulfez Eliyêv.

Wî em çawa nûnerên kurdên Adirbêcanê hurmeteke bilind qebûl kirin. Piştî hine axavtinê cuda-cuda şunva elam kir, gerekê nûnerên kurdê Adirbêcanê bi serkariya Kek Şamîl herne Moskovayê, bibine tevgelê komcivînê (qurultay) kurdê Yêkitiya Komarên Serbixwe (YKS). Hine xizmetên boy berjewendiyê dewletê jî sipartine me.

Em bi wê hurmeta ewil va jî verêkirin. Du roja şunva me Kek Şamîl li balafirgeha dewleta Adirbêcanê da dît. Ewî pir perîşan



Şamîl Esgerov

bû. Ji eşq û şaya berê dêmê wî da tu nîşan nema bûn. Wî bi dilekî xem û keser halê nehya Kelbecerê me ra qal kir. Got:

-Xwînrejên ermenî şev û roj Kelbecerê û gundên wê didine ber top û gula. Min û çend hevalên nehyê da xwedî hurmet ji merivên cî

komeke welatparêza civandinê. Ev şeş mehin min rûyê nefer û malên xwe ne dîtîye. Em cilên eskera da tawiya, qeleça digerin û wir jî hinekî bîna xwe dîstînin. Çekên me tivingên nêçîrvaniye, yek û gu lûlene. Em her roj, dewletê ra halê heyî qise dikin lê, dewlet me nabihize. Tu alîkariyê me ra nade. Em bi qeweta kurdên welatparêz hela ku nehyê û gundên wî ji xwînaxarên ermenî qorî dikin. – Kek Şamîl kesereke kûr kişand û berdewam kir: – Kesek me xudî dernayê,

dewletê em ji bîra xwe avîtine, wir dewa îstolê diçe bê kiyê kîjan rûniştanoka dewletêye bilind da rûnê. Bi gilîkî kurt, wekî wa here, halê meyê pir giran be.

Min derheqa halê kurdên Ermenistanê hatî jê ra hinekî qal kir. Em çend saeta şûnva balafirgeha bajerê Moskovayê ji firinda peya bûn. Berpirsiyarê Mala Kurdaye li Moskovayê em pêşwazî kirin, mêvanxaneke ewqasî jî ne mezin da cî kirin. Sibê saet yanzda salonê mezin da komcivînê (qurultay / kongre) destbi xebata xwe kir.

Xênî endamên kurdên Sovêta Berê usa jî wekîlên PKK qurultayê da roleke mezin dilîstin. Qurultayê da hîmlî halê kurdên YKS hate enene kirinê. Hinek axavtin derheqa Kurdistana Sor da diçû. Di qurultayê da ji her herêmeke merivek axavtinvan bû.

Piştî merivên duda gilî dane Kek Şamîl. Dema ew gihîste piş kursiyê axavtinê mirovên ku zalê da amede bûn, bawer bike, hemûya bi hevra “Şamîl, Şamîl!” gotin û çepikên xwe hevdu xistin. Êdî min baver kir, wekî piraniyên rewşenbîrên kurdên YKS Kek Şamîl baş nas dikin. Hurmeteke wane pir mezin wî ra heye. Wî derheqa halê kurdên Kurdistana Sor û Kelbecerê da axavtineke zêlûle dil êşandî gîhande endamên qurultayê. Hatina wiye wir, çawa bêjî hurmet û siyaneta qurultayê çend dereca bilind kiribû. Xêlek endamên qurultayê ciyê xwe da guhê hevdu da “Şamîl, Şamîl” digotin û dikirine piste-pist. Dema wî ku axavtina xwe xilaz kir endama ew bi çepikên gelekî gur berbi rûniştoka wî verêkirin.

Navbiriyê da gelek hatine cem wî. Hineka destê xwe didane destî wî, hineka jî ew hemêz dikirin, wîra diaxivîn.

Roja duda min derheqa kurdên ji Ermenîstanê bi destê zorê koçberî Adirbêcanê bûbûn agahî gîhande endamê quriltayê. Ez, Kek Şamîl û Têmûr Ehmedov odekê da diman. Qet nikarim wekî bîr bikim, wî nav hurekî pêz da xêlek qelî xwe ra anî bû. Em jî koçer bûn lê, min emrê xwe da qeliya usane bi tem ne dîtibû, ne jî xwaribû. Kengê ku min derheqa wê da ji wî pirsî, ew kenya û got: - “Barî, ew xurekê di nav kurdên Kurdistana Sor da herî bi rûmete. Her maleke kurd demsala payizê ku kuta dibe çend heywana dikine qelî, heta baharê zarok bi wî rojên xwe

dibuhurînin”. Û kesereke kûr kişand, got: “Lê, çiqas ku ez dibînim, ermeniyê xwînêjê van rojên meye şîrîn, wê tel bikin”.

Roja pênc qurultay xilaz bû. Wekilê PKK yê li Moskovê em birine Mala Kurda, civîneke piçûk da axavtinên me sivik enene kirin. Sibetirê bi erebê em birine balafirgehê, du qutî dane me. Gotin: “Ew rojname, kovar û çend pirtûkên Serok in. Haj xwe hebin bila nakeve destê ajanê dewleta tirka”.

Em wede da gihîştine Bekûyê. Dema ku em li Bekûyê dergê lê nihêrandinê balafirgehê derbaz bin, du dergevana xwestin wan qutiye ji destê me bistînin. Wedê ku Kek Şamîl dît, pêra-pêra serê xwe pêş wî xar kirin, selam danê, ketine ber milê wî em gişk ji dergê nihêrandinê ra derbaz kirin.

Kek Şamîl du roja li Bekûyê ma. Rasthatina wî wekilê dewletê bibû. Çi xeberdan nav wan da çûbû, ew me ra eyan nebû. Roja sisya sibê zû min û Ehmed ew verêyî nehya Kelbecerê kir. Wedê çûnê min dosya destnivîsara pirtûka xweye “Kuda herim?” da wî. Jê hîvî kir, wekî bixwîne, derheqa kêmasî û zêdehiya da fikra xwe min ra bêje. Gelek vede buhurî. Ew bi xizmeteke dewletê va girêdayî dîsa hate Bekûyê, me hevdu dît.

Lê ewî gelekî pejmûr bû. Dê mê wîyî qimilî bû. Gelekî westiyayî dihate kîvşê. Xêlek axavtinê şunva wî dêmekî şermok dosya helbestê da min got:

-Barî, biborîne, welleh - kesereke kûr kişand – xwînaxarên ermenî îmkan nedane min, wekî ez helbestên te gişka bixwînim. Hinek xwendin. Rast bêjî, gelekî xweşa min hatin. Zimanê teyî paqijî, firehe. Lê min piçek guhastin li belbesta “Bilbilo” kiriye, ez bawerim wekî tuyê fikrên min ra qaîl bibî. Misilet dibînim, derengî mexêre, bide weşandinê.

Ez û ew çûne ber behra Xezerê. Min zorê gilî jê dikişandin. Ew nav mitala da diperpitî. Tenê keser dikişandin, car-carana netika xwe miz dida, of, of dikir! Me ew heta ciyê ku dima anî, xatirê xwe ji hevdu xwest. Rojeka şunva min û Ehmed ew verêkire Kelbecerê.

Çend roja piştî çûna wî profesor Têmir Ehmedov têtêlvîzyona dewletêye resmî da bi kelîm pêşda hat, got:

-Ez birêvebirên dewletê gelekî hîvî dikim, wekî virha şûnva halê Qerebaxa Ciyayê û Ermenistanê ra girêdayî çiqas rasthatinên resmî ku hebin bila dewlet wan rashatina bê wekîlên kurdên Ermenîstanê ku bi destê zorê revîne Adirbêcanê û bê kurdên herêmê derbas neke. Bila ew bibine tevgelên wan rashatina. Min mêrxasiya wan camêra bi çavên xwe dît. Wan çawa sîngê xwe dane pêş û bi ruh û can çawa nefê dewleta Adirbêcanê xweyî dikirin. Mineta xwe qet tu kesi nedikişandin. Kîngê em bi hevra li Moskovayê komcivînê kurda bûn, prof. Ehmedov, çî dîtibûn ew jî bi mêranî rûyê şandeyên (delêqasyon) Ermenîstanê hatî (Tevî kurdên êzîdiye Ermenîstanê hatî rojnemavanên ermenî jî hebûn) vekirî qal dikirin. Ciyê qewmandinên ku bibûn wî kêlma Kek Şamîl û ya min nimûne dikişand.

Telebextî ra rica wî zanyarê merîfet, hêla dewletê da nehate qebûlkinê. Serkariya dewletê gelek cara qet nedixwest navê kurda, îlahî jî kurdên Ermenîstanê hatî bikişîne. Wekîlên dewletêye nîjadperest siyeseta dewleta Roma Reşe qirêje bê xwede dubare dikirin. Loma jî paşwextiyê ew kurdên ku ji Ermenîstanê bin top û gula da hatibûne Adirbêcanê piraniya wana nav wedekî kin da xwe cîguhezî gelek qulçê Rûsyayê, Asya Navîn û Kazaxistanê kirin.

Ji wan kurdên yek jî ezim. Ev çend salin hatime Kazaxistanê, bajarê Alma-Atayê da dijîm. Endamê Yekîtiyê Kurdên Kazaxistanê me, hevtê carekê zarokên kurda ra dersê zimanê Kurdî didim. Li vir rojnama “Jiyana kurd”, kovara “Nûbar” û pirtûkên bi kurdî têne weşandinê. Min li vir ji gelê qazax her tim hurmet û siyanet dîtine...

...Kek Şamîl li Kelbecerê dima, ez û Ehmed li bajarê Bekûyê da. Di nav azerî û ermeniyê da şerekî xwînrejî pir giran diçû. Her roja çiqas-çiqas zilamên leşker û neferma (sîvîl) û cimaeta ameta bê gune şehîd diket, qîrîna dayika, xwîşka digihîşte erşê ezmîn.

Wedê me li goristanê şehîda derbas dibûn. Arteşa ermeniya rojê çend gund û bajarên Adirbêcanê zevt dikirin. Xwîn nolanî cem û kanî dikişiya. Kesî haj kesî tunebû, her kesek ketibû haya serê

xwe, çawa bike, wekî neferê xwe ji quta ermeniyên xwînaxar xilaz bike. Yê ku dihatine Bekûyê kesek li wana xwedî dervediket.

Rojeke kew-kewa sibê da dengê zengilê têlêfonê ez ji xewê sibê rakirim. Min bihîstokê têlêfonê quloz kir, dengê Ehmedî ne nolanî herro bîhîst. Dengê wî ricaf kire bedena min. Ew nikarbû biaxive, dikire îske-îsk. Sih kir ku, ew nikare bêhna xwe bikişîne. Halekî pir giran da wî cawa xweye tel tamam kir, got:

-Barî, tu dizanî çî bûye? Duh (17 gulanê 1993 salê) ermeniyê xwînaxar nehya Kelbecerê û çend gundên wê zevt kirine. Hinek merivên ber xeza wan xilaz bûne hatine bajarê Bekûyê. Şamîl û neferê wiye jî nav wan da ne. Were cem peykerê Semed Vurgun, ez û doktor Baxişe hîviya tene.

Ez, doktor Baxiş û Ehmed halekî pir perîşan da çûne cem Kek Şamîl. Ew tevî hevaleyê ji Kelbecerê odeke nîv tariye, tenge piçûk da li ser dîwaneke kevne, astar pizirî da rûniştibûn. Cilên eskeriyêye xilmete, qermîcî xwe kiribûn. Kek Şamîl di nav behra mitala da minê bibû. Dihate kivşê, wekî gelekî westiyaye. Çavên wiye nolanî çavên teyrên baze zelale pir senc şêlû bibûn. Me ew himêz kir, em ser hev da kelogirî bûn. Ewî zû zû çavên xwe pê dezmalê cêva paqij dikir. Min ji çavên xwe bawer nekir, wekî ew kesê pêş me sekiniye Şamîlê Ekser e. Ew çiqasî jar bibû, nedihate naskirinê. Min êdî xwe xweyî nekir, hesrên min nolanî taviya barana biharêye pirav xuberê berjêr bûn. Wî li min mezekir, destê xwe dane ser her milên min, dîsa çavên xwe paqij kirin. Min wê demê helbesta xweye “Kek Şamîl çiya mêl nabin” nav mêjûya xwe da da wekilandinê:

Ez nizanim, eva dinya ça xuliqî, çawa çê bû,
Kevrê ewilkê danî hîm, ewa kû bû, ku hatibû.
Heq fetisî, neheq bû hur, penc avîte rûyê dinê,
Boy kirnêd xwe, kes-kesî ra bersîv nade heta kengê?

Xwînaxar dijî, zor, zexm dibe, qet tu kesî fedî nake,
Dinya kirye gola xwînê, tim kêf dike, kes deyn nake.
Qîrîn, qûjîn, zulûm û zor, gihîştîye heta ezman,
Gelê dinê wê rezîlyê qet nabînin, naynin ziman.

Helebca me kafkûn kirin, nav jehrê da tew helandin,
Qet tu kesî ne got min dît, ker bûn, lal bûn, deng ne kirin.
Lawê ermên hêlîna germ, destê zorê tewa stendin,
Tew lîdêrê gefe, virek, ew dîdema mêze kirin.

Seyda, megrî, kûr mitala êdî yekcar bibe dûre,
Lawê kurdî tim mêrxase, ew tu cara ne bûye hûre.
Piyê zulmê tim surûke, ew gelekî nakişîne,
Rebbê jorîn wê boy benda him hildide, him dişîne.

Êdî rabe, em tev herin, Kelbecera teye şenge,
Tevî lawê azer, kurda neyara ra bikin cenge.
Rizgar bikin axa xweye, ji axa dê cuda bûyî,
Neyar qutkin, mal-dewleta êdî mayî bibin xweyî.

Em demekê şûnda bi hevra ji odê derketin, wekî herîn neferên
Kek Şamîl bibînin. Li rê da min jê pirsî:

-Kek Şamîl, lê we mal-dewleta xwe çawa kirê? Barê we tiştek ji
destê wan xwînxara xilaz kir, yanê na? Wî kasil-kasil li min
nihêrî, kesereke kûr kişand. Pejmûr-pejmur got:

-Welleh, min xêncî neferê xwe, yek jî destnîvîsarên pêştir tu tişt
ji destê wan xwînxara xilaz mekir. Çi hebû hemû wan ra ma.
Pirtûkxana min da nêzîkî 30 hezar pirtûkên mine çend zimana
nivîsî hebûn. Mûzê da (ew salê dirêj li nehya Kelbecerê serkarê
filîala mûzêya dewletê bû) bê hesev tiştên gelîrî bê qîmet hebûn.
Ew jî man.

Mala ku li Bekûyê ew dima, odeke du çeve piçûk bû. Malxweyê
mala wî Nazîle xanima eslê xwe va Lezgî, lê ruhê xwe va kurde
mêrxas, em dêmekî mêraniyî geş qebûl kirin. Me ra ‘hûn ser çava
hatine’ got. Min destê wê ramûsa (cara ewil bû, mine ew didît).

Wê rojê şûnva ez zû-zû diçûme mala wan, em kolanekê da
diman. Car-carana Kek Şamîl jî dihate mala min. Em siheta,
derheqa bext û pirsgirêkan gelê xwe da diaxivîn. Car-carana ez
gelekî germ dibûm. Wî, nolani rûspîkî pir hemd, ez aşt dikirim, rê-
dirb her alî nîşana min didan. Em gelek cara li ser ferhengê

“Kurdî-Adirbêcanî / Adirbêcanî-Kurdî” da dixebitîn, yê ku Kek Şamîl 20-30 sala emrê xwe dabû boy nivîsandina vê afrandinê. Pir cara helbestvan Êsivê Feqî Evdile jî tevî axavtina me dibû.



Şamil Esgerov tevî Sulêman
Rehimov. Kelbecer.

Min tevî Kek Şamîl,
nêzîkî deh sala li
Adirbêcanê, Mala
Kurda da kar kiriye.
Me pir cara êvariyê
poêziyayê, konsertê
kurdî û rasthatin tevî
revokê kurd ra derbaz
dikirin. Dema ku
Heyder Eliyêv bû
serokkomarê dewleta
Adirbêcanê wî em du
cara wek nûnerên
Kurdê Adirbêcanê
qebûl kirin. Wî gelek
sipartinê nûh dane me.
Tu car nikarim bîr

bikim.

...Cejna Nêwroz
nêzîk dibû. Em
ketibûne nav mitalên

kûr, wekî cejnê kîderê û çawa derbaz bikin. Dema me civîna Navenda Çanda Kurd da ev mesele enene kir her endamekî Navendê fikre xwe anî ziman. Kek Şamîl nişkêva ji ciyê xwe rabû got:

-Emê cejna xwe li salonê ser navê eslê xwe va kurdekî nav û deng Aşix Şemşîr da derbazkin. Kî çi dixwaze, bila bike, bila riya xwe qet nemîne. Mêr carekê tê dinê, carekê jî dinê diçe. Hema kîdere zirave, bila wir da jî bişkê. Kirinê mêranî tu car namirin,

dewir, qurna da têne weklandinê. Kal û bava gotiye: “Xwedê stuyê peza nêr kêrê ra daye”.

Em hemû pêşniyara wî ra qaîl bûn. Me jê hîvî kir, wekî ew boynet cî serkariya klûbê ra axavtinê bike.

Du roja şûnva wî elamkir, wekî her tişt hatiye kirinê. Şabûna me erd-esman da nedihate ciwarkirinê.

Serkariya Navenda Çanda Kurd “Ronahî”, nivîsandina axavtinê boynet cejna siparte min û Hejarê Şamîl (lawê Şamîlî sisiya).

Me di nav wedekî kin da axavtin nivîsî û teslîmi Navendê kir. Navend ew civîna xwe da enene kir, zêdeya û kêmasiya nihêrî. Civînê da qîrar hate qebûlkinê wekî Kek Şamîl deheqa dîroka cejna Newroz da bi kurtahî çend giliya bêje, şahiyê vekirî elam ke, lê, axavtin ez bixwînim. Çawa hatibû pejirandinê me usan jî kir. Her tişt bê astengî dimeşiya. Hêla dewletê da tu astengî, narezîbûn pêşda nehat. Şayê heta 4-5 saeta kişand. Gelek kurdên her çar nehyên Kurdistanê Sor (Laçm, Qubadlı, Zengîlan û Kelbecer) hatibûne cejnê. Wan zimanê dê da distiran, gelekî hewes direqîsîn. Erf û edetên xwe bîrnekiribûn. Şabûna wane bêhed û bêhesab bû. Wekîlên çend milletên dinê jî hatibûne cejnê.

Me ala Kurdistanêye kesk, sor û zer anî salonê. Wêneyê Serok Öcalan bilind kir. Xeynî Kurdan, pîr Azeri, Talış û Tat jî hatibûn şahiyê. Hêla dewletê da (wekîlê dewletê şahiyê da amede bûn) tu tişt negotin. Cejn bi hostetî û hewesekî pîr mezin gihîştîye dawiyê.

Sê roja şûnva sê merî hatine çiyê xebata min. Navê min kişandin, min ra bûne nas, evraxê xwe nîşanî min dan. Hîvî kirin, wekî ez tevî wana herime Wezerata Karên Hundurîn. Bi destûra serwerê para perwerdê ez tevî wan çûme wezaretê. Wan ez odeke ewqasî ne mezin da dame rûniştandinê.

Derheqa Hejarê Şamîl da ji min pirsîn. Min got: Ez nizanîm ewî li kuye û kîderê kar dike. Bû êvar. Wan derî ser min da girtin, çûn. Vê şevê Kek Şamîl anîne cem min. Wî ez dîtîm, gelekî hêrs bû, serê xwe bakir. Odê da xêlekê xurt va alî, wa alî çû, hat. Dengekî nerazî û hêrs got:

-Barî, êdî her tişt min va eyane. Tu fikra meke, ‘xwedê heye, xem tu nîne’. Wekî heta sibê me bernedin, ezê cawê bidime hemû

kurdên Bekûyê da dijîn. Bila tew bêne ber avahiyê serokkomarê, nerazîbûna xwe elam bikin. Min wî nihêrî, vebîşîrîm. Got:

-Kek Şamîl, ne tu xwe dibêjî, xwedê stuyê peza nêr kêrê ra daye? Êdî çi tirs, çi mitale kirin?!

Nêzîngiya sibê Kek Şamîl ji cem min birin. Ez du roja wê odeyê da tenê xweyî kirim. Roja sisiya sibê zû ez birime huzura wezîrê şuxulê hundurin Vagîf Novrûzov. Min û wî gelekî hevdu hulkuta. Derheqa dîroka Kurda da pir pirs dane min. Min va eyan bû, wekî ew panturkîstekî gelekî kîndar û xedare. Dawiyê da min ra got:

-Heval Balayêv, me dû we sêva sor ne şandiye, wekî hûn bêne komara me. Hûn bi xwe hatine. De wekî usane, kerem kin, em çawa dixwazin, gerekê hûn usan bimeşin. Yanê na? Ez dikarim sibê te ji komara Azerbaycanê derxim, nehêlim êdî piyê te û piyê yê nolanî te careke dinê nêkevîne ser axa me. Kuda dixwazim we wêda bişînim.

Min rind fehmkir, wekî ew siyaseta dewleta Tirkîyaye qirêj va miqabilî Kurda hatiye jerdadayî kirinê. Min wî nihêrî, vebîşîrîm. Nerme-nerm zarekî mêranî berbirî wî bûm. Got:

-Heval wezîr, min wekî bizanîbûya ezê ji welatê xirîstîyanî bême welatê misulmana, rastî we bêm û hûnê min wa qebûl bikin nedihatime vira. Lê, hûn gerekê qet bîr mekin, wekî çi millet bibe, bila bibe, ciyê gora her musulmanekî welatê misulmaniyê da heye. Ez boynet şuna gora xwe hatime vira. Hûn wekî min ji komarê derxin, çima dinyayê xirab bibe? Bîr mekin, wekî dinê roj û şevekê ne hatiye avakirinê. Dûvê dinêyî dirêje.

Wî min nihêrî, hêrse-hêrs gote du polîsên ku wir amede bûyî ra:

-Evî merivî bibine mala wî, bihêlin, werên. Derxist karta xweye nişandakê da min. Min ew hilneda. Dîsa hêrs bû. Polîsa ez birime mala min.

Sibê Kek Şamîl, Baxîş Huseynov, Kamil Hesenov û Ehmedê Hepo hatine ciyê xebata min. Min çi dîtîbû, çi bîhîstîbû hemû hûrgilî wan ra qal kir. Kek Şamîl, kesereke kûr kişand, hêdî-hêdî ber xwe da got:

-Barî can, qet tu fikra meke, Xwede pir mezine, rehma wî geleke. Kal-bava gotiye: “Xwedê aykê beranê kol, beranê kel ra nahêle”.

Rebbê jorê wê rokê dergê me jî veke, me têxe bîra xwe, emê jî şa bibin. Ev zehmetê meyê behra xwe bide, îşaalla. Emê destê hevdu bigirin, dîlana şahiya azabûna welatê xwe da bireqîsin. Lê ez çi bikim, bê suc, gune çar sal cezayê zîndanê dane min... Gereke daîma rûniştama. Destê wan da tenê “gunehkî” bê hîm hebû. Ew jî destê xwe da kiribûne bîngeh. Tenê digotin, tu nav cimaetê da bangeşeya (teblixat / propaganda) kurdîyê dimeşînî. Lê weda mehkemeyê derheqa wî tawanê (gunê) min da qet xeberdan neçû. Careke darazdar, dizanî ji min çi pirsî? Lap pêkenok e. Nizanim hûnê bigirîn, yan bikenin... Darazdar tele tûj va ez mêze kirim, pirtûka “Mem û Zîn”-a Ehmedê Xaniye ku min welgerandiye zimanê Adirbêcanî danî ser masê, hêrse-hêrs nîşanî min da û got:

-Tu dibêjî tu tawanê min tunene. Lê ev çiyê? Gune vî guneyî mestir heye?! Te pirtûka meriyê miqabilî seyeseta dewleta Sovêtê şer dike, welgerandiye zimanê Adirbêcanî. Nav cimaetê da bela dikî. Vê mestir çi gune dikare bibe?!

Min wî nihêrî, mejûyê min tevîhevdu bû, ez nizanim çawa bû, nişkêva kursiya bin xwe hilda, qafê wî da lêda...

Paşê ez nizanim çi bû, çiqas wext buhuri... Dema hişyar bûm, min xwe di nav nivînê nexweşxana girtigehê da veleziyayî dît. Dest û piyê mine xavika sipî va pêcayîne, çavên min pak nabînin... Çend doxtor dora min civiya bûn, guhê hevdu da dikirine piste-pist. Ça ku bêjî destê xwe dihejînin, nerazîbûna xwe elam dikirin. Doxtorêkî çavê min nihêrî, çavê xwe va eşaretî da min, wekî ez te nas dikim. Ji odê nexweşxanê derketinê dîsa min nihêrî, çav kir. Çend roja şûnva ez nexweşxanê derxistim, dîsa anîme oda girtigehê. Wî doxtorî derheqa halê min da Ehmedê Hepo ra qal kiribû.

Evarekê polisê nobedar caw da min: “Çend hevalên te hatine, dixwazin te bibînin”.

Ez birime ciyê dinê. Min dît, çend helbestvan û nivîskarên Azeriye ku min ra hevaltî dikirin tevî Ehmed min raçev dikin.

Wan ku ez dîtîm elbêra dêmê wan hate guhastinê. Hineka dizî min çavên xwe paqij kirin. Gişka miteyr û pejmûr ez mêze kirim. Dema min ew dîtîn, bîna min hate ber min. Dilê min seqirî, çi bibû gişk bîr kir. Dilê xwe da got: “Merivên wa jî hene, merên usan jî hene. Meriv nikare boynet merivekî xirav miletekî ra xirab bêje....”

Kek Şamîl axavtina xwe xilas kir. Min dil-dînê xwe tev hevdu anî. Dêmekî şermoke pirseke wa da wî:

-Kek Şamîl, çima we va ne eyan bû, boynet çi û kê hûn kirine wê girtîgehê?

Wî dereng-dereng serê xwe bilind kir, dêmekî perîşan çavê min nihêrî. Poşman-poşman dest bi axavtina xwe kir:

-Barî can, welleh pîrsa teye lap ciyê xwe da ye. Boy wê yekê gunekar ez bi xwe me. De wekî usane, apê teyê îro dilê xwe te ra veke. Kal û bava gotiye: ‘Gelek qencî hene, xeraviyê tînin’. Ew qewmandinên ku wede da têne verkirinê qîmetê wanî pir bahaye. Ew bingeha heqîqetêne.

Wî destpêka wê qewmandina tele, şewate nebîrkirî min ra wa qal kir:



Şamil Esgerov û prof.Qanadê Kurdo.
Lênîngrad.

-Birayê Heyder Eliyêvî mezin akadêmik Hesên Eliyêv (Heyder Eliyêv 1969-1982-ê salan da serwerê yekemîn komîteya navendî ya partiya komunista Adirbêcanê xebitiye)

her sal fesla havînê ku derdikete rihetiyê, min ra têl vedikir wekî ez dû wî erebê bişînim,

ew bê Kelbecerê. Çend roja mala min da manê şûnva wî bibime germavê Îstîsûyêye boy rehetiyê.

Wî dîsa min ra têl vekir.

Ez boynet şuxulê para perwerdê çûbûm Bakûyê. Min û Hesên Eliyêv hevûdu dît, vegerandinê ew jî tevî xwe anî Kelbecerê.

Em pêva gelekî axivîn. Rê da min şa-şa gotê:

-Kek Hesên, hîvî dikim tu min biborîne eger ez şaş nabim, ne hûn jî eslê xwe va Kurdin?

Wî min nihêrî, destê xwe da ser milê min, bi zarava kurmanciyî zelalî, paqij axivî, cawa min da:

-Şamîl, eslê me Kurd e. Em Kurdê nehîya Sîsiyana Ermenistanê ne. Navê gundê me Comerdlî bû. Em paşê hatine Nexçivanê.

Welleh, min navê qebîla xwe bîr kiriye.

Min fehm kir, wekî ew nexwaze navê qebîla xwe bêje. Hesên Eliyev berdewam kir:

-Lê agahiya min heye, wekî mirovên qebîla me piştî ji Sîsiyanê hatinê şûnva, niha gelek ji vana van nehîya da dijin.

Dawiyê min ra got:

-Şamîl, niha Heyder padşê Adirbêcanêye, ez jî tu xwe rind dizanî kî me! Salê dirêj li komarê da xebatên berpirsiyar meşandime. Piştî ewqasî şûnva em êdî nikarin derheqa kurdîtiya xwe da biaxivin û bêjin ku, ‘gelê Adirbêcanê çavên we ronik be, em Kurd in’.

Piştî wî gilî êdî ne Hesên Eliyêv axivî, ne jî ez. Bêdengiyê em kirine bin hukmê xwe. Xêlekê şûnva em ketine gundekî zozanêyî ewqasî jî ne mezin. Min jê hîvî kir, wekî em hinekî bisekinin. Ez zû dikevime dikanê, binihêrim çî heye. Belkî boynet malê hinek kelmel bikirim.

Me erebe da sekinandinê, ez peya bûm, wî jî xwest peyabe. Dema ku dît ber dikanê xêlek mirov civiyane, wana pir bi diqqet mêze kir û nişkêva sekinî. Peya nebû. Got:

-Şamîl, kurê min, bêje şofêrê xwe bila erebê hinekî dûrê dikanê bike.

Min usan jî kir, tenê çûme dikanê. Min silav da mirovên sekinî. Wan selama min vegirtin. Hinek kala jî destê xwe dane min. (Di nav cimaeta ciya da ew edet heye, mirovên emir da mezin destê xwe didine mêvanê hatî). Ez zû jî vegeriyam. Me riya xwe domand. Xêlekê çûnê şûnva Hesên Eliyêv gote:

-Şamîl, kurê min, te ew kesên ber dikanê sekinî nas dikirin, yanê na?

Min got:

-Kek Hesên, welleh min qet yek jî ji wan nasnedikir.

Hesên Eliyev kenîya, dêmekî şa got:

-Kurê min, min hê dûrava jî wan kala yek, dudu naskirin. Ew havalê mine cahiltiyê bûn. Wana ku ez bidîtama, wê elbêra ez bicivandama, naskirama. Bibexşîne, ez loma erebê peya nebûm. Me zûda hevdu unda kiriye. Nika êdî derenge, 'bûyî bûye, çûyî çûye'.

Ber êvarê em gihiştîne Kelbecerê, hatine malê min. Nolî her car çî hurmet, ezet pêwîst bû, min ew jî jê ra kir. Êvarekê me mijarê Kurdbûna wî dîsa wekiland. Min rojnama "Sovêt Kurdistanî" ('Kurdîstana Sovêta'), kîjan ku di salên 1930-a da li navenda Kurdistanê Sor, Laçînê da dihate weşandinê nîşanî wî da. Wêneyê wî û miqala 1935-salê derheqa wî da ku hatibû weşandinê jê ra xwend.

Sernivîsara miqalê wusa bû: "Zanyarê kurdî ewil". Dema ku ew têza zanyariyê ulm xweyî dike, rojnamevanek vê miqalê derheq wî da dinivîse.

Hesên Eliyêv ew gotar xwend, kenîya. Xêleke xurt kete nav fikra, serê xwe hejand, çû-hat, min nihêrî. Rûnişt. Dubar ji ciyê xwe rabû, destê xwe da ser herdu sermilkên min. Tûje-tûj herdu çavên min nihêr, sermilkên min giviştin. Got:

-Şamîl, kurê min, – ber lêva va dîsa kenîya, nerme-nerm axivî – herhal serê te hinekî ser bedena te giraniyê dike? Erê! Kurêmin, ez te ra mislehet dibînim, wekî hela ne derenge, dest wan sewdayê Kurdîtiyê vekişîne. Şikir, qulixa te heye, nav-dengê te pire, di nav êlê da belav bûye. Serê xwe berjêrke, çawa dixwazî usan bijî. Çi dixwazî? Ew te ra her tiştî efzeltire. Geleka millet, millet gotine, şev-ro singê xwe da lédane. Paşwextiya wana...

Mine w çend roja şûnva bire Îstîsûyê. Kengê wedê wiyî rihetiye kuta bû, dîsa pê erebê vêrekire Bekûyê.

Çend meh buhurîn. Şûxulê para perwerda nehyê ra girêdayî wezereta perwerdê 1978-salê meha Şubatê banî min Bekûyê kir. Mévanxanê da cî hilda.

Roja duda, 02 Şubatê ber êvarê hatim odê mêvanxane. Pir westiya bûm. Palto û pencekê xwe ji xwe kirin, karîdorê da darda kirin. Teze ser dîwanê rûniştibûm, derê oda kutan, min derî vekir. Xortekî dêmê wiyê ewqasî jî ne nas ber dêrî sekinî bû. Selam da, min selama wî vegirt. Destûra ketina hundur ji min xwest. Min got, 'keremkin', ew kete hundur. Em ser dîwanê rûniştin, qasekî şunva min sebebê hatina wê jê pirsî. Wî dêmekî şermoke li min nihêrî û got:

-Mamoste Şamîl, çima hûn min nas nakin? Ez dersdarê gundê Saridaşê me. Ne ez li nehiyê hatibûme cem we... Min ji we rica kiribû wekî hûn dibistanê min biguherînin.

Min êdî rind naskir ew kiye. Gote:

-Kurê min, niha min tu nas kirî. Ev mesele emê li Kelbecerê hell bikin. Lê te çima ewqasî ev eziyeta kişandiye, hatî vir.

Wî razîbûna xwe da. Got:

-Biborînin, wekî min hûn nerihet kirin, ez ji xwe li Bekûyê bûm, bihîst kû hûn jî hatine Bekûyê...

Min pir mereq kir wekî ew ji ku hîn bûye ku ez li Bekûyê me û ciyê mêvanxane, odayê min çawa dîtiye...

Wê demê dengê zengilê têlefona odê hat. Min destek hilda, nobedara mêvanxanê got:

-Haval Esgerov, du meriv pirsra we dikin, dixwazin we bibînin. Eger we ra ne zehmet be, berjêra qatê yekê bin.

Min baxşandina xwe ji xort xwest û got:

-Kurê min tu rûnê, ez herim binêrim bê ew kîne. Ezê zû vegerim. Derheqa xebata xwe da tu şaişa êdî mekişîne, ezê niha vegerim, emê xeberdin.

Ez bê kotsum berjêrî qatê yekê bûm, min li wira kesek ne dît. Ji nobedara ew pirs kirin. Wê got:

-Ewe hêcka vir bûn, yeqîn derketine devra.

Pey wan derneketim, zû vegeriyame odê. Dît xortî hela ser dîwanê rihet rûniştiye, min racav dike. Min jê ra got ku, kîngê zivirim Kelbecerê, were cem min, ezê pirsgirêka te hell bikim. Wî xatirê xwe min xwest, dêmekî eşqî-şa odê derket.

Destedûyî wî dîsa derê odê kutan. Min hewzanibû xort paşda vegeriya. Derî verkir, sê mirovên cilê ewqasiye ne bahaye, bê

selam, bê destûr xwe xîşî hundur kirin. Evraxê xweye resmî nîşanî min dan. Dît, wekî ew ebatkarên wezaretê karên hundurîn in. Odê da qure-qure va ali-wa alî çûn hatin, destê xwe kirine cêva şalê min. Bin belgî, doşekê û nivînê nihêrin, derê alûle (korîdor) vekirin. Cêva pencek û paltoyê min hev xistin. Yekî ji cêva paltoyê min 300 (sêsid) rûblî derxiste, nîşanî min da. Got:

-Esgero, tê kivşê, ruşweta ku tu li Kelbecerê distînî têrî te nake, erê?! Tu vir jî mineta xwe kesî nakişînî. Çep û rast lêdidî. Ruşweta xwe distînî.

Çavên min derketine ser serê min. Min êdî fehm kir, wekî ew xortê ku berî wana hatibû odê min, pere ewî danine cêva paltoyê min. Lêystok ser min çêkirine. Xwest bersîva wî bidim, herdu hevalên wiye sekinî, elbêra milê min badan, her zendên min qeyd avîtine, zû-zû berjêrî qatê yekê kirim, derî ra derxistime derva. Erebeke reşe ber derê mêvanxanê sekinibû, ez lezo-bezo kirime wê. Birime wezaretê karên hundurîn.

Çend roja xanîkî şeverêşî bê pencere da xweyî kirim. Her şev ez dibirime cem mirovên cure-cure. Wan gelek pirsêd min emrê xwe da hajê tunebûm, ji min dipirsîn. Dawiyê da ez gunekar derdixistim.

Şeveke erebeke sergiriye her çar alî hesinên reşe sar siyar kirim. Min nizanibû min kuda dibin. Nav mitala da minê bibûm. Nişkêva erebe sekinî, du sê dengên curê-cureye hukum dayî hatine bihîstinê. Şirqe-şirqa zincîra min tesele bû. Erebe hinekî ciyê xwe da leqiya, sekinî. Du eskerê bi çek derê erebê vekirin, ez peya kirim. Milê min girtin, birime cem nobedarê girtigehê. Guhê hevda kirine piste-pist. Xatirê xwe ji novedar xwestin. Min nenihêrin, kenîyan û çûn.

Ez cem nobedar mam. Du deqîqe neburîbûn du polîs destê wan da betanîyek û hinek kincên xilmet hatine bal me. Nobedar ez nîşanî wan dam, wan ez birime odeke girtigehê. Odê girtigehê da şeş girtî hebûn. Min selam da, nîviya selama min vegirtin. Yê dinê razayî bûn. Ser çarpaya hesinî velezîyam. Ketime nav mitalê kur. Temam emrê xweyî buhurî nolanî lênta sînêmayê anî pêş çavên xwe.

Nişkêva axavtina mine tevî Hesên Eliyêv kete bîra min. Ew min ra wusa gotibû: **“Şamîl, kurê min, herhal serê te hinekî ser bedena te giraniyê dike? Erê! Kurê, ez te ra mislehet dibînim, wekî hela ne derenge, dest wan sewdayê Kurdîtiyê vekîşîne. Şikir, qulixa te heye, nav-dengê te pire, di nav êlê da belav bûye. Serê xwe berjêrke, çawa dixwazî usan bijî. Çi dixwazî? Ew te ra her tiştî efzeltire. Geleka millet, millet gotine, şev-ro singê xwe da lédane. Paşwextiya wana...”**

Êdî dereng bû... Koç çûbû, war digiriya. Lêyî hatibû, êl digiriya. Dilê xwe da got: “Ay, hay, Şamîl! Tu kî bûyî, bûyî kî?! Min mala xwe, bi destî xwe şewitandiyê. Xweyîti zimanê xwe nekiriye. Sêra xwe her kesî ra gotiye, loma ketime vî halî. Dilê xwe her kesî ra vekiriye. Dost, dijmin hev dernexistiye”.

Êdî min va her tişt eyan bû, wekî ez boynet çî û yalê kê da cem siyasetvanekî dewletêyî gelekî qirejî tirs hatime nîşandanê.

Çend meha şûnva derketim pêş dadgehê. Ew xortê hînkiriyî şerbaz bê tirs û bê xof rûyê min sekinî got: “Şamîl Esgerov ji min 300 rûble ruşwet xwestibû. Ew bê tirs bû, çimkî piştî wî da birêvebirên dewletê sekinî bûn... Paşê ez pê hesiyam, wekî wî xorta ra mirovên dewletê xelatê mezin dane û çend meha pey girtina min wî ji xwe ra maleke mezin, erebeya biha kiriye...”

Tu zanî, Barî can, vê demê li dewletê Sovyêtan da “girtiyên sîyasi” tunebûn. Kê “guneyên sîyasi” dikir, lêyistok dianîn ser wî û bi tirîşên cuda cuda dixistin zîndanê. Elqerez, “gunê” min Kurdparêzî bû, lê ez çawa ruşwetxur hatime girtinê. Mehkeme çar sal gune dane min. Bûme girtiyê girtîgeha dewletê.

Barî can, ez naxwazim ew ezab, eziyet û dil sotina ku min wir da kişandiyê careke din binîme bîra xwe. Bawerim êdî tu bû agahdar wekî kê ez ser hîmê çî dame girtinê?..”

Min poşman-poşman rûyê Şamîl Esgerov nihêrî, xwe gunekar dît, ji xwe ra got, axir min çima ev pîrsa da wî? Ser birînî wiye nebîrkirî dîsan vekirin...

Wî dubar kesereke kûr kişand. Bi awirên biratî va rûyê min nihêrî. Hêdî, hûre-hûr axivî:

-Barî can, hîvîke min ji gelê min heye, wekî ew van çend rêzên ku qurne-qurne kûraya dilê bavpîr û dapîrên me hatiye derketiye

vê roja me, çawa min ew emir da nav dil û mejûyê xwe da daîma xayîkiriye û xwe ra girtiye rênîşa emrê xwe, bila usan jî ew wan çend rêza nav dil û mejûyên xwe da xweyî bike. Bila her kurdek baş bizanibe, ew kiye! Boynet çi hatiye vê dinê, boynet çi gerekê bijî, xwestina wî çiyê! Bira, hemû telp têne paqijkirinê, bîrkininê. Lê telpa namûs û xîretê tu car nayê paqijkirinê, nayê bîrkininê. Ew serberjêrî qurne-qurne dijî. Axa dayîkê him namûse, him jî xîrete. Gerekê gelê minî mêrxas mehêle, wekî tu telp li wê kevin. Ew gerekê boy azadiya axa dê ruh û canê xwe nehêvşîne.

Wî pejmûr-pejmûr, ev rêzana gotin:

Ew kesê ku bê welate,
Ew bê qedrî, bê ginyate.
Bê xwedanî, pê sirûke,
Bê per-baske, rebeneke.
Dûmeka da tim dimîne,
Qîmetê wî wek zil nîne.

Paşê Kek Şamîl bi dengekî zelûlî, lê bi melavî helbesta xweye ku vedê da derheqa bê welatîyê da nivîsî bû qal kir:

LÎ DESTÊ TEYE

Rojê ezêlî me li nav avaye,
Êş, jan, pirçûk bi Kurd birazavaye.
Dilê me ji derdan mîna ezvaye,
Ji destê me çûye erd û mavaye,
Van kulên pir-pir kûr gelek zûvaye.
Gelê Kurd! Dilgeşî li destê teye,
Terxanî, xweşî li destê teye.

Mirazê dilê me bêdûnda maye,
Şuxulê gelê Kurd hev-hevda maye,
Ev li navê derdan serêda maye.
Warên me li berên pir tada maye,

Li destê neyare û unda maye.
Gelê Kurd! Dilgeşî li destê teye,
Terxanî, xweşî li destê teye.

Bona Kurdan gurdil wek bira bûye,
Bila dîrok bêje, ji çira bûye?!
Rîyên me tarîye, bê çira bûye.
Ji hezar car zêde serhevra bûye.
Kurdistan kafû-kûn pir cara bûye.
Gelê Kurd! Dilgeşî li destê teye,
Terxanî, xweşî li destê teye.

Gelê me revoke, bela-belaye,
Miletê xebatkar destîvalaye.
Warê cînet bo me mîna kelaye,
Rîya me gelek û pir muxeylaye,
Li nav me bê jimar helahelaye.
Gelê Kurd! Dilgeşî li destê teye,
Terxanî, xweşî li destê teye.

Çîye va dûr ketin, çîye va ade,
Em gelê mêrxasin, iro bêmede,
Maye warênê me pir-pir bedîde.
Derdên me mezine ji çîyan zêde,
Tune li rîyên me şemal, sirîde.
Gelê Kurd! Dilgeşî li destê teye,
Terxanî, xweşî li destê teye.

Dema wî ev rêzana ku xilaz kirin min dît, wekî berê çavên wî şil bûne. Wî berê xwe guhast, çavên xwe paqij kirin.

Kek Şamîl bi ruh û canê xwe va esil kurdekî mêrxasî, welatparêz bû. Xwestina wiye here mezin ew bû, wekî Kurdistan serbixwe bibîne. Kîjan tamara bedena wî bihata jêkirinê, xwîna derketiyê binîvîsiya: Ez Kurdîm!

Ew amade bû, wekî boynet axa dayîkê ruhê xwe û hemû hebûna xwe feda bike. Kir jî... Dema ku Adirbêcanê da navê wî zanyarê pir mezin dihate kişandinê, ricaf dikete dilê her Azerîkî. Ber çavên wana dîdema Kurd, Kurdistan aza dihate xanê. Te qey sih dikir, wekî dilê wan nijadperestan danîne ser cermê jûjî, derzî têra diçin. Navê wî mêrxasî dilê wan qul dikir.

Navê Şamîl Esgerov dilê her welatparêzê Kurd da zîndî û jindar e. Ewî hê zîndîtiya xwe da bi destê xwe peykereke xwe ra çêkiriye. Nava Şamîl Esgerov vir ha qurne-qurne bijî.

ŞAMÎLÊ BIRA RA

Rewayî Şamîl Eskerov - zanyar, dîroknas, Kurdzan û nivîskarê Kurdayî bi nav û deng dikim.

Alim Şemîl, şaîr Şemîl, tu negirî pir hûre-hûr,
Dinya behre, em keştêvan, lê digerin, delave dûr.
Ba alîkî nake lîlîn, eva hukmê dewir-zemîne,
Çira kesî vênakeve, heta gave xût paşîne.

Bira, em çi bikin, tebyet rûyêd me qet nekenyaye,
Dayîkê, ewled gotîye, şev û roja ew giryaye.
Milk birine, xûn rêtine, war û hudûd kirine wêran,
Tim xastine yasax bikin, ew xebera nav Kurdistan.

Bê însafa şewitandin, hedimandin koşk û bajar,
Bok û beran şehîd ketin, pîr û kala kir zare-zar.
Tew xezna me, kuda birin, kîjan qulçî kirin cî-war?
Dutîretî me bû bela, pir zalima keda me xar.

Dinya Îslam me ra anî him bextreşî, him jî agir,
Hebûna me dijmin veşart, qurne, qurne nekir zahir.
Peritandin êl û obe, miskenêd me bû zaxêd sar,
Xûna Kurda ser Diclê da, ser Firat da tim hate xar.

Dîroka me înkâr kirin, xastin ku em bibin sêfil,
Qîz û lela reş girêda, xort zulmê ra nebûn qaîl.
Şêr û şenbaz ne seqirîn, dijmin xistin derbêd giran,
Şabe, îro, zingîn dike ew xebera nav Kurdistan.

QENCÎ NAYÊ BÎRKIRINÊ



*Bîranîn derheqa Mehmedê Siloyê
Bava da.*

Kal û bava me ra xezneke pir dewlemende tijî lel-dur, cewahir hîştine. Wa gotine: “Mirov hene, ji mala diçin, lê usan mirov jî hene, ji êla diçin”. Wan ev lal-durê qîmet bahayî, fîlosofî heman usan badîhewa ne gotine. Ew keda aqilê wanî hezar salaye, kîjan ku nav mejiyên xwe da hasil kirine, petine û nav parzûnê xwe da palandine. Rind, rind bişavtine. Hê

dane gel, wekî gel wan destê xwe da nolî çirakê berk-berk bigre. Nav emir da bin ronaya wan da bimeşe, xwe ra ciyê jiyânê bibîne.

Mehmedê Siloyê Bava (Mehmed Suleymanovîç Babayêv) ji wan mirovên bû. Ne tenê kurê malekê, lê kurê êlê bû. Ewladê gelê xweyî pir kêrhatî bû. Bi seya xemxuriya wî, gelek kesan bê piştovan digihîştine derecên here bilinde boy gel kêrhatî.

Ji wan mirovan yek jî ezim. Qet bîra min naçe. 1958-a demsala havînê bû. Mala me tevî malbatên pismamên me çûbûne zozana Qizil Ziyaretê. Em çend xort boy kargûzî kirinê gunda mabûn. Birayê minî mezin, Mehemmedemîn jî tew me bû.

Danê nîvro bû. Wî ez banî cem xwe kirim. Dêmekî kenî, eşq min pirsî:

-Barî, birakê min, ez gelekî şa me, wekî te dibistana navîn xilas kiriye. Lê te çi armanç daniye pêşiya xwe? Tuyê çi bikî? Kuda

herî û çî va mijûl bibî? Vê derheqê da te min ra qet tu tişt negotiye. Heta nika jî tişteki nabêjî.

Min posîde-posîde, nolî mirovekî nezanî xalifî çavên wî nihêrî. Ser milkên xwe hejandin û serê xwe ba kir, kesereke kûr kişand. Hinekî dereng got:

-Keko, rast dibêjî, min serê xwe unda kiriye, ber çavên min bûye tarîstan, hindik dimîne bifetisim. Qet ez xwe jî nizanim ezê kuda herim, çî va mijûl bibim, wekî alfîkî va derême ser riya rast.

Wî dubar min nihêrî, lê tu tişt ne got. Şûna xwe rabû, derkete derva. Min fehm kir, wekî axavtina min û wî negihîşte dawiyê.

Ew mirovekî pir dînhez bû. Hezbikî dinê xirab, ya ava bûya, kêfa xwe xirab nedikir. Tenê digot: “Xwedê kerîme, tu şaişa mekişînin, her tiştî destê wî da ye. Rehma wiye pire, wê îlacekê bike”.

Çend roj buhurîn. Wî dubar ez banî cem xwe kirim. Cî nîşanî min da, rûniştim. Vebişirî, şa-şa min nihêrî, kubar-kubar got:

-Bira, êdî tu fikra meke, bi îzna xwedê min mesela te êdî sedîsed hasil kiriye. Tuyê bê gilî qebûlî zankoyê (înstîtût) bibî.

Çawa mirovekî gelekî xwe arxaînî lê zêdekir:

-Tuyê wê demê bawer bikî, kekê te kî ye!

Destê xwe sîngê xwe xist, nerme-nerm bin lêva va vebişirî. Mîn bi baldarî wî nihêrî, ez jî vebişirîm, bi henekî got:

-Keko, tu usan xwe amin-amin diaxivî, dîtîyê bêje, ya tu serkarê înstîtûtêyî, yanê jî patşê Ermenîstanêyî. Te biryar daye, êdî her tişt kuta bûye. Payîzê ez ku gihîştîme ber derê înstîtûtê, dersdarê pêş min va bên, têkevîne bin milê min, wê min rûniştokê da bidinê rûniştandinê û bêjin, de keremke, tu êdî xwendevanê vê înstîtûtêyî.

Ew dîsa vebişirî, kûr çavên min nihêrî, hinekî berbi min hat, milê min girt, got:

-Birako, min derheqa te da mirovekî usan ra devê xwe vekiriye, ew ji wan mirovên ku tu dibêjî, qet ne kêmtire. Mêraniya xwe da ji wan qat-qat zêdetire. Hinekî sebr bide, tuyê qeweta kekê xwe, bi wan çavên xweye belek va bibînî. Lê rica min tenê ji te ewe ku, tu gotina min va arxanî nebî, derê pirtûkên xweye dersa tenê payîzê

vekî ha! Wedê xwe badîhewa derbaz meke, hazirî îmtahanê xwe bibe. Pêş wî mirovê qedir bilind, min rûreş meke.

Ew nav malê da hinekî çû, hat, milê min da girt, ber xwe kaşkir, dengêkî ne bilind got:

-De wekî usane, em çûn!



M.S.Babayêv tevî rewşenbirên
Kurda. 1961, Moskva.

Em mal derketin,
erebe wî “Volga”
siyar bûn, çend saeta
şûnva, gihîştine ber
avaîkî kevrê tûfê va
çêkirîyî ne mezin.
Ew erebê peya bû,
berbi avayî meşiya,
xêlekê şûnva dêmekî

qeş paşda vegeriya.
Şa-şa derê erebê
vekir, got:

-De keremke,

keremke, axayê min, te wî mirovî ra bidime naskirinê!

Ew kete pêşiyê, min da dû. Em ketine odekê, mirovekî bedewî, berbiçav, cilê nûye lê maseyê serwêr da rûniştî dît. Wî çawa em dîtîn, ji ciyê xwe rabû, vebîşirî, berbi me hat, got:

-Mehemmedemîn, birê te ev xorte? Welleh, ew ji pesindana te zêdetire. Dubar vebîşirî (dema dikeniya, dêmê wî diha bedew dibû). Destê xwe dirêji min kir, min xwest destê wî diramûsim, nehîşt. Destê xwe bilind kir, danî ser milê min. “Tu ser çavê xalê xwe ra hatî?”, got. Dêmekî qinyatdayî çavê min nihêrî, nerme-nerm axivî:

-Barî, kekê te min ra çi pêwîste qal kiriye. Tu zanî, qedrê kekê te cem min çiqase?

Birê min baxşandin jê xwest, berê xwe min da kir û got:

-Barî, ew mirovê ku min derheqa wî da te ra qal kir, ew ev camêraye. Navê wî Mehmedê Siloyê Baba ye. Jê ra Babayêv dibêjin. Niha wî rind bibihê.

Babayêv dîsa çavê min nihêrî, dêmekî milahîm got:

-Barî, kurê min, tuyê bikaribî rûyê min sipîkî, yanê na? Wekî qeweta te ewqasî tunene, êdî zehmet ne bide min, ne jî kekê xwe! Baş mitaleke, paşê mîna mêra dilê xwe min ra veke.

Min wî nihêrî, curekî pir xwe amin got:

-Xalo, wekî ezî qeweta xwe amin nebûma, min zehmet nedida kekê xwe, nedihatime cem we.

Ew vebîşêrî, dîsa destê xwe danî ser milê min, got:

-Eferim, eferim, lawo, kurê kurda ber tu çetîna mîl nebûne, ne tewîyane. De wekî tu ew kurî, du roja şûnva bê kekê xwe were cem xalê xwe.

Me xatirê xwe jê xwest, çûn. Dû roja şûnva ez hatime cem wî. Piştî xebatê em çûne bajarê Yêrêvanê. Gundê wiyî nêzîkî bajêr bû. Rêva wî çend pirsên ulmiye cure-cure dane min. Min jî weke zanebûna xwe bersîva wan pirsê dida. Li bajêr em ber derê sûreke bilind sekinîn, wî derê sûrê kuta. Jineke bejin bilinde gelekî bedew derî li me vekir. Wê ku Babayêv dît, kire îskîn, elberê “Elî, Elî” got û bankir. Mêrekî serî sîçe hate ber dêrî. Wî û Babayêv destê xwe dane hevdu, kenîyan, hevdu hemêz kirin, berbi oda mêvana çûn. Min da dû wana. Xêlek pirs û hewal hevdu kirinê şûnva ew vebîşîrî û Babayêv ra got:

-Hevalê Babayêv, pirsê etiv tunene, lê ev xorta kiye?

Babayêv jî vebîşîrî, kenene-ken got:

-Hevala Dalkilicov, digotin dersdar bê sebrin. Ne ez jî du-sê sala Kazaxistanê dersdar xebitîme. Îro mine ew gotina qebûl kir.

Dîsa hevdu nihêrîn, kenîyan, nav hewê da destê xwe li hevdu xistin. Xêlek derbazbûnê şûnva xanima wî Filora xanimê em banî oda nan xwarinê kirin. Ew li ser sifrê jî hevdura şîrîn-şîrîn diaxivîn. Piştî nan xwarinê, em dîsa derbazî oda mêvana bûn, demekê şûnva Babayêv rabû û xatirê xwe ji wî xwest. Curekî destmikerim berbirî wî bû, got:

-Elî muellim, ev xorta ne jî wan xortana ku min te ra kirine nas (wê demê min va eyan bû, wekî Babayêv xênî min dîsa hinek xortên kurd anîne cem wî), ev xortekî gelekî hêcaye. Dubar dibêm (destê xwe sîngê xwe xist), cawdar ezim. Min rind nas bike.

Dîsa kenîyan. Em vegeyriyane mala Babayêv. Wê şevê ez mala wî da mam. Sibê me tevî hevdu taştê kir, wî destê xwe da ser milê min, dengê milahîm got:

-Barî, kurê min, ne te mala Elî muellim nas kir? Pênc roja şûnva here cem wî, çi pêwîste, ewê te ra bêje. Lê hîviya min tenê ji te ewe: Derê pirtûka venekî, tevî hevalê xwe wedê xwe vala derbaz mekî. Here, hema îro da dest pê kirî, hazirî îmtahanê xwe bibe.

Ez demeke şûnda qîmetên bilind va qebûlî înstîtûta dewleta Ermenîstanêye ser navê Xaçatûr Abovyan, fakulteya filolojî û dîrokzaniyê bûm.

Wekî ew însana comerd nabûya, ez roja îro nedibûme helbestvanê gelê xweyî hezkirî.

Hezar-hezar rehmeta xwedê li wî mirovê comerdî, maqûl bibe.

**

GEL EWLEDÊ XWEYÎ HÊCA BÎRA XWE DERNAXE

Welatparêzê mezin, rewşenbîrê nemir Mehmedê Siloyê Bava, hezar-hezar carî rehmeta xwedê li te be!

Hemû bende têne dinê,
Dubar diçin ew ji dinê.
Hinek namrin, tim dimînin,
Rûyê dinê dixemlînin.
Her kesî ra ew hev nayê,
Nav bihêle li dinyayê.
Boy wê kara, heq pêwîste,
Ya yekemîn riya raste.
Ger bigirî riya pake,
Gelê timê te hez bike.
Mehmed gotina kal, bava,
Destê xwe da kire çira.
Ku gihîste wî meqamî,
Ser riya heq, wî pî danî.
Bû piştgirê pir fiqara,

Rastkir barê ketiya, xara.
Şev raneza, ro çerçirî,
Rûyê pira vekir derî.
Birçî kirin xwedî nane,
Bû sitara bê piştane.
Êl civande zû ser heve,
Neyar kirin birên heve.
Ew dostanî anî ortê,
Qetand rehê qetlê, xetê.
Pir keç, xortên bê mal, bê hal,
Kir xwediyê ulim, kemal.
Hilda ala kesk, sor, sipî,
Got: - Jiyan nabe bê welatî.
Bû piştvanê welatheza,
Rojek rihet mal raneza.
Vekir dergên cawdar, jore,
Dew kir Kurdistana Sore.
Zîndan, qeyda, fedî mekir,
Raketiyên ji xew rakir.
Serok dayê pîrozbahî,
Got:-Mehmed, êlê bibe xweyî.
Qencîke baş, wî min jî kir,
Pêş çavên min bû lel û dur.
Îro bûme nîvîskare,
Xweyî nav-deng, bexteware.
Tew destpêka dawî hene,
Wêya şûnva meş tunene.

II

Welathezê mezin, rumet,
Rihet razê, ci te cînet.
Hezar carî rehma li te,
Zûtirekê cesedê te
Emê ji vê goristanê,
Hildin, bibin Kurdistanê.

Defin bikin cîkî bilid,
Teva xanbin bajar û gund.
Ciyê te vir bibe rihet,
Wek axa dê, tune cinnet.
Şikir îro dem hatiye,
Kurd xewên tarî rabûye.
Ricafe kirye dilê xwînaxar,
Text, tacê wî dîkin tarûmar.
Welatê xwe jê distînin,
Gul, kulîlka lê diçînin.

Deh bûyer *(hîkyat)*

*Ji xezina folklorê gelê kurde tijê lel,
cewahirê nemirî*

Kur got: Bavo, hêştir difroşin (bûyera yekê)



Welatekî rojhilatê,
Nava qehrê, zulumatê.
Dijiya evdekî tivdîre,
Mêj, taetê nedima dûre.
Mêl nedibû pêş tû kesî,
Mal da kêmbû, nanê tisî.
Zar piçûk bûn, kar nedkîrin,
Pismama wî ar nedkîrin.
Rojek birçî, rojek tezî,
Rebbê jorîn dibû razî.
Roj, gav diçûn bê jimare,
Him dibûn germ, him jî sare.
Qenc razabû, deng nedida,
Xirav rihet penc vedida.
Ruzê hûrka pêk nedanî,
Pir direşand, kêmbû diçînî.
Dîsa dikir mêja xune,

Dijya boynet dinya dine.
Çi pêwîst bû, wî ew dikir,
Boy Xwedê şikir dikir.
Rokê dîsa wî mêj dikir,
Kurê mezin lez ket hundur.
'Bavo, bavo' got kir gazî,
Him ricifî, him lerizî.
Bavê fikir neda wiye,
Ew bankirin, seva ciye.
Ku kuta kir mêja xune,
Berbirî bû kurê xune.
Got: - Dibihêm, lawo, bêje,
Çi pêwîste, wî birêje.
Kur kir îskîn, got: - Bavo can,
Anîne hêştirên erzan.
Direvînin destên heve,
Tew dikirin yek, du heve.
Min dest daye ser yekêye,
Her hêştirek zêrekî ye.
Bavê kasil, kur mêzekir.
Feqîr-feqîr serêx bakir.
Got: - Kurê min, biborîne,
Me ra hêştir pêwîst nînê.
Kur poşman li ber bavê,
Pağış kirin hêsrên çavê.
Şerma neçû nava gunde.
Ket, mitalên tele rinde.
Bavo mêja xwe kir dubar.
Azanek da kubar, kubar.
Ji xew rabû, kurê feyde,
Betal nema, ew tu wede.
Pişt da pišta bavê xûne.
Bê wî mekir tişteke dine.
Çûn çend salên tele-şirîn,
Hûrik gir bûn, bav bû zengîn.
Heyam hate guhestinê,

Hat dema xwe parastinê.
Mal-dewleta wî bû pire.
Mal tijî bû bûk û kure.
Bû rûspîkî pîr nûranî,
Pira li wî bîetanî.
Mêvana ew nedhîşt rihet,
Yek ku diçû, yê din dihat...

**

Ro hatibû eslê fire,
Nav gund xanbûn kesên dere.
Wan anîbûn çend-çend deve
Difirotin yek, du heve.
Kurê mezin lez hate mal
Dît mêj dike, bavê delal.
Nekir şiqîn, ringe-ringe,
Fesal rûnişt, nekir denge.
Bavê xitam da mêjêye
Kur ramûsa destê wiye.
Vebişirî got, bavo can,
Gund difroşin pir devê can.
Her deveke deh zêrane,
Qîmetekî ne erzane.
Bav kenîya, wî mêze kir,
Kurt axivî, zêde mekir.
Got: - Kurê min, qeterekê
Me ra bîne tu carekê.
Kur zendegirt ma ve bersivê
Hêrs nihêrî rûye bavê.
Got: - Razîbe xwedê ji te,
Ser dernaxim ez şuxlê te.
Wedê devek bû zêreke,
Te got, me ra ne gereke.
Nika devek deh zêrane,
Dibê, me ra hevta bîne.
Bav kenîya cî hizîkir,

Rabû piya, ew hemêz kir.
Got: - Lawo, guh bide mine,
Tu tişt weke aqil tune.
Her dewrekê, rizmek heye,
Her bendekî, demek heye.
Nika dewir, dewra me ye,
Xwedê pir risq me ra daye.
Tu şaişa mekişîne,
Çi dixwazî, wî bistîne.
Dirav mirov dike şêre,
Zer-zinara hûr dihêre.
Gelsa dike mêrxas, başe,
Bê diravî, tim rûreşe.
Lawo, bibe aqil, hemde,
Firsenda xwe dest ber nede.
Boy şuxlê qenc xwe mede paş,
Rihet rûnê, get nebe şaş.
Torê paqij lel û dure,
Kes nafroşe, kes nakire.
Weki cî da ew tunebe,
Xirab tucar qenc, pak nabe.
Dirav rewşa rûyê însîne,
Pêş wî her derî vekirîne.
Berya me ra xezne hîştîye,
Çi pêwîste, wan gotiye:
“Bi malo, bi xatî, bi xalo,
Bê malo, bê xatî, bê xalo”.

Patşa dilgê dewrêşa da welatê xwe digere (bûyera duda)



Tava sibê zeriqî bû,
Patşa lez-bez ji xew rabû.
Pir nihêrî derdorê xwe,
Zû bankire wezîrê xwe.
Got: - Bibihê emrê mine.
Hilde, dayne gunê xune.
Ez sira xwe dibêm te ra,
Wê nebêjê tu kesî ra.
Wekî vebe, eva sira,
Serê teyê here pê ra.
Wezîr hejya, got: - Şahê min,
Ev çi pirse, dibêjî min.
Ez seîsê hespê te me,
Saîlim ber derê te me.
Tew emrê te min qebûlin,
Hebûn, jiyana ruhê min in.
Şah sero-bin ew mêze kir,

Çi gotibû, dubar mekir.
Got: - Êvarê were cem min,
Hulguz bike kar-barê xun.
Ez û tuyê bibin dewrêş,
Vira derên, bikin êriş.
Emê welêt tev bigerin.
Çendek şûnva paşda werin.
Tengî, telya welatê xwe,
Ez bibînim bi çavên xwe.

**

Ji bircê çûn, ew wê şevê,
Terkeselawet bûn dinê.
Pir geriyan, ew wê rojê,
Ber êvarê hatine sûkê.
Çavê xwe dîn qenc û xîrav,
Dikandarekî xwestin av.
Xwedî dikan, hecyê maqûl,
Ber dewrêşa xwe kire qûl.
Pir dêmekî eşqî, hebîn,
Danî ber wan, qawa miskîn.
Dema şuxul xilaz bûnê,
Dewrêşa kir karê çûnê.
Hecî lez got: - Dewrêşên min.
Îşev bibin mêvanê min.
Bana hecî gebûl kirin,
Na ne gotin, elhemd kirin.
Bûn mêvanê heciyê helal,
Dîtin malxuya wîye delal.
Çi pêwîst bû, wê boy wan kir.
Her tem û lem, zû hazir kir.
Dêmekî eşq, sifre vekir,
Çend-çend lewin wê lê rêz kir.
Piştî şîva teme, şirîn,
Anî sifrê qehwe miskîn.
Patşa razî ma hurmetê,

Bû mitheyrê wê hermetê.
Dawya qehwe vexarinê.
Sifre hate beravkirinê.
Hecî got: - Min, biborînin,
Ez hesavê xwe bikşînim.
Qelem, defter hilda deste,
Çeke-çûq kir, çep û raste.
Dawiyê rabû, jor mêze kir,
Rebbê jorîn pir şikir kir.
Berê xwe rast ber wana kir,
Got: - Min îro dîsa ziyar kir.
Gotina hecî neçû vala,
Patşa kire nav mitala.
Wî pir danî, hindik hilda,
Hukmekî sert wezîra da:
-Zû here cem dikandara
Bila kes nayê bazara.
Hecî rihet alvêr bike,
Bila boy me, ziyar meke.
Dewrêş razan pir narihet,
Sibê xawarin, çi bû qismet.
Her kesek çû kara xune,
Nemînin ji şuxlê xune.
Wezîr qedand emrê patşê,
Pir kesan nehat xebatê.
Hecî dikana xwe vekir,
Zû dest bi pêşeyê xwe kir.
Êvar gihîşt, dewrêş hatin,
Kê çi kiribû, ew negotin.
Sifra danîn têre, tijî
Temê pir cur, qehwe, çay jî.
Hecî, piştî şifre rabû,
Kaxet hildan, xêlêk şabû.
Dubar got: - Min biborînin,
Ez hesabê xwe bikşînim.
Kire çeq-çûq çep û raste,

Kaxet kirin ser hev deste.
Dawiyê rabû jor mêze kir,
Dîsa berê xwe ber wan kir.
Evraz, berjêr hev xuldirî,
Rast fetilî, wan nihêrî.
Rabû piya, nerm şikir kir,
Got: - Îro dîsa ziyan kir.
Patşa, wezîr tûj mêze kir,
Emre du şev, wî teze kir.
Emir da: Sibê vê sûkê,
Gerek bê dikandar bikî!
Gotê, emrê rast bîne cî,
Sûkê karke tenê hecî!
Wezîr qedand emrê patşê,
Venebûn tu dikanê sûkê.
Hecî malê xwe tew firot,
Metel mabû, tişt nedigot.
Bû êvara bê çilk, dûman,
Dewrêş bûne dîsa mêvan.
Hecî ew şa, pêşwaz kirin,
Birin hundur, cîwar kirin.
Xurek hatin sinî, sinî,
Sifre tijî bû her temî.
Ku kuta bû şîva helal,
Ji cî rabû, heciyê delal.
Dîsa got: - Min biborînin
Ez hesavê xwe bikîşînim.
Hilda, qelem, deftera xwe,
Jimirî kar, ziyana xwe.
Keniya, serê xwe bakir,
Got: - Îro, dîsa ziyan kir.
Patşa xêlek perîşan bû,
Qey welatê wî vîran bû.
Eşaretî da wezîre,
Got: - Em îşev neman vire.
Hecî ber wan pir geriya,

Wan fikra xwe nedan wiya.
 Tişt ne gotin, mal derketin,
 Hev nihêrîn, lez dûr ketin.
 Hecî jî xwe pir ricim kir,
 Heta sibê tu xew mekir.
 Patşa gihîşt birca xune,
 Çav lê tijî bibûn xwîne.
 Sibê xwekir cila sore,
 Derkete ser textê jore.
 Got: - Hecî bînin îro vire,
 Stû bedenê bikim dûre.
 Wezîr peyik şandin pey wî,
 Hecî anîn hizûra wî.
 Hecî xofgir, kete hundur,
 Dît mêvanê du şevî gir.
 Pêş çavên wî bû tarîstan,
 Lê tevizîn lêv û ziman.
 Weş ketê da, çok lerizîn,
 Hemû eza lê qerisîn.
 Bedena wî ji ruh bû rût,
 Patşa jê ra pir bi hêrs got:
 -Ey Hecyê pir temahkar,
 Me çigîs av, nanê te xwar
 Te ew pozê me ra anî,
 Rojê tiştekan dikir menî.
 Me çi xwariye, vegehrînim,
 Pêş te deyndar, ez namînim.
 Te her êvar piştî şivê,
 Dinihêrî stêrka, hîvê.
 Bê şerm, bê şerm şikir dikir,
 Digot, iro dîsa ziyan kir.
 Hecî hejya, got: - Şahê min,
 Ezê vekim vê sira xun,
 Emir, ferman destî te ye,
 Îro ziyanam dîsa heye.
 Rica dikim, efû bike,

Dergê xêrê pêş min veke.
Armanca xwe zelal bikim,
Merama xwe eyan bikim.
Hinek eman bide mine,
Paşê gutke serê mine.
Dema min got, “ziyan dikir”,
Qala emir û can dikir.
Her roj emrê min kin dibû,
Bo vî min ra ziyan dibû.
Sûra emrêm nizim dibû,
Çiqas diçû, çûçik dibû.
Loma usan zelûl dibûm,
Boy emrê xwe melûl dibûm.
Patşa mitheyr ma hişê wî,
Sed eferima xwe da wî.
Gotê: - Bibe, wezîrê min,
Çend sal bike kêfê cem min.
Hecî bi tirs wî mêze kir,
Sira dilêx jê ra vekir.
Got:- Şahê min, biborîne,
Erkê daîm qet tu nîne.
Iro tuyî, sibê yek din,
Wê xirabe, pir halê min.
Merhemeta xwe min bike,
Ku anîme, min wir rêke.
Şah qebûl kir, ew rica wî,
Xelat dayê, gotê bijî.
Keser kişand, wî nihêrî,
Gotê:- Welleh, tu esl mêrî.
Yê nolî te cem min kêmin,
Wek mirîşka a bê fehmin.

Beriya gotiye:
“Aqil, tacê zêrîne,
serê hemû kesî da tu nîne’.

**Derhega Mûsa kelîmlûlla şêrê serî êşyayî,
kalê xwedanê darê û mirovê bê hişî dû
bextê xwe ketî
(bûyera sisiya)**



Bûyerekê tê gotinê,
Pêxemberek têye dinê.
Dibên Mûsa kelîmlûlla,
Ewil bûye dîlê xweda.
Huba rebbê ser wî bûye,
Timê tev wî hewal daye.
Loma gotine kelîmlûlla,
Qedandiye emrê xwe da.

Quloz bûye Tûrî Sînîn²,
 Rica kiriye rebbê jorîn.
 Pêş mêl bûye hezar care,
 Xasteka xwe aniye zare.
 Rojek dîsa oxirê da,
 Dîbe hogirê şêrekî da.
 Şêr nizane ew Mûsa ye,
 Kelîmlûllayê xweda ye.
 Xêleke xurt tev dimeşin,
 Kî, kî ye, hevra dibêjin.
 Şêr dibîne ew Mûsa ye,
 Hezkiriye jor xweda ye.
 Gelek digrî, him diheje,
 Mereza xwe wa dibêje:
 -Mûsa, salên pir dirêjin,
 Nav êşê da ez dipijim.
 Serê dêşe her gav, deme,
 Min dûr naçin, jan û xeme.
 Rica dikim, te sed care.
 Rebb ra derdê bîne zare.
 Belkî êşê xilaz bibim,
 Tevî heval, hogira bibim.
 Mûsa dibê: -Ey bêzaro,
 Ewqas meke zare, zaro.
 Hemû derda îlac heye,
 Loxmanê wan yek xweda ye.
 Tu min li vir raçav bike,
 Rebb rehîme, fikra meke.
 Mûsa jî wî cuda dibe,
 Oxira xwe pêşda dibe.
 Ewirekê çûnê şûnva,
 Dengêk tê wî hinek dûr va.
 Kalek dertê berya wiya,
 Digrî, dike lavayiya,

² Tûrî Sînîn - Çiyayê Sina.

Dibê:- Mûsa, min sih bike,
Derdê min tu derman bike.
Zarokên min gelek hene,
Mal-dewleta min tişt tune.
Hewşa min da darek heye.
Behra wêya min ne diye.
Nû biharê gul vedide.
Avê didimê, bedew dibe.
Ku tèn rojên havîna germ,
Belg zer dibin, dibine nerm.
Şevêkê da diçilmisin,
Hemû cigil dibinisin.
Ser namîne behra wêye,
Dîtî digrîn, halê wêye.
Behra wê min nexwariye,
Nizam tema wana çiye?
Rica dikim, vî derdê min,
Bigîhîne xwedayê min.
Mûsa qewil dide wiye,
Dibê:- Meçe ji vî çiye.
Ezê rica te cî bikim,
Vî derde te derman bikim.
Oxira xwe didomîne,
Deynê rebb zû biqedîne.
Gelek diçe, hindik diçe,
Şeva, roja, eşq, şa diçe.
Qet naweste, kasil nabe,
Çiqas diçe, her şa dibe.
Menzîl dibe ku hindike,
Kelîmlûlla kar, bar dike.
Pêş rebbê xwe, ça mêl bibe,
Çi bêjê da, çi hîn bibe.
Dertê pêş wî yek fiqare,
Pir pejmûrî, bê sitare.
Halê xwe wî ra qal dike.
Du ta dibe, rica dike.

Dibê:- Ya, hezkiriyê rebbê jore,
 Zikê tu car nebûye têre.
 Şev û roja dixebitim,
 Giran, sivik bar hildidim.
 Kasiviyê kirme xare,
 Derdê min ra tune çare?
 Dîtî ser min qelfa dike.
 Kesek li min tu ar nake.
 Dibên bextê te razaye,
 Rojê naçin bê qedaye.
 Diçim, rakim bextê xune,
 Têr bibînim parî nane.
 Digrî, dibê Kelîmlûlla,
 Min azake, ji van kula.
 Mûsa li wî mêze dike,
 Piyê xwe lê xweyi dike.
 Halê wî da dikewgire.
 Disekine, nabuhure.
 Fiqar digrî, dilerize,
 Diaxive xofgir, leze.
 Mûsa dibê: - Evdê feqîr,
 Hemû derda heye tedbîr.
 Gilî didim, ez rica te,
 Bigihînim xudayê te.
 Vir xweyîke piyê xune.
 Bê min meçe cîkî dine.
 Kelîmlûlla çiyayê Sînîn,
 Xwestekên xwe tîne zimîn.
 Kêm dibêje, pir hiltîne,
 Rebb wan rica dihesîne.
 Nazil dibe, dengekî zîz,
 Pîr şîrînî, gelek ezîz.
 Dibê:- Bêje, bêçarên min,
 Derdê wana derman kir min.
 Dermanê şêr pir hêsaye,
 Ew mejûyê bê hişî ye.

Wekî bixwe mejiye wiye,
 Wê xilazbe, wî derdiye.
 Kalê meke zêre-zêre,
 Bin darê da xezna zêre.
 Dema dibe germ havîne.
 Zêr germ dibin, didin bîne.
 Loma dar zû diçilmise,
 Behra wêya tew dirije.
 Wekî zêra kal derxîne,
 Behra wêya wê bibîne.
 Bextê fiqar min xew rakir,
 Ruzakî pir jê ra rast kir.
 Bila şa be bextê xune.
 Têr bibîne ruzê xune.
 Kelîmlûlla, pir şa dibe,
 Elhemd dibê, hêsa dibe.
 Difetile dilekî şa,
 Mêze dike her çar hêla.
 Tew gotinên rebb dihebîne,
 Armanca xwe diqedîne.
 Feqîr serê rê dibîne,
 Gotinên rebb dihesine.
 Dibê:- Rebb, bextê te rakiriye,
 Ruza te ra rast kiriye.
 Bibe bersîvbirê mine,
 Wan ra bêje giliyên mine.
 Wan dibêje, xayî dibe,
 Fiqar zendegirtî dibe.
 Êvareke dereng, tarî,
 Ew dibîne kalê zarî.
 Cawa Mûsa dide wiye,
 Kal derdixe, wê xeznêye.
 Fiqar sibê dike here,
 Kal ber wiya pir digere.
 Dibê:- Meçe, birayê min,
 Ev mal-dewlet te daye min.

Were, em wê nîvî bikin,
 Emrekî nû dest pê bikin.
 Hevra bijîn nolî bira,
 Malbeta xwe bîne vira.
 Em tev bijîn şa, bextewar,
 Zar mezinbin, dest bigrin dar.
 Timê bîne şikrê xune,
 Bike mêj, taqeta xune.
 Bîr derxe wan rojên giran,
 Dergê te jî vekin mêvan.
 Xwedê bextê me rakiriye,
 Ev xezna têr rast kiriye.
 Ew na dibê, emir dide,
 Ji wê xezna tişt hîlnade.
 Dibê:- Diçim, dû bextê xwe,
 Wekî bijîm bi keda xwe.
 Lez ji kalê dîr dikeve,
 Gelek diçe roj û şeve.
 Ser riya xwe şêr dibîne,
 Gotina Mûsa dihesîne.
 Derheq xeznê da gal dike,
 Pêş wî xwe pir bilind dike.
 Şêr bê hes wî mêze dike,
 Nêzîk dibe, qaîm digre.
 Dibê:- Bê hiş wek te tune,
 Hişê te dermanê mine.
 Davêje nav lexmê xune,
 Şikir dike rebbê xune.
 Êşa giran xilaz dibe,
 Dinyake nû pêş vedibe.
 Nolî berê dike nirîn,
 Kubar, kubar dike qîrîn.
 Serê xwe zexm quloz dike,
 Ser hemûya emir dike.
 Pêş mêl dibin, tew terewil,
 Hindik dijîn tim bê aqil.

Aqil duxe heyâ dinê,
Eşq, şayê da dibe xinê.
Hevsen dike zêre, zêre,
Dinê diçe tim bê pare.

Sê xelatê xwedê hene,
Her sê jî boy bendê wî ne.
Deng û agil bedewiye,
Aqil tacê wan herdaye.

Derheqa dostiya şivan û mar da (bûyera çara)



Bin esmanê şînî me dûr,
Tevî êlên him gir, him hûr.
Li ser axa Şerqa kale,
Jîye êleke perqale.
Mêrê wêya tew lok bûne,
Dil paqije, mêrxas bûne.
Xatûn keçên ewê êlê,
Xort kirine cengê, qalê.
Rîqatiyê pir dûr bûne,
Tew demsala koçer bûne.
Berf helyaye, hilkişyane,
Berf bariye dakişyane.
War, warkoz zû guhestine,
Bahar, paîz, him havîne.
Şivanekî, wêyî pispor,
Simêlpalî, him zexmî, zor
Kerî mêrga gerandiye,
Daristana çêrandiye.
Kesî pêşî negirtiye,

Milê wiya qat nekiriye.
Her ro dotiye miya reşe,
Vexwariye, şîrê xweşe.
Wa xwariye nanê nîvro,
Dubar kiriye, ewa her ro.
Carkê dîsa ew tasa şîr.
Datîne ber kevrekî hûr.
Diçe hevana nîn bîne,
Nanê tisî jê derxîne.
Dema pêşda vedigere.
Şaş faş dibe, kuda here.
Mar veduxe şîrê tasê,
Nake ne xof, ne jî tirsê.
Şivan wî pir mêze dike,
Nêzîk nabe, tu deng nake.
Mar red dike şîrê tasê,
Zêrekî zer dixeweşê.
Ji destpêka wê rojê da,
Ew şîr dike wê tasê da.
Mar wî şîrî hildîçine,
Dewşê zêrekî datîne.
Êdî dibin, dostê heve,
Şîr veduxun dor, dor teve.
Her roj zêrek dike kare,
Hebûn wayî dike hare.
Rokê temaq wî zor dike,
Mala xwe, xwe xirab dike.
Dibê:- Mar bikujim, xeznê bibim,
Mal-dewleta pir va şa bim.
Rokê dîsa nolî her ro,
Şîr didoşe, dide ber ro.
Mar dizane dangê xune,
Tê mêvanê dostê xune.
Tê veduxe şîrê tasê,
Zêrekî datîne dewşê.
Ber hêlînê quloz dibe,

Şivan dû wî evraz dibe.
Dema dikeve hêlînê,
Ew şivdarê dadweşînê.
Boçika mar zû qut dibe,
Dostiya wan xilaz dibe.
Mar diqîre, dike qazî,
Dibê:- Rebb te nebe razî.
Çima te ev zulma min kir,
Dostiya me, wa qîmet kir?!
Ez ‘qenciya’ te bîr nakim,
Êdî dergê te venakim.
Şivan dubar naçe wire,
Baş dizane kina mare.
Keçe pir bûn, kurik yek bû,
Pir bedewî, zef çeleng bû.
Dost, pismama wî hez dikir,
Serê wiya mehez dikir.
Gelek cara apa, meta,
Radizandin mala xwe da.
Rojek şivan dibê, lawêw,
Îro bibe hevgelê min.
Şikir êdî mezin bûyî,
Qed, qamet da wek min bûyî.
Salê dirêj westandime,
Emir çûye, bê taw bûme.
Ewê rojê lawê şivan,
Kerî dibe best, beyaran.
Nîvro dibe ber xincîke.
Karê xwarina nîvro dike.
Nolî bavê xweyi bê taw,
Ew jî dixwe nan, şîrê xav.
Qasek şûnva dihênice,
Mar tê cem wî, kîn û huce.
Tê vedide, dihuriye,
Kîskê jehra xwe dirêje.
Dibe êvar, kerî nayê,

Şivan digre êşa, tayê.
Ji mal dertê lez direve,
Heta sibê pêz digere.
Dişiqite ber xincîke,
Dike kur ji xewê rake.
Mar dûra va wî ban dike,
Dibê: - ‘Bira’, wî raneke.
Bersîva xwe bibe xwedan,
Te mala xwe, xwe kir wêran.
Ew fehm dike gunê xune,
Kulma dide qotê xune.
Wedekî pir dibuhure,
Şivan kêrî dibe wire.
Dîsa miya reş didoşe,
Dike tasa wek beroşe.
Diçe ber hêlîna mare,
Dibê dostê, rabe, were.
Gunê min, te weke heve,
Dîsa bibin dostê heve.
Mar dibêje: - Êy bê îtbar,
Min helalî şîrê te xwar.
Xayînetî te kir mine,
Te qut kiriye, boçka mine.
Ez bê boçik perîşanim,
Dilbirînî, êş giranim.
Hêvî dikim, neyê vira,
Êdî tu tucar, nabin bira.
Jana boçîkê dilêm naçe,
Êşa ewlad te dûr naçe.
Êdî ji min tu dûr here,
Ku dixwazî, wir bigere.
Ber çavê min naye xanê,
Em neyarin li vê dinê.
“Xwe xwe kiriya derman tune,
Dawiya temaq girî, şîne”.

Keça mêrxas (bûyera pêncra)



Patşakî pir agil hebûye. Şevêkê cilê dewrêşa xwe dike, tevî wezîrê xwe dertê nav bajêr digere. Dibîne, wekî tu mala da ronahî nayêne kivşê. Tenê malekê da ronahîke ne ewqasî şemal hela veneêsiyaye. Ew dikeve nav mitalên kûr. Xwe-xwe pirsê dide xwe. Çima

hemû mala da ronahî veêsiyane, sedem çiye, wekî vê malê da ronahî nehatiye veêsandinê?

Boynet mena wê hînbibe ew tevî wezîrê xwe hêdî-hêdî diçine ber pencera wê malê. Hundur dinihêrîn, dibînin ku, xortekî gelekî bedew û keçeke wî bedewtir orta malê da xalîçek danîne, belgî dane ber palê xwe, şîrîn-şîrîn hevdu ra diaxivin. Geh hevdu maç dikin, geh jî hevdu hemêz dikin.

Wezîr eşaretiya çûnê dide patşê. Patşa dibêje:

-Wezîrê min, hinekî sebir bike, ezê boynet ginyatê heta dawiya vê dîdemê mêze bikim, bê dawiya wê çava xilaz dibe.

Ew ewqasî raçav dikin heta xort diweste, serê xwe datîne ser sîngê hezkiriya xwe, dikeve xewa hinkofê da. Keçik serê xwe bilind dike, kuleka jorê dinihêre. Kulekê da şîrîteke sipî berjêr dibe. Keçik şîrîtê dike fewaqe, davêje stuyê xort. Dîsa evraz dinihêre. Şîrît hêdî-hêdî evraz tê kişandinê. Keçik elbêra sûrê xort jî kalîn derdixe stuyê xort ji bedena wiyê cuda dike.

Kulekê ra erebekî reşî elêwet berjêr dibe. Ew û keçik hevdu hemêz dikin. Qasekî şûnva laşê xort xalîçekê dipêçin, nav malê da çelekê vedidin û wir da vedişêrin. Dîsa dest bi sewq û sefa xwe dikin.

Patşa emrî ser wezîr dike, wekî wezîr nîşanekê wî derî bixe. Wezîr emrê patşê diqedîne, ew vedigerine koşka xwe.

Patşa hê sibe ronî nebûye, cilê sor xwe dike, banî wezîr dike, wekî wezîr wê keçîkê û wî erebî bîne huzura wî.

Wezîr tevî piştgirên xwe diçe, wekî wana bîne. Dema digihîje wê kolanê, dibîne ku, deriyê hemû malên kolanê bi nîşana wî derê wan xistibû hatine nîşankirinê. Ew dernaxe, êvarê deriyê kîjan malê nîşan kiriye. Halekî pejmûr da vedigere huzura patşê, çi dîtîye jê ra dibêje. Patşa xêleke xurt dikeve nav mitala. Dawiyê gelek hêrs serê xwe bilind dike û dibêje:

-Wezîrê min, ezê sibê da çil rojî herme welatê dereke. Quluxa xwe didime te. Lê bîr meke, heta vegerandina min gerekê welatê min da boynet dermana be jî jinek nemîne. Fitê mede ruhê wan, gişka qutke. Wekî tu emrê min neqedîne, ezê elbêra serê te bidime ber kêra cellada.

Patşa emrê xwe dide û menzîla xwe diborîne. Wezîr êvarê halekî pir bê mede tê mal. Emrê bavê wî sed salî zêdetir bûye. Ew nav qutiya pembû da dihate xweyîkirinê. Bav bê medetiyê kurê xwe dipirse, kur naxwaze bêje. Lê bavê wî dest jê venakişîne. Wezîr dilekî xofgirtî emrê patşê bavê xwe ra qal dike. Bav dibêje:

-Kurê min, kêfa xwe lap kok xweyîke. Guhê xwe mede patşê. Ew hêrs bûye, wê poşman be. Eger tu emrê wî biqedînî, ew dawiyê te gunekar derxe. Qet jinekê jî mekuje. Patşa ku hat, min bibe huzura wî, ezê bersîva wî bidim.

Wezîr bixwaze, nexwaze misileta bavê xwe ra qaîl dibe. Lê dilê xwe da xwe ra dibêje: “Patşa ku vegeriya wê ese serê min qutke”.

Wext-wede tamam dibe, patşa ji gerê vedigere. Dema ku piyê xwe datîne ser axa welatê xwe, dibîne du jin vira, sê jin wira berav bûne. Hevdu ra şîrîn-şîrîn diaxivin. Çawa bêjî, wan qet haj bayê dinê tunenin. Hindik dimîne, wekî patşa dîn bibe. Hundurê xwe da dikele, diqilqile. Zû-zû radibe, rûdine, tewata wî nayê. Gawa digihîje koşka xwe elbêra cilê sor xwe dike, dertê ser textê qetlê.

Banî cellada dike, ser wan da hêrs dibe, diqîre, emir dide zû stuyê wêzîr lêxin!

Wezîr destê xwe bilind dike, feqîr-feqîr çavê patşê dinihêre. Rica dike, wekî ew deqîqekê sebir bike, wî bibihê, dîsa serê wî bide qutkirinê.

Patşa hêrs-hêrs wî dinihêre û eşaretiyê dide cellada, wekî bisekinin. Dibê:

-Rica te çîye? Zû bike, bêje! Te emrê min ne qedandiye, xilazbûna te tunene.

Wezîr tirse-tirs hîvîkirina bavê xweyî sed salî patşê ra dibêje. Patşa emir dike, bavê wezîr di nav qutiya pemu da tînine huzura patşê. Patşa hêrse-hêrs jê dipirse:

-Çend serê te hene, wekî te nehîştiye kurê te emrê min biqedîne?

Kalê dibêje:

-Patişa sax be, rica dikim min bibihê. Kuştin, hîştin destê te da ye...

Ez him wezîr, him jî palewanê bavê teyî rehmetî bûm. Çil palewanê bavê te hebûn. Her şevêkê palewanek unda dibû. Kesî tu serederî jê dernedixist. Ew çî tê qedandinê, kî wan kuda dibe? Yanê jî ew bê ser, bin kuda diçin... Patşa ketibû halekî giran. Nizanibû çî bike, vê sirê bi alikariya kê veke! Bi vî cureyî sî û neh palewanê bavê te bê sero bin, unda bûn. Ez pelawanê çilî bûm. Min rind zanibû, wekî êdî dor gihîştiye min.

Şevêkê nişkêva derê min kutan. Ez lez ji nav ciyê xwe rabûm, berbi dêrî çûm. Xwest derî vekim, kulfeta min destê min girt û got:

-Mêro, lez mekeve. Belkî ew neyarê teye, hatiye te bikuje. Yanê jî dostê te ye, hatiye tu alîkariyê wî bikî yan jî diqewime hûn ciya da herin. Şerme, vî halî da dernayê pêş wî merivî. Rabe, cilê xwe li xweke, çek-sîlahê xwe girêde, hespa xwe zîn-basûd bike, lê siyarbe. Paşê jî derê xwe veke, derê pêş wî kesî. Eger dostê te be, teklîfaya malê bidê da. Na eger neyarê te be, xwedê wê ya bide te, yanê jî bide wî. Çima usan lez dikevî!

Min xebera wê kir, çî pêwîst bû gişk qedand. Hespê xwe siyar bûm, derî vekir. Dît siyarekî tenê ye. Min pirs dayê da:

-Tu kî yî, çima vê niv şevê derê min dukutî?

Wî tûj li min nihêrî, got:

-Bide dû min!

Êdî ne ji min, ne jî ji wî tu deng derneket. Min da dû wî. Em bajêr derketin. Min temê xwe lê xirav kir, wî ew fehm kir, min nihêrî, got:

-Ciyê xwe da rihet bisekine.

Em xêleke xurt dîsa çûn. Min temê xwe disa lê xirav kir. Wê dîsa min ra got:

-Ne, ez te ra dibêjim, ciyê xwe da rihet bisekine.

Cara sisiya wî ez nişkêva nolî çivîkekê ser zîn hildam, danî ber xwe. Usan ez givişîm, min hezir kir şîrê dayîka minî sê rojiyê difingê min ra avîtin. Dîsa danîme ser zîn, dubar got:

-Ne ez te ra dibêjim, ciyê xwe da rihet rûnê! Wê şûnva êdî min fehim kir, ku ez nikarim qet tiştêkî bi wê bikim. Ew jî min gelek-gelekî qewettire. Daha baş dibe, çawa ew dibêje, ez şûna xwe da rihet rûnê. Binihêrim, bê dawî çawa dibe.

Sibe li me, bereka çiyakî ewqasî jî ne mezin ronî bû. Zeraya tîrêjên tava sibêye bedew danîne ser me. Em sekinîn, min wî mêze kir, dît ku, rûyê wî pêçandiyê, tenê çavê wî xuyaye. Ew hespa xwe peya bû, ez jî peya bûm. Wî dizgîna hespa xwe da min, du-sê gava jî min dûr ket. Berê xwe berbi royê kir, kesereke kûr kişand. Paşê berê xwe min da kir, bi çavên şêlû min nihêrî, destê xwe berbi çiya bilind kir û got:

-Tu wê şikeftê dibînî? Dêw wê şikeftê da dimîne. Ew neyarê min e. Ezê nika herime wir, tevî wî têkevime şer. Xwedê ya bide min, yan jî bide wî... Te qîrîna mine yekê ku bihîst, bizanibê ku min ew dîtiye. Qîrîna duda ku bihîst, bizanibe em ketine şerê giran. Qîrîna sisiya ku bihîst, bizanibe min ew alt kiriye. Te ku qîrîna mine sisiya ku nebîhîst, bizanibe wî ez alt kirime. Êdî hawara min neyê, wê te jî bikuje... Ew barê hespa min gişk zêzewerê qîmet baha ye, bibe bila li te helal be. Lê, êdî ez dilê xwe te ra vekim. Tu bizanibî, ez kî me, armanca min çiyê, çima banî te kiriye, paşê herim. Bila dilê te da xurî şûşî nemîne.

Ew sî û neh palewanên hevalên te gişk min kuştine. Min mînanî derê te, şev derê wan jî dikuta. Ew cilê şevê va derdiketine pêş

min. Min ew bajêr dûr dixistin, dukuştin, davîtine çelekê, ser wan xwelî dikir. Çumku min hereketê wana da nişana pelewantiyê nedidît. Tu ku çek-çîlahê xwe va, hespa xwe siyarbûyî derketî pêş min, ez şa bûm, wekî min palewanekî bi mertal dîtiye. Sih kir, ku şênê mêrxasiyê te da heye.

Vê xeberdanê şûnva wî şûrê xwe hilda, berbi şikeftê berjêr bû. Nerme-nerm meşiya. Ser stuyê xwe zivirî, min nihêrî û got:

-Te ez fehim kirim, yanê na?

Çawa eşaretîya fehimkirinê min serê xwe hejand. Ew çû.

Xêlek buhurî. Qîrîna wîye yekê hat. Qasekî şûnva min qîrîna duda bihîst. Piştî qîrîna sisiya min fehm kir, wekî wî neyarê xwe alt kiriye.

Piştî qîrîna sisiya ew êdî paşda venegeriya. Min herdu hesp hevdu va girêdan, beralê ra şiqitîme jêrê. Kutasiya berekê kumbezeke nû çêkirî dît. Nêzîkî kumbezê bûm, hundurê wê nihêrî, dît ku, orta wê da goreke nû heye. Keçeke ne bikî, ne bixwî, lê binihêrî, perê gorê rûniştiye. Guliyê wêye reşe hûnayî namila wê da nolanî tîremera heta navkêlka wêye zirav berjêr bûne. Hûr-hûr digiriya û dibêje:

-Delalê min, min heyfa te hilda, dilê xwe rihetkir, gihîştîme mirazê xwe. De nika min qebûlî cem xwe bike. Ez nixwazim bê te vê dinya ronik da bijîm.

Hukulê şûr kutabû ber dilê xwe. Dema ku xwest xwe ser şur da bavêje, min nişkêva ew girt. Ew fetilî çavê hêsir va melûl-melûl li min nihêrî, got:

-Hey însanê şîrê xav metiyo, te çima nehîst ez bigihîjim mirazê dilê xwe? Ne min qewil dabû wî, wekî ew vê gorê da tenê ranezê.

Min şûr ji destê wê hilda, milê wê girt, ji kumbezê derxist.

Ew hinekî hêsa bû. Min dil, dîne xwe tev anîn. Nêzîkî wê bûm. Dengêkî nermî dostanî ji wê rica kir, wekî ew derheqa vê qewimandinê da min ra qalke. Wê hesrên xwe paqij kirin û got:

-Te dîsa ser birînên mine kewnegirtî vekirin... Wê kumbezê da kurê apê min radizê. Me ji hevdu pir hez dikir. Deweta me bû. Şeva ewil vî dêwî ew xewê da kuşt. Min pêş laşê wî sond xwar, wekî ezê heyfa te bistînim, paşê tevî te vê gorê da razem. Bê însafo, te nehîst ez bibime xwedanê şertê xwe.

A wê demê hê pê hesyam ku, ew palewanê ku îsev ez ji mala xwe derxistime anîme vir, xwedana vî culetê nebawerkirî, ev keça tûnsîze xilfîne.

Min gotê:

-Te heyfa xwe stend, xwesteka xwe qedand. Êdî mitale kirin pêwîst nîne.

Wê zelûl-zelûl min nihêrî, destê min girt, kesereke kûr kişand, got:

-Yeqîn xwedê eniya min wa nivîsiye, ez rastî te kirime. Dilê te çawa dixwaze, usan jî bike.

Min ew keça mêrxas stend. Ev wezîrê te lawê wê mêrxasêye. Patşa sax be, jin hemû ne yekin. Yê usan jî hene, yê wa jî hene. Hesavê hişk, ter şewitandin, guneyê herî mezine. Nika ferman destê te da ye, hez dikî celladke, hez nakî efûke.

Piştî vê qîsa kalê şûnva, patşa wezîrê efû dike. Xelatekê jî kalê dide û debêje: “Çiqasî jî zane bî, dîsa muhtacê hînbûnêyî!”

Patşa diza efu dike (bûyera şeşa)



Şevêkê patşa tevî wezîrê xwe cilê xilmet xwe dike, dizî dertê nav bajêr digere. Xêlek gerê şunva ew vedigerin, wekî herine koşka xwe. Dema nêzîkî koşka dibin, patşa dibîne, hinekî wan wêda sê qeratû geh radibin, geh rûdininên. Patşa wezîrê xwe ra dibêje, hinekî piyê xwe xweyîke, em hîn bibin, bê ew kîne, vê şevê vir çi digerin.

Ew hinekî nêzîkî wan dibin. Tê derdixin, rastî jî ew ne mirovên xêrene. Patşa bi eşaretiya zimanê diza (diz dema ku şev rastî hevdu tên, ew ya pê zimanê xwe, yanî jî bi lêva xwe va dikine mirçe-mirçe) wan bang dike. Ew jî banî wana dikin, têne cem hevdu. Patşa kîbûna wan dipirse. Ew dibêjin em dizin, hatine xezna patşê bidizin. Patşa dibêje:

-Welleh, hema em jî dizê xezna patşêne.

Ew hevdu ra dibine nas. Dema ku radibin herine xeznê bidizin, patşa dibêje:

-Em gişk dizin, armanca me yeke. Lê werin, em hîn bibin bê kî ji me xwedanê çi senetiye, paşê herin. Ew fikra patşê ra qaîl dibin. Dizê yekê dibêje:

-Senetê min eve: Dema ku ez nêzîkî bêriya diziyê dibim, çiqas sek ku wir hebin, hemû dikine kaste-kast, serê xwe dirêj dikin, radizin.

Dizê duda dibêje:

-Dema ku ez nêzîkî deriyê grêdayî dibim, kilîtê deriya xuberê dikine şirqe-şirq û vedibin.

Dizê sisya dibêje:

-Ez mirovê ku şev şeverêşê da dibînim, sibê rastî wî hatinê elbêra nas dikim.

Dizê yekê ji patşê û wezîr pirs dike:

-Hûn senetê me hîn bûn, de nika hûn senetê xwe bêjin...

Patşa dibê:

-Ez ne dizekî nolî we me. Ez dizekî pir qewetim. Dema ku ez felqa simêla xweye rastê badidim, nîvê dinê ava dibe. Kingê felqa çepê badidim, nîvê dinê xirab dibe.

Diz senetê wezîr dipirsin. Wezîr dibê:

-Mezinê min çi emrî dide, ez wî diqedînîm, yanê xizmetkarim.

Patşa, wezîr û her sê diz qewlê xwe dikine yek, berbi xezna patşê diçin. Dizê yekê xwe dide pêşiyê. Dema ku nêzîkî xeznê dibin, hemû sek dikine kaste-kast, serê xwe dirêj dikin, radizên. Dema ku dizê duda dest davêje kilîta xeznê, kilît xuberê dikine şirqe-şirq, vedibin.

Wana têdikevin xeznê, giran û sivik weke qeweta xwe hildidin, bi lez û bez ji bajêr derdikevin, digihîjine rasteke gelekî mezin. Nîvê rastê tehtekî berî mezin dibînin. Dizê yekê disekine û dibêje:

-Hevalno, emê êdî ji we biqetin, menzîla me heta vira ye.

Ew nêzîkî teht dibin, teht hildibirin, pê şirîtê dadikevine jêrê. Patşa û wezîrê wî para xwe hididin, vedigerinê îmaretê patşê. Her yek diçe mala xwe.

Sibê zû xeznedarê patşê ku derê xeznê vedike, zendegirtî dimîne. Kulma serê xwe dixîne. Dike qîre-qîr, berbi patşalixê

direve. Cawê dide patşê da, wekî îşev diza nîvê xezna te birine. Patşê banî serwerê ewlekariyê xeznê dike, navnîşanê rastê û ciyê ku diz şev ji wan qetiyane şirove dike. Serwerê ewlekarî komên xwe va diçe wan diza xewê da digire, çî ji xeznê birine gişkî dide pişta wan, elbêra tîne huzura patşê.

Patşê cilê sor xwe dike, dertê ser text, banî wezîr, wekîl û rimdarê xweyî sereke dike. Cellada amade dide seknandinê. Paşê ji wezîrê xwe dipirse:

-Wezîrê min, ez çî cezayî bidime van diza?

Wezîr dibêje:

-Patşa sax be, serê wan bide jêkirinê, laşê wan şeq-şeqî bidin kirinê û dergê sûra patşalixê da dardakin. Bila cimaeta te bizanibe, wekî kî xaîntiyê patşê ra bike, wê têkeve vê rojê.

Rimdar bi dengêkî nizim dibêje:

-Esil hewe.

Patşa ji wekîlê xwe dipirse:

-Ya wekîlê min, ez çî cezayî bidime van diza?

Wekîl dibêje:

-Patşa sax be! Stuyê wan bide qutkirinê, laşê wan bide qîme-qîme kirinê û derwazê sûra padşalixê da dardakin. Bila cimaeta te hesabê xwe bizanibe.

Rimdar dîsa hêdî debêje:

-Esil hewe.

Patşa berê xwe berbi bakêşê xwe dike, dibêje:

-Bakêşê min, ev çend salin tu zehmetê min dikşînî, şev û roj têr ranezayî. Tu jî bêje, ez çî cezayî bidime van dizan?

Bakêş dengêkî xofgir diricife û dibêje:

-Patşa sax be! Ez kîme, wekî tu derheqa cezayê wan da ji min dipirsî?

Patşa hêrse-hêrs dibêje:

-Zû bike, fikra xwe bêje! Yanê ezê!..

Bakêş dîsa tirse-tirs bibêje:

-Patşa sax be, wekî tu min datîni dewsa meriva, ji min pirs dikî, ez dixwazim, wekî tu wan efû bikî, herekê xelatekê lêkî, berdî bila herine malê xwe. Wekî camaeta te bêje: Patşê meyî gelekî aqil û adîl e.

Rimdar vê carê dibêje:

-Esil eve.

Patşa ji diza dipirse:

-Ez çi cezayî bidime we?

Dizê ku gotibû “ez meriyê şev dibînîm, ro wî nas dikim” ew ji patşê hîvî dike, dengêkî gunekar dibêje:

-Patşa sax be! Em gunekarî, çi cezayî didî, bide. Me xezna we diziye. Lê, ricake min ji te heye – Patşa gelek sert wî dinihêre, diz berdewam dike. – Rica min ewe, wekî hûn felqa simêla xweye rastê badin.

Patşa hesabê xwe hildide...

Dawiyê patşa berbirî rimdar dibe, dibêje:

-Ya rimdarê minî pir zane, nika dora te ye, cawa xwe bide! Dema min fikra wezîr û wekîl pirs dikir, te piştî bersiva wan çima digot: “esil hewe”... Dema ku, bakêş bersiv da, te got: “esil eve...”

Rimdar dibê:

-Patşa sax be, gilî bûn, hatine hişê min, min jî gotin. Çima usan pey dikevî?

Patşa dibê:

-Ya rimdar, yeqîn te bîr kiriye, wekî tuyî huzura patşê da yî? Boy her gilî hebûn û tunebûne te sekiniye. Hîviya bersiva te me!

Rimdar diwawiqîne, tirse-tirs dibê:

-Patşa sax be. Wekî ez mena wan herdu giliyan vekim, gereke dewleta da gelek guhastinê mezin bibine kirinê. Rica dikim, bila mast ser girtî bimîne.

Patşa pir hêrs dibe, zexm diqîne:

-Ne, min got, ezî hîviya bersiva te me!

Rimdar dibîne çare tune, dibê:

-Patşa sax be. Wezîrê te kurê qesabe. Bavê wî jêkiriye, şeq-şeq kiriye, darda kiriye. Wî ji senetê bavê xwe xeberda. Bavê wekîlê te kivavpêj bûye. Wî jî ji senetê bavê xwe xeberda. Bavê wî her tim goşt qîme-qîme kiriye. Lê ev bakêşê te, kurê filan patşahî ye. Wedê bavê wî ji patşahiyê xistin, neyara hemû neferê malbata wî qut kirine. Tenê ew zara ber xeza wan xilaz bûye. Nika we ra bakêşiyê dike. Wî jî ji senetê bavê xwe xeberda.

Patşa hema wê sihetê wezîr û wekîl ji xebatê derdixe, bakêş wezîrê xweyî sereke kivş dike, diza efû dike, her yekî ra xelatekê didê û dibêje: “Herin, bi keda helal bijîn”.

Loma jî kal û bava gotiye:

“Esilzade dikêlime, zêr dirêje,
Esil da bed, mewt û jerê tim dirêje”.

Mala xwedê li ser sebrê ava bûye (bûyera hefta)



Wê bûyerê da wa tê qal kirinê: Bendekî xwedêyî kedhezî û belengaz hebûye. Şev, roj xebitiye, nikaribûye parî nanê tisî qazanc bike, wekî îdara nefera xwe pê bîne. Timê belengaz, bê kar û birçî dimîne. Rojekê rûdinê, halê xwe tîne pêş çavên xwe, dikeve nav mitalên kûr. Tiştêkî tu derêva dernaxe, dawiyê wa

qirar dike: “Serê xwe hildim, vî welatê derêm, terkeselawetî dinê bibim. Belkî parî nan qazanc bikim”. Usan jî dike.

Çend welata derbazbûnê şûnva welatekî gelekî dûrî nenas disekîne. Çendekî bê xebat dimîne. Welaxir, xebateke zor zehmete, pir giran dibîne. Destbi wê xebatê dike.

Gelek salên direje emirxwar dibihurin, emrê wî nîvî derbas dibe. Ew dîsa nikare tu tiştêkî ser hev da bîne. Kasivayî dest wî venakişîne. Welat, heval, kulfeta wî dikevîne bîrê. Dilê wî dişojile, kelogirî dibe. Ew gişk wî berbi xwe dikişînin. Pir hildide, datîne, qazanca xweye van salên dirêj hesab dike. Hebûna wî sê zêra zêdetir nabe. Her sê zêrê xwe hidide, berbi welatê xwe dikeve rê. Tê dertê bajarekî ewqasî ne mezin. Birçîbûn wî zor dike. Diçe sûkê, wekî hinek xwarina erzan bistîne, dîsa riya xwe berdewam bike. Dibîne ber derê sûkê kalekî rûdan sipî va alî, wê alî diçe, tê. Her dem dengêkî nizim diweklîne: “Difroşim, bikin! Difroşim, bikin!”

Xeleke kalê mêze dike, nêzîkî wî dibe. Lê destê wî da tişteki nabîne. Xwe xwe ra dibêje: “Hele pirs bikim, bê ew çi difroşe? Diqewime, ew tiştên ku difroşe, hema min ra pêwîstin”.

Dêmekî kasilî jê dipirse:

-Apo, tu çi difroşî?

Kal wî sero-pê ber çavên xwe ra derbas dike, dibê:

-Bide dû min.

Kal pêşiyê, ew dû kalê menzîleke dirêj diçin, digihîjîne parê bajêr. Kal derê malekê vedike, dikevin hundur. Talaneke dirêj ra derbas dibin, dikevîne odeke kevne çarqoşeye bê pergal. Dibîne kalekî wî kalî kaltir jorê ser bereke xilmet rûniştîye, tizbiya xwe dikişîne. Kalê ew anî selamê dide wî û dibêje:

-Bavo, min kirîger aniye.

Kalê rûniştî dibê:

-Kurê min, te bahayê malê me wî ra gotiye, yanê na?

-Na bavo, min bihayê malê hê jê ra ne gotiye.

-Wekî usane ez bêjim – kalê rûniştî dibêje, – Bendê xwedê, bahayê malê me zêreke. Zêrê xwe bide, malê xwe bistîne.

Mêrik zêrekî dide kalê rûniştî, ew zêr dike bêrika xwe û dibê:

-Dilê te çi hez kir, ew bedeve.

Mêrik tişteki fehm nake. Kalê rûniştî serê xwe berjêr dike, dîsa nerme-nerm tizbîya xwe dikişîne, bin çeva ra eşaretîya mêvan rêkirinê dide kurê xwe. Kalê pê ra hatî çavê wî dinihêre, dibê:

-Te êdî malê xwe stend, keremke rîya xwe berdewam bike.

Mêvan dilekî pir poşman xatirê xwe ji wan nexwaze û rîya xwe berdewam dike. Menzîlekê diçe, birçîbûn dîsa li wî zor dike. Paşda vedigere, dîsa dertê ber sûkê. Kalê li wir dibîne. Kal zû-zû diçe, tê, dubar-dubar diweklîne: “Difroşim, bikin! Difroşim bikin!”

Ew nêzîkî kalê dibe:

-Apo, em herin, ezê malê teyî din jî bikirim.

Kal dibê:

-Bide dû min.

Diçine cem bavê wî.

Kale dibê:

-Bavo, min kirîger aniye.

-Kurê min, zêrekî jê bistîne, ez malê din jî bidimê jê ra.

Mêvan zêrê xwe ya duda jî dide. Kalê rûniştî wî mêze dike, kene-ken dibê:

-Ya malê, malxuyê malê dizane.

Mêrik dîsa tiştê fehm nake. Kalê din dibê:

-Kerem ke, te malê xwe kirî êdî here. Mêrik dîsa poşman-poşman riya xwe berdewam dike. Perê bajêr birçîbûn dîsa li wî zor dike, paşda vedigere. Dîsa wî kalî ber sûkê dibîne. Eynî dîmen, eynî axavtin... Ew dîsa dide pey kalê, diçine çem bavê kalê, zêrê sisya jî dide û qaşo malê sisya jî dikire. Kalê rûniştî **“Sebra xwedê bike!”** dibêje û eşaretiya çûnê dide wî.

Mêrik dîsa tiştê fehm nake, bi halekî pir pejmûr dikeve rê. Perê bajêr rastî karvanekî tê, ji xwedanê karvîn rica dike, wekî îznê bide, ew jî tevî wan be. Xwedanê kavran qaîl nabe. Xulamê serkarvanê dibêje:

-Guneye, bila ew jî tevî me be. Qet nabe, wê terşekê bajo, yanê jî yekê vegeîne. Çi ziyana wiyê bigihîje me? Serkarvan qaîl dibe. Karvan ewirekê çûnê şûnva ciyê kivşkirî disekine. Her tiştî cîwar dikin, ehlê karvan dudu-dudu, sisê-sisê dibin, destbi şîva evarê dikin. Mêrik dura va wan dinihêre. Evdekî dilrehim banî wî dike, hinek masiyê şor dide wî. Masî xwarinê şûnva mêrik pir tî dibe, lê kesek dilopek av nadin. Yek milê wî digire, dibe ser bîra nêzîkî karvîn, dibê:

-Dilê te avê dixwaze, kerem ke, ev satilk, ev zincîr, ev jî bîr. Dakeve, him xwe têre-têr av vexwe, him jî satilkekê av me ra tijî ke, bîne. Hurmeta teyê cem me gişka gelekî bilind be.

Ew fehim dike ku, xapandinek heye, kî dikeve vê bîrê, êdî paşda venagere. Lê, çi bike, çare tune... Berjêrî bîrê dibe, dibîne binê bîrê meydanê gelekî fireye. Kanîke mezine orta meydanê da ye. Li vir gul banî gulê dike, bilbil banî bilbilê... Erebeke tirtire zorî zexm ser kaniyê rûniştiye. Hêla wiye rastê keçeke bedewe reş, hêla çepê keçekê spiye hê ji wê bedewtir rûniştiye. Kîngê ereb wî dibîne, herse-hêrs dibêje:

-Evdê xwedê, gelekî lez mekeve. Berê bersîva min bide, paşê dilê te çiqas av dixwaze vexwe, him jî hevalên xwe ra bibe. Rast

bêje, ez van herdu keçan kîjanê bistînîm, kîjanê nestînîm? Kîjane bedewe?

Elbêra giliyê kalê dikeve bîrê, dibê:

-Axayî xweş be. Dilê te kîjanê begem dike, ewe bedewe, hema wê jî xwe ra bistîne.

Ereb ciyê xwe radibe, dikene û tûrike zêr davêjê da. Emrî ser xulamên xwe dike, wekî çiqas av dixwaze jê ra bidin û wî sax, silamet evrazî jorê bikin.

Mêrik dema ku dertê jorê, ne karvan dibîne, ne jî karvanvana. Pir çûnê şûnva digihîje karvîn. Karvanvan dema ku wî dibînin, zendegirtî dibin. Çi jê dipirsin ew qet cawê nade, tevî wan riya xwe berdewam dike. Çend roja şunva karvan dertê ser du riya. Mêrik ji karvan diqete, dikeve riya welatê xwe. Nêzîngaya êvarê digihîje gundekî piçûk. Derê malekê dikute, xwedanê malê derî lê vedike. Hîvî dike, wekî xwedanê malê wê şevê wî mêvan xweyîke. Xwedanê malê “Mêvan, mêvana xwedê ye” dibêje û wî qazî hundur dike.

Lezek derbaz dibe, sifra şîva êvarê tê danînê. Neferê malê derva dora pêşxûnekî mezin rûdinên. Se jî tevî wan rûdinê. Lê ew bin çava va tîna xwe dide ku, kulfeteke navsere, nêzîkî darîna sê pê zincîrê darê va girêdayîye. Ew xwe usan nîşan dide, wekî qet wê nabîne. Sifra şîvê tê hildanê, xwedanê malê bermaya berav dike, davêje ber wê. Ew çî danê dixwe, dîsa ciyê xwe da rûdinê û neferê malê temaşe dike.

Oda mêvana da ciyê mêrik datînin. Sibê ron dibe, sifra taştîya tê danînê. Dîsa bûyerê êvarê dûbare dibe...

Piştî taştîyê mêrik destûra çûyîna xwe dixwaze. Dema ku hinekî ji malê dûr dikeve, xwedanê malê dû wî ban dike, ew paşda vedigere. Curê bersiv xwestinê jê dipirse:

-Mêvano, tuyî duhu va mala minda yî. Te qet tiştêkî ecêb ne dît?

Mêrik dibêje:

-Ez xulam, biborîne, min mala te da qewmandineke gelekî dûrî aqîla dît.

-Lê, te çima sedema wê qewmandinê ji min pirs nekir?

Mêrik dêmekî gelekî ji xwe razî dibê:

-Ez xulam, çi îzna min heye, wekî ez tevî şuxulê mala te bibim. Beriya tişteke dû hatiya ra ne hîştiye, gotine: “Ya malê, malxuyê malê dizane”. Mal, mala te ye, ez mêvanekim. Xwedê mala te ava bike.

Xwedanê malê destê wî digire, dibe piştta mala xwe, xêlek hestuyê mirovaye kevin û nûh nîşanî wî dike, dibêje:

-Tu mirovekî pir aqilî. Mêvanê minî delal, xwedanê van hestuya gişk bûne mêvanê min. Kîngê wana ev qewimandina didît, elbêra sedema wê ji min pirs dikirin. Seva ku ew diketine nav şuxulê mala min, ew dianîne vira û tew dikuştin. Lê, te sedema qewmandinê pirs nekir. Tu mirovekî pir aqilî. Rast dibêjî: “Ya mala, malxuyê malê dizane”. Xênî min tu kes nizane wekî ewa wî ezabê mirinê çima dikişîne.

Xwedanê malê derdixe tûrike zêr dide mêrik ra, bi hurmeteke zehf bilind verêdike, dibê:

-Here, bila xwedê oxira te timê vekirî ke. Her kes nanê aqilê xwe dixwe.

Mêrik kîsikê zêra hildide, riya xwe berdewam dike.

Çend rojan şûnva êvareke pir tarî da têdigihîje gundê xwe. Dixwaze nişkêva derê malê xwe veke, têkeve hundur û malbetan xwe re bêje: “Cavê we ronkayî be, ez hatime”. Paşê fikira xwe diguherine, hinekî mitale kirinê şûnva hêdika dertê ser xênî, kulekê ra hundurê mala dinihêre, wekî bizanibe bê hundurê mala wî da kî heye, kî tunene. Dibîne sifra şîvê hatiye danînê, xortek kêleka jina wî rûniştiye. Jin, wî xort radimûse, qurban, heyran dibêje. Du şîvê ra kulfeta wî cî datîne, herdu dikevîne nav cî, xêleka şûnva radizin.

Mêrik dilê xwe da dibêje: “Ay, hay, rastî jî îtbara jinê tune! Binêre, bê ew pey çûyîna min ketiye çi rê? Çi emela derdixe. Mêr bê xweyî dibe, jar dibe, jin bê xweyî dibe, har dibe!”

Ber çavên mêrik dibe dûman, bêhna wî teng dibe. Dixwaze nişkêva têkeve hundur û herdu xewê da bikuje û dîsa serê xwe hilde terkeselawetê dinê bibe. Dixwaze rabe, elbêra gotina kalê dikeve bîra wî: “Sebra xwedê bike!” Destê wî sist dibin, bêhna wî tê ber û hêdika cîyê xwe da rûdinê. Dikeve nav mitalên kûr...

Şeveqa sibê da jina wî radibe, devra, hundur paqij dike, paşê xort ji xew radike. Dîsa wî hemêz dike û diramûsîne.

Mêrik êdî debar nake, qemê ji kalîn derdixe, nişkêva dikeve hundur. Diqîre, berbi jina xwe û xorta direve wekî stuyê wan qutke, çepel-çepel dibêje:

-Bê şeref, te dû min ra ev xortê tûnsiz kiriye tora xwe? Erê! Ez nika deweta te, wî bi destê xwe bikim.

Jin elbêra wî nas dike, dike qîrîn, xwe davêje bin piyên wî, zû-zû dibê:

-Mêro, mêro, ez ber bextê te me, hinekî sebra xwedê bike, lez mekeve. Malik avayo, dîn nebe, ew kurê te ye. Wedê tu çûyî ez ducan bûm, tu ser rê bûyî, ji ber vê yekê min te ra ne got. Pey çûyîne te xwedê ev kura daye me. Îdî çima wî dikujî?

Mêrik demekê ecebmayî dimîne, paşê aqilê xwe komî serê xwe dike û tê rûyê xort. Bangorî rebbê jorîn dibe:

-Ya rebbê jorîn, hezar şikir dergayê te. Ya tu dizanî, kes nizane. Kal û bava rast gotiye: “Mala xwedê li ser sebrê ava bûye”. “Lez ketî, tendûra germa da dişewite”.

Patşa û keça mirtiv (bûyera heyşta)



Rojekê patşa tevî wezîr, wekîl, gelek mirovên dewletê û xêlek leşkerên xwe va dertê welatê xwe bigere, jiyana cimaetê ra bibe nas. Rêva rastî koceka mirtiva tê. Mirtiv pêş wî direqisin, lêstokên xweye cure-cure

nîşan didin.

Nav van da keçeke bêhesav bedew ber çavê patşa dikeve. Ew wê nîşanî wezîr dide. Oxirê vegerandinê şûnva banî wezîr dike, dibê:

-Here, ewê keça mirtiv min ra bistîne, bîne.

Wezîr ser vê xwesteka patşê zendegirtî dimîne, dibêje:

-Patşayê min, ew mirtiv, tu patşa! Ew navê te ra ne layîqe. Ji wê te ra jin dernayê. Serê wê têxî nav kûpê zêr-zîv da jî ewê dîsa mirtiviya xwe bike. Beriya gotiye: “Kurmê şîrî, heta pîriye”.

Patşa ser wî gelekî hêrs dibe, wezîr, zû emirê patşa ra qaîl dibe, emir diqedîne.

Patşa tevî keça mirtiv xêlek sewq-sefa derbazkirinê şûnva jê ra nav xasbaxçekî xweyî herî bedew da birceke belek dide avakirinê û wê wir da cîwar dike.

Demeke dirêj serê patşê şuxulê dewletê va mijûl dibe. Rojekê nişkêva jinâ wîye mirtiv tê bîra wî. Cilê dewrêşê da berê xwe dide birca belek. Dema ku nêzîkî bircê dibe, dibîne hundur va hemû pencere û derî pê perçê reş va hatine xitimandinê, girtinê. Dora bircê fitlekê dide xwe, tê ber dêrî. Dixwaze têkeve hundur, dengê teqe-teqê lê tesele dibe. Hêdîka derî vedike, dikeve hundur. Xwe

nîşanî wê nade. Dibîne jina wî dezmaleke reş daye serê xwe û mêzereke reş daye ber xwe. Şivdareke piçûk hildaye, nêzîkî kîjan derî û rewaqê dibe şivekê lê dixine, dengêkî zîz dibê: “Ka para min! Ka para min bide!”

Patşa ku wê vî halî da dibîne, bê deng paşda vedigere. Çawa digihîje dîwanxanê elbêra banî wezîr dike û dibêje:

-Wezîrê min, zû bike, fitê mede ruhê keça mirtiva. Te ew keçika ji kî derî aniye, ecele bibe bavêje nav wê koçê. Usan bike bila kesek te nebîne.

Wezîr çûnê şûnva ew xêleke xurt dikeve nav mitalên kûr. Poşman-poşman serê xwe ba dike, dibêje:

-“Eslê kê da çi ku hebe, zû û dereng dide dere.

Çi lîbasî lêdikî, lêke, ker dîmîne dîsa kere”

Bihêcqîmî, bihelîmî, bikî kere,

Eqara xwe unda nake tucar zêre.

Nivîsara xwedê nayê reşkirinê (bûyera neha)



Mûsa Kelîmlûlla nolî her car dîsa oxira xwe didomîne, wekî here ser çiyayê Sînîn. Ro hela ne çûye ava, dikeve gundekî ewqasî jî ne mezin. Kenarê gund dibîne ku mirovekî destên xwe daye ser herdu kêlekên xwe, zeviya pêş mala xwe temaşe dike. Dema firîktiya zeviyê bûye nêzîkî wî dibe, selamê didê. Dema ku ba zeviyê dixîne, zevî nolanî behra nîvhêrs bûyî pêl vedide. Kelîmlûlla wê dîdemê ra pir xweşhal dibe, tê rex wî disekine. Heweseke gelekî mezin zeviyê temaşe dike. Çavên wî tîra zeviyê da du simbilê bilind dikeve. Dema ba serê wan hevdu dixine, ew kubar-kubar hevdu ra diaxivin. Simbilê ewil dibê:

-Ez ruziyê kurê patşê Bakûr im.

Simbilê din dibê:

-Ez ruzê keça patşê Başûr im. Kurê patşa Bakûr û keça patşa Başûr wê bêne wir. Wê rastî hevdu bèn wê me bixwin, hevdu bistînin. Çimku xwedayê jorin xeleqa wan wa hevdu hilkişandiye. Eniya wan usan nivîsiye.

Mûsa Kelîmlûlla bê wê axavtina wan şa dibe, nişkêva dikene. Dema ku xwedanê zeviyê kenê wî dibîne dêmekî pir xeyîdî berbirî wî dibe, dibê:

-Evdê xwedê, ev jî pîrozbahiya te ye? Dewsa zeviya min ra şa bibî, ciyê sekinî bê maqûl, bê maqûl dikenî? Kelîmlûlla milê wî digire pê destê xwe herdu simbilên bilinde nava zeviyê da nîşanî wî dide. Dêmekî gelekî nûranî nerme-nerm hevdu ra axavtina wan, wî ra qal dike, dibêje:

-Rebbê jorin eniya wa çi nivîsiye wê usan jî bibe. Nivîsara xwedê nayê reşkirinê. Xwedanê zeviyê herse-hêrs rûyê wî mêze dike. Curekî pir xwe razî, dengekî zehf bilind dike hire-hir wî dikene, dibê:

-Ezê wê nivîsarê reş bikim. Mûsa xatirê xwe wî dixwaze, rîya xwe berdeyam dike. Xwedanê zeviyê vedigere mal. Lez dubendê sor hildide, wan herdu simbila dialîne, wekî wedê dirûna zeviyê ew tevî simbilê din neyêne dirûnê.

Çend roja şûnva, wan simbila difirîkîne, nav pînekî da dide malxuya xwe. Temê didêda, wekî wî emanetî cîkî kivş da veşêre. Destê kesî pê nebe. Kengê pêwist bû bîne bide wî.

Sal dibihurin, xelaîke pir giran dikeve nav wî welatî. Ji birçîbûn dê ewladê xwe davêjin. Her kes serê xwe hildide hêlekê da direve. Mirovên gund çi diçînin, şîn nabe. Rojekê berê eslê fire xwedanê zeviyê dîsa ber derê xwe disekine, dilekî kederî-xem xozana zeviya xweye reqe-rût dinihêre. Dibîne hêla Bakûr da peyak berbi mala wî tê. Tê digihîje cem wî, selamê didê. Jê hîvî dike, wekî ew wê şevê wî mêvan xweyîke. Mêrik rica wî qebûl dike. Qasek nebihure, hêla Başûr da jî peyak tê dertê cem wan. Ew jî hîvî dike, mala wî da mêvan bimîne. Ew hîviya wî jî qebûl dike. Xêlekê şûnva ew wan tîne mal. Cîwar kirinê şûnva lez dertê derva, banî kulfeta xwe dike, dibê:

-Keçê, mal da qet tiştê heye, wekî em daynîne ber van mêvana?

Kulfeta wî dêmekî pir posîdeyî perîşan çavê wî dinihêre, dengekî nerm dibê:

-E, (kulfeta kurd gelek caran navê mêrê xwe nakşîne wa berbirî wî dibe) çima tu nizanî mala me da xênî mast, şîr û penêr tu tişt tunene?

Ew serê xwe berjêr dike, dikeve nav mitala. Nişkêva dikeve bîra wî, wekî wextêda cenge genimê hev daye kulfeta xwe. Wî emanetî kulfeta xwe dixwaze. Kulfet elbêra genim dibîne, tîne dide wî, ew dibê:

-Kecê (mêrê kurd navê kulfeta xwe hilnadin, “keçê” berbirî dibin), de zû vî genim destar da bikişîne, bike hine pişrûk. Heta sibê xwedê kerîme.

Kulfet nav demeke kin da pişrûkê hazir dike, sê feraqa da datîne ber mêvana. Dema ku mêvan bisimila dibêjin, xwedanê malê nişkêva bê hemdî xwe vedibîşire. Mêvan elhemdula dibên, kevçiyên xwe datînin. Xwedanê malê dibê:

-Kerem kin, kerem kin, xurekên xwe bixwin.

Mêvan nerazî-nerazî dibên:

-Apo, me çi bê bemeîfetî kir, wekî tu bi me keniyayî? Heta tu mena kenê xwe me ra nabêjî, em nanê te naxwîn. Emê rabin, ji mala te herin.

Ew dikeve nav halekî pir giran. Bixwaze, nexwaze poşman-poşman dîroka wan simbila û gotina wî rêwiyê nenas wan ra qal dike. Mêvan ciyê xwe radibin, têre-têr dikenin, kumên xwe derdixin.

Yek dibêje, “Ez kurê patşê Bakûr im”, yê din dibêje “Ez keça patşê Başûr im”. Xwedanê malê hîvî dikin, wekî ew banî mellê gund bike, kebîna wan bibire.

Ew elbêra rica wan qebûl dike, mitheyr-mitheyr dibêje:

-Kal û bava rast gotiye: “Nivîsara xwedê nayê reşkirinê. Xwedê eniya kê çi nivîsiye ew jî bibe!”

Rebbê jorîn xeleqa hev hildikşine,

Kî kê ra nivîsiye, rastî hevdu tîne.

Patşa û gavan (bûyera deha)



Qalkir vê qewmandinê
wa şirove dike:

Mirovekî comerdî, pir
xebathez hebûye. Wî emrê
xwe da gavantiyê pêştir tu
karên cuda nekirine.
Çavên xwe vekiriye bavê
xwe gavan dîtiye. Lê
malbeta xwe da tore,
telîmekî bilindî bê himber
xuluqandiye. Neferê

malbeta wî bi gotina wî rabûne, rûneniştine. Bê destûra wî tu
gavên cuda neavîtine. Him jî tevayî mêvanhez bûye.

Rojekê patşa dilgê dewrêşa da tevî wezîrê xwe dertê welatê xwe
bigere. Eslê fire digihîjine gundeki piçûk. Qirar dikin, wekî bibine
mêvanê mal gundê ewil. Têne ber hewşekê, banî xwedanê malê
dikin. Kulfeteke navsere dertê pêş wan, zû-zû dibêje:

-Kerem kin, kerem kin, kek dewrêşên delal. Dergê meyî pêş we
vekiriye.

Ew dikevîne hundur. Kulfet wayî cî dike, dibê:

-Biborînin, malxuyê malêyî mal nîne. Gavanê gunde, xêlekê
nakşîne wê bê. Dema hatina garanê ku nêzîk dibe, çiyê xwe
radibe, derbazî xaniyê din dibe. Cilên nûh xwe dike, ser guhê xwe
çêdike. Teşteke, misînekî tijî av û şivekê dide rex. Datîne bin
linga malê. Patşa ser vê haziriya wêya ecebmayî dimîne, dibê:

-Xwîşka min, biborîne, ezê gilîkî te pirskim.

Kulfet dibê:

-Kek dewrêş, kerem ke, ez de dibihêm.

-Min her tişt fehm kir, lê tişteke fehm nekir. Ew teşt, misinê tijî
av û ev şiv te çima anîn danîne ber şêmîkê?

Kulfet vedibişire, dibê:

-Keko, helalê minî sibê da ber tavêye, westiyaye, kasil bûye, hêrs bûye. Nika tê mal, pêwîste wekî hêsa be, dest û piyên xwe bişo, mêja xwe bike. Bende ye, belkî hêrs bû, xwest min bikute... Îdî çima şivê bigere. Biborîne, tiştên din jî nabêjim.

Patşa mitheyr, mitheyri wê dinihêre, dibêje:

-Ez gerekê wî merî ra kûr bixivim, bizanibim, bê ew xwedanê çi aqil û çi nizamêye, wekî mala xwe da ev tore, telîmê bê himber xuliqandiye.

Garan tê gund, ew nanê heqê xweyî êvarê berav dike (Heyamê berê çawa edet, êvarê xwedanê dêwêr her malekê nanek didane gêvîn).

Dema ew digihîje ber deriyê malê, kulfeta wî dertê pêşiyê, eşaretiyê didê, wekî mal da mêvan hene. Gavan tê hundur, selamê dide, "Hûn ser çavên min ra hatine" dibê. Derbazî xaniyê dinê dibe, cilên xwe diguhere, dest û piyên xwe dişo, destmêja xwe dike, mêj dike, tê cem mêvana. Hal-kêf kirinê şunva kulfeta xwe ban dike, dibê:

-Keçê, lê te mêvanên meye delal ra çi xwarin hazir kiriye?

Jin awirê xwe va wî dide fehm kirinê, wekî bê îzna te ez çi xurekî dikarim hazirkim.

Mêrik vedibişêre, dewrêşa ra dibêje:

-Gelî mêvanên mine delal, Bêjin, bê îro dilê we çi xurekî dixwaze? Ez wî xurekî we ra hazirkim?

Patşa ber wê mêtantiya wî şaş dibe, dibêje:

-Dilê me kivavê dil-gurçikê berxên şîrmêj dixwaze.

Ew elbêra dertê derva, çend berxa serjê dike, bi lezûbez dil-gurçikên wan derdixe, dike kivav, tîne datîne ber mêvanan.

Patşa ecebmayî çavê wezîr dinihêre. Sibê dewrêş diçine gera xwe, gavan jî pey şuxulê xwe. Êvarê ew dîsa têne mala wî. Dibînin malxuye malê dîsa wan haziriyê duh diweklîne.

Gavan tê mal, çi pêwîste dike, dilgê nû da tê cem wan, dibê:

-De bêjin, lê îro dilê we çi xurekî dixwaze?

-Duyî sax bî. Dilê me kivavê dil-gurçikên pezê qerd dixwaze.

Xwedanê malê lez derbazî nava heywanê xwe dibe, her sê pezê xweye qerd serjê dike, dil-gurçikên wan dike kivav, tîne datîne ber wan. Patşa dîsa çavê wezîr dinihêre...

Sibê her kesek pey şuxulê xwe diçe. Êvarê dewrêş dîsa têne mala wî û her tiştî nolî du rojên dawî da dîtibûn, tê dubarekirin. Vê cara mêvan dil-gurçikên heywana girê çend sale dixwazin.

Xwedanê malê radibe, berbi koma dewêr diçe, patşa deste dû, dide pey wî. Dibîne ew dixwaze çêleka xweye avis serjêke. Zû destê wî digire, dibê:

-Bendê xweda, ez dinihêrim, tu mirovekî pir mêvanhezî, comerdî pir zaneyî. Hîvî dikim, demekê min bibihê. Çêleka avis serjê meke, were ez û tu mercekî bigrin, bê kî me ji kê dibe.

Gavan dibêje:

-Keremke, ez te dibihîzim.

-Tuyê bikaribî bêjî, golika zikê çêleka te da çi rengî da ye? Nêre, yanê mêye?

Gavan dibê:

-Kek dewrêş, golika zikê çêlekê da a reşe, mêye. Serê doçika wêye sipî ye. Xarî ser netika wê bûye. Beş tê xanê.

Patşa dibê:

-Tu rast dibêjî. Golike reşe, lê ne mêye. Boçik wê beş nake. Ew bi xwe beşe.

Giliyên wan hevdu çep tên. Patşa bihayê çêlekê ji wî dipirse, ew dibê:

-Bahayê çêleka min deh zêrin.

Patşa bîst zêra didê, ew çêlekê ser jê dikin. Gilî dibe, giliyê gêvîn. Patşa xêleke xurt dikeve nav mitalên kûre bê delav. Nikare ji nav derê. Dereng-dereng serê xwe bilind dike, çawa nolî eskerekî mexlûb bûyî, sêfil-sêfil wezîr dinihêre, awirê xwe va eşaretîya ‘em çûn’ dibêje. Îzna çûnê gêvîn û bermaliya wî distînin. Oxura xwe berdewam dikin.

Çend roj dibihurin, rojêke roja xwedê dema ku gavan garanê tîne gund, ber derê xwe xêlek mirovên nenase çek silahe heyte hût dibîne. Dilê wî siêt dibe, çokên lê dilerizin. Xêleke xurt ditirse, xofgir dibe, hêdî-hêdî nêzikî wan dibe, kîbûna xwe dibêje. Ew wî elbêra dibine huzura patşê. Gavan dema ku dikeve hundur, pêş çavên xwe dewrêşê mêvanî xwe dibîne, tafilkê patşê nas dike. Tirse-tirs selamê didê. Patşa selama wî vedigire. Ciyê rûniştandinê nîşan dide, dibêje:

-Evdê xwedê, rind min mêzeke.

Gavan dibêje:

-Patşa sax be. Çima ez waqasî jî nezanim, wekî mêvanê xwe nas nakim?

Patşa vedibêje:

-De wekî usane, min rind bibihê. Tu mirovekî pir aqilî, comerdî. Were bibe wezîrê min. Emrê xweyî mayî nav eşq-şayê da derbaz bike. Ez hewcê mirovekî nolî teyî zane me.

Gavan wî meze dike, hinek difikire û dibêje:

-Patşa sax be. Ez nikarim bibime wezîre te. Qulix mêzera berbere. Îro stuyê min da ye, sibê stuyê yekî din da ye. Lê qulixa mine daîmî ye. Bîr meke, xwedê tu ser dûvê berîn xuluqandî, kêreke tûj daye destê te. Dilê te çiqasî dixwaze, ewqasî jî dikî. Lê ez ser sturiyê berîn xuluqandime. Temam rojê sturu vedirojim. Ancax misqalekî jê diqetînim. Dinya boy te dûvê berîne, boy min sturiyê berîne.

Patşa ber vê bersîva wî hişmetkar dimîne, xelateke qîmet bilind dibaxşîne. Dispêre xizmetkarên xwe, wekî wî bê qezya ji ku anîne bibine wir.

Riya emir gezgezk, sirîn, kaş-kerîş, kevir-kuçike,

Xwedê ruza parvedike lûfik-lûfik, biçûk-biçûke.

Hineka ra par dişîne bextewarî rojên geşe,

Hineka ra belengazî, ax û keser, demên reşe.

HELBESTÊN BÌ ZĪMANÊ RÛSÎ

Стихотворения на русском языке

В ТРУДНЫЕ ГОДЫ

Поэма

Благодарю тебя, казахский брат,
За доброту твою, гостеприимство.
И в бедности ты был душой богат,
Цена превыше дружбу и единство.

ПЕРВАЯ ГЛАВА

Холодный ветер с гор подул

Год 1926-ой

Ах, в этой жизни непростой
Не скажешь времени «Постой!»
Ушел от нас двадцатый век,
Растаял, как вчерашний снег.
...Но возвращает память нас
В тяжелый день, в суровый час,
В трагичный год двадцать шестой,³
Что роковою стал чертой:
Лишились мы родной земли
И только память сберегли,
А новым домом стал для нас
Седой Кавказ.
Здесь мы построили очаг,
И он от ветра не зачах,

³ В 1926 году после подавления турецкими войсками национально-освободительного восстания Шейха Саида (на территории Северного Курдистана) более 4 тысяч курдских семей бежали на Кавказ.

Здесь наши дети родились,
Мечты чаянья сбылись.
Как к дому горная тропа,
Здесь пролегла моя судьба.
Пусть кто-то горя здесь хлебнул,
Но кто-то счастья зачерпнул,
Трудясь не покладая рук,
И каждый был соседу друг,
Все люди братья были мне
В большой стране.

Год 1937-ой

Не так уж много лет прошло,
Но вновь насилие и зло
Постигло бедный народ,
Едва окрепший от невзгод,
Народ, что в счастье верить стал,
Что от гонений так устал...
«Отец народов» был жесток,
Ему сказать никто не мог,
Что люди – это не трава:
Из горя вырвавшись едва,
Народ надежду обретал.
Но час настал...

Был четко выполнен приказ,
И содрогнулся весь Кавказ,
Когда без видимых причин
Сгоняли женщин и мужчин
И выселяли стариков
Из обветшалых их домов:
-Зачем? И кто здесь виноват?
-И кто прислал сюда солдат?
Кто отдал им такой приказ?
-За что, куда уводят нас?
В ответ солдат на них навел

Винтовки ствол.

...Аулы таяли в пыли:
Крестьян изгнали с той земли,
Где огороды и сады
Благословляли их труды,
Где зрел не снятый виноград,
Где летней ночью звездопад
Шатер подлунный освещал,
Влюбленный счастье обещал,
Где каждый камень был знаком,
Как слово «Родина» и «дом»,
Где одинокий минарет
Хранил от бед.

Пожитки жалкие влача,
Курдянки, плача и крича,
От неожиданных смертей
Под юбки прятали детей.
Мужчины, стиснув в зубы, шли:
Что объяснить они могли?
Но догадались старики:
Что судьбы будут нележки,
Раз их заставили спешить...
Но – надо ехать, значит – жить.
Молитвам их внимал Аллах
На небесах.

Пусты аулы: вой собак,
В разбитых окнах – хлад и мрак,
И даже речка не поет –
Она на камни слезы льет.
Застыли стрелки на часах,
Застыли тучи в небесах.
Умолкли птицы, и с небес
Свет солнца ясного исчез,

А гордый символ гор – орел
В ущелье смерть свою обрел:
Прощаясь, в небе он завис,
И – камнем вниз.

На обескровленный аул
Холодный ветер с гор подул
И только к ночи он затих
В домах разграбленных, пустых,
А утром вновь, как горя стон,
Он зазвучал со всех сторон.
С листвой простились тополя,
Оделась в траур вся земля.
На обезлюдивших полях
Сиротски хлеб несжатых чах,
Как саван, снег его накрыл
И погубил.

Два рельса, словно две змеи,
По нашей жизни пролегли,
И на восток товарняком
Путем, что не был нам знаком,
Народ, что скошен как трава,
Перевозился, жив едва.
Втоптали в души гнев и страх:
Народ мой таял на глазах,
Останки близких и родных –
Во рвах, на станциях чужих.
В степи, где спутаны пути,
Их не найти.

Ноябрь. Степные холода.
Остановились поезда
На дальней станции. В снегах
Нас ждали неизвестность, страх,
Отчаянье, и вновь конвой,

Ах, в этой жизни непростой
Не скажешь времени «Постой»!
Прошли года, и вот я сед,
И внуки говорят мне «дед»!
Пусть Казахстан им – дом родной,
Я расскажу: какой ценой
Достались мир, и хлеб, и кров;
За что лилась людская кровь,
Кому нужна была война –
Да будет проклята она;
Что в этом мире Дружба есть,
Любовь и Честь!

Как трудно гордость умирять,
Как тяжело друзей терять,
Как страшно горе горевать,
Как трудно души врачевать.
Уверен: внуки знать должны
Историю родной страны,
За что Отечеством зовем
Страну, в которой мы живем,
И почему непобедим
Народ тогда, когда един.
Для жизни и для счастья дан
Нам Казахстан!

Ты, Казахстан, нам дверь открыл
И наши раны залечил,
Ты равные права нам дал
И сыном каждого назвал,
Сказав: В стране моей большой
Скиталец бывший – не чужой.
Живите в городе, в селе,
Как на родной своей земле.
Чтоб не страшна была зима,
Постройте крепкие дома.

Излечит от душевных ран
Вас Казахстан!

Не пряча изможденных лиц,
Как стая перелетных птиц,
Мы на твою присели грудь,
Чтоб от несчастий отдохнуть.
Нам степь холодная дала
Комфорт душевного тепла.
Мы свили гнезда – здесь наш дом .
На доброту твою трудом
Ответил мой народ, и вот
В семье единой он живет.
Для дружбы и единства дан
Нам Казахстан!

Ты силу и терпенье дал,
С колен униженных поднял,
Ты он несчастий и невзгод
Избавил бедный наш народ,
Своею братскою рукой
Вернул нам радость и покой,
В сердцах надежду поселил,
От горя, страха исцелил.
В глаза несчастных заглянул
И нам достоинство вернул,
Своим дыханьем отогрел –
Ты все сумел!

...И пусть судьба трудна была,
Но жизнь опять свое брала:
Увидел свет и первый звук
Пролепетал мой первый внук.
И даже я в мои года
Бываю счастлив иногда:

Вниманьем женским дорожу
И грудью полною дышу!
Сентябрь! И вновь, как в первый раз,
Пойду я с внуком в первый класс!
Великий день, счастливый миг:
Он – ученик!

Всему наступит свой черед,
И внук стихи мои прочтет,
Из них узнает: как я жил,
За что страдал, кого любил;
Что жизнь бывает непростой,
Что слово «друг» - не звук пустой,
Бывает дружбе – жизнь цена,
А жизнь у нас всего одна,
Второй прожить не суждено
И многое предрешено...

Казахский брат, ты стал щитом,
Ты нас впустил в свой щедрый дом,
От горькой уберег судьбы.
Ты нам сказал: Вы – не рабы,
Не пасынки, не должники
И мне – друзья, а не враги.
Сегодня вместе мы идем
Демократическим путем,
Наш Президент – гарант тому,
И доверяем мы ему!
Нам в буре жизни кормчим дан
Наш Нурсултан!

Когда ведет судьбы звезда?
Мы строим общество труда!
Нет рая там, за рубежом.
Мы в сказку превратим свой дом!
И пусть нам нелегко в пути,

Но вместе – весело идти!
Сто языков моей страны,
Как песни радостной весны:
Под флагом неба голубым
Мечту в реальность воплотим!
Я верю, что для счастья дан
Нам Казахстан!

Надиру Каримовичу Надирову, первому курдскому казахстанскому академику, великому сыну курдского народа⁴

О матери твоей скорбя,
Скажу: земля ей пухом будет.
Народ ее не позабудет
За то, что родила тебя.

Ты, как Хани, неся прогресс,
Живешь несуетно и мудро,
Трудом возвысив имя курдов,
К ним приумножив интерес.

Ты много так преодолел,
По склону поднимаясь круто:
Таланту следуя, сумел
Не отклониться от маршрута.

Лишенья, бури ты постиг,
Не прячась робко средь утесов,
Для Казахстана ты велик,
Как для России Ломоносов.

Ты светишь яркою звездой
На небе мировой науки.
Неотразимый образ твой
Пусть повторяют дети, внуки.

Аллах тебя благословит!

⁴ В 1937 году многодетная семья Надировых вместе с соплеменниками была депортирована в Казахстан. На руках у матери Каре был маленький Надир – будущее светило мировой науки.

Да будет время благосклонно.
Живи в почете и любви,
Ведь море радости – бездонно!

Идешь по жизни, мир любя,
И век – не возраст для тебя,
Когда хранит Любовь сама –
Жена и друг твой Халима.
Сто лет – не горизонт! Вперед!
Ты слышишь?! Жизнь тебя зовет!

СЛОВО ПОЭТА

К 100- летию Везире Надири

Скажи, почему мое сердце в груди, словно факел горит?
Скажи, почему на глаза навернулась слеза?
Стою на могиле твоей, словно сын, Везире Надири.
Прочсть твоё имя на камне без скорби нельзя.
Поверить, увы, невозможно, что ты, искрометен и смел,
Безмерно талантливый, смелый, с высокой душой,
Ушел так безвременно, песни допеть не успел,
Жестоко убитый коварной рукой чужой.
Прекрасные маки улыбкой твоей в горах расцвели,
Чистейший источник бурлит, словно сердце твоё.
Ты - сын Курдистана – родной и любимой священной земли.
Ты пел гуманизм, справедливость, ты знал, что большая
любовь
Сыны Курдистана – их Родина благословит.
Проснись, Везире! Мы стоим на пороге великой мечты:
Америка, Африка, Азия выбрали путь.
Нет, розами он не усыпан : покуда повсюду шипы,
Но цель – демократия. Знаем: с пути не свернуть!
Вставай, Везире! Обрати мудрый взор на Восток.
Заря занимается, новый рождается день,
Поет Гулизар, добивается счастья отважный Надо!
С лица нашей Родины скоро исчезнет тревожная тень!
Твой образ прекрасною птицей над всем Курдистаном парит.
Ты – в песнях героев, в неистовом сердце моем.
Твой образ нетленный опять вдохновеньем со мной говорит.
А слово поэта сравнимо бывает с огнем

ДЖАМИЛЯ

Горя тяжкого твой внезапно
окутала дом, Джамиля.
Не повинен никто, кроме рока
бесстрастного в том, Джамиля.
Словно вырвано сердце твое из груди,
Джамиля, и в ночи
Неутешно оно об ушедших из жизни
рыдает, кричит.
Буря двери твои отворила, и град
зашумел за окном.
И беда, что случилась, все кажется тягостным сном.
Невозможно поверить, что близкие
люди ушли навсегда,
Что в отеческий дом не вернуться они
никогда, никогда.
Смерть коварная свой урожай собрала.
Но за что ж, но за что ж
Эту скорбную дань платит жизнью
своею, увы, молодежь?
Безутешна ты в горе, родная, с тобой
застонала земля...

Пусть любовь моя верная слезы осушит
твои, Джамиля.
Годы раны залечат, и внуки, я верю,
прославят твой род.
Радость в дверь постучит: время
движется только вперед и вперед.
Тяжесть прожитых лет сединою лежит
на висках, Джамиля,
Доброта и любовь, словно солнце, сияют
в глазах, Джамиля.

Ты не плачь, дорогая, пока мои руки
нежны-
Обниму твои плечи, и мы доживем до
весны.
Пусть ноябрь на дворе, и осыпались розы
в саду.
Для тебя, Джамиля, я букет поцелуев
найду.

Вольный перевод с курдского

Марины Стукалиной

Поздравление семье Барие Бала

Свершилось, курды, братья мусульмане
Вот две души взошли, на верный путь
Они обычай чтут, теперь в Коране
Смысл жизни, святость веры обретут
Два сына вы, два отрока любимых
Ваш папа Алик, мама Гульнара
Сдержат восторг своей души не в силах
Быть мусульманином настала вам пора
Ваш дед Барие Бала и горд и светел
Глядит на вас с улыбкой мудреца
Еще двух чад, Аллах приветил
А жизнь с Аллахом – радость без конца
Достойный крив Нурхан Бей все эти годы
Ты был, наперсником ты другом был, семьи
Прими ж благословенные заботы
Отцовством новы, сердце напои
Нурхан – Кадыр сегодня возмужали
Но ум их зыбок разыграют кровь
Чтоб в жизнь свою пороки не списали
Нужна им и опека и любовь
Храни им частоту, духовность, веру
Культурой курдской души напитай
Будь вместе с Аликом для них во всем примером
Скатиться по наклонной им не дай
Хочу закончить слово из Корана: «Аллах всегда и всюду и во всем»
Пусть люди в жизнь вам не наносят раны
Да будет счастливый курдский дом

Касымова Гульназ Амирхановна

NAME JÎ EMERÎKÊ SERDAR

Nûra, keça min hersê pirtûkê te minra xwendin. Hilbet, berê jî ez ser wê fikrê bûm, ku şureta teye efrandarîê heye. Van hersê pirtûka ew bawerbûna min diha dane kûrkininê. Eferim tera bona çapkirina wan pirtûkê delal. Ez dixwazim tomerî ser destanîn û kêmasiyê te bisekinim.

Destanîna here berbiçav nava poêziyaa te da ewe, wekî wê da kedera evîntiyê gelege (îlahî wan helbesta da, ku pêşkêşî xûşka mine rehmetî Dîlberê kirîne). Wan da kedera hizkirinê, kedera emir gelege û ew digihîje aqil û sewdayê xwendevana. Xwendevan ji te bawer dike, wekî rastiyê jî ji dinê çuyîna xûşka Dîlber bona te kedereke gelekî mezine.

Helbestê bona zara ewqasî kurt û delalin, wekî hewasa merya wanra tê. Ew helbest anegorî femdariya zara hatine nivîsarê û gelekî hêsa ji aliyê wan da dikarin bêne qebûlkininê. Ezê gelekî şabûma, wekî ew helbest biketana kitêbê dersê zimanê kurmançî.

Destanîneke van her sê pirtûka jî ewe, wekî mesele, metelok û îdîomê zimanê kurdî wan da pirin û gelekî ciyê xwe da hatine xebitandinê.

Başbûneke van her sê pirtûka jî ewe, wekî zimanê te dewlemend û zindiye. Gelek cara ew helbest, poem û şano dibin mînanî nimûnê zargotina me. Wanda erf-edetê me tê kivşê, xeberdana meye zindî wan da heye (dua, nifir û yêd mayîn).

Dîalogê te zindî ne, wanda henek gelekî û ji aliyê xwendevana da baş tene qebûlkininê.

Aliyê hûmorê (pêkenok) û satîraê da jî destanîne te berbiçavin. Ew nava gelek efrandina da hene û xemleke baş dane wan.

Ew yek jî gelekî min xweş hat, wekî tu sifra efrandinada yanê jî hinek cara dawîda şirovedikî, wekî ew efrandin ser hîmê çî rêaliyê hatine nivîsarê. Eva yeka te gelekî nêzîkî dilê xwendevana dike, nîgara teye merivayê tê ber çavên wan. Eva jî mînanî pirakêye, ku nebera te û xwendevanada tê sazkininê.

Bi texmîna min, te dixwest zanibî fikra min derheqa poêmê teda. Nûrê gişk min ra xwendine. Piranya wan ser qewmandinê real hatine hûnandinê. Gelekî min xweş hat poêma teye “Çar emir, çar

demsal”. Himberî hevkirin gelekî rinde, xwendevana dide bawerkirinê. Te çawa nazikayî hev hûnandye demê emrê merya û demsal! Îlahî ew nazikayî wê yekêda heye, wekî te emrê ahil da cudatî dîtiye.

Lê mixabin, wekî te dawya poêmê da demsal û emrê merya himberî parçebûna Kurdistanê kiriye. Eva yeka tu cara hevdu ra nayêne girêdanê. Te filosofiya emir û seyasetî tevîhev kirye. Lê ew tiştne başqe-başqene.

Ez te ra wê yekê jî bêjim, wekî Nûra min jî mînanî min derheqa pirtûkê te da ser fikra mine.

Poêma teye “Paşa û Belgîzar”-êda fîlosofî êpêceye. Mesele, gelekî me xweş hat, wekî sîfta poêmêda dinivîsî Xwedê 3 tiştê ferz daye merivayê – bext, av û agir. Eva fikra mînanî têlekî sor temamya poêmê ra derbaz dibe.

Tu zehf rind didî kivşê, wekî merî gerekê dinyaê da çawabe – qençbe, helalbe, rastgobe, karê sazdarîyê bike û xemleke tezeye geş bide vê cihanê. Tê kivşê, eva lêymotîva emrê teye û nîgara te bi vî cûreyî tê ber çavê me.

Syûjêt başe û hewaskare, ser qewmandinê real bingeh bûye. Lema jî ewqasî hewaskar tê xwendinê. Mesele, emrê Emerê bavê Paşa gelekî rind hatye nîşandayînê, bi zelûlî belengazya wî û kuştina wî. Tu gelekî rind zûderbazbûna wede, evîntiyê nîşan didî. Mesele:

“Roj zû diçûn, meh dihatin,
Meh difiryan, sal dihatin”,

yanê:

“Hub, cahiltî birê hevîn,
Nav emirda timê tevin”.

Bedewya Belgîzarê rind hatiye nitirandinê, deweta li zozana tê ber çavê xwendevana. Gelekî zindîye, gava Hesên axa dewetê da Belgîzarê dibîne û ser bengî dibe. Erf-edetê dewetê me te rind anye ber çeva (şerê bona balgî, lêxistina sêva serê bûkê, kaxa

binpê bûkê û yêd mayîn). Gelekî bi sarkazm timatiya bavê Belgîzarê hatiye nivîsarê, wekî ew bona qelen çî dike. Ê eva yeka bi xeberdana zindî hatiye nîşandayînê.

Lê ez dixwazim çend kêmasîyê vê poêmê jî te ra bêjim. Baş nîne, gava gele cara rîtmovke tê teribandînê, yanê jî rîfm (beşavend, hevdeng) tune. Kêmasîye, wekî pê xeberekê tu du xeta hevdu tînî.

Kêmasîye usa jî dawya şanoya “Têlî û Miho”. Raste, dîalog pîsêda zindîne, gelek mesele û metelok hene, lê dawiya şanoê xwendevana nade bawerkinê. Carekê ra her tişt tê guhastînê, ku ne anegorî logîkaêye. Mesele, çawa paşî kuştina Miho û xwekuştina Têlîyê bavê wê xwe davêje bera Wanê. Eva şanoêda nayê makkirinê, îlahî paşî wê yekê, wekî bavê Têlîyê pêşî çî zulm kirye, çawa berbirî qîza, jina xwe dibû. Merîkî usa nikare xwe hêsa bavêje berê.

Ew qewmandina gundekî Qazaxstanêda qewimî jî hewaskare, ku bûye qînyatê poêma te “Nado û Narê”. Tiştê baş vêderê ewe, wekî tu berbirî dê-bava dibî qîza bê dilê wan nedne mêr, nebne sebebê bêbextiya wan. Eva yeka usa jî şanoya teye “Seyran”-da hatiye kivşkirinê, li ku xênji wê zulmê usa jî ferzbûna xwendina qîza tê nîşandayînê. Başê emrê xwendkara, hevaltiya wan, berbirîbûna lêktora berbi wan hatiye nîşandayînê. Lê me xweş nehat, wekî nîgarê şanoê te bi xeysetê xweye merivayê va hevdu nayêne cudakirinê. Tu daha gelekî derheqa wanda xeber didî, ne ku psîxologîya wan nîşan didî. Kêmasîye usa jî ew yek, wekî nîgarê te gişk mînanî hev xeber didin, cudatya xeberdana wan tune. Ewê jî bêjim, wekî pirtûkan da şaşî herfa, telebextra, hene. Gele cara ewana fikra xeberê, cumlê fe’ş dîkin. Guhdarîê bide ser vê yekê.

Nizanim tu zanî yanê na, Nûrê şirovekirin nivîsye derheqa weşanxana “Zengezûr”-êda, ku malpera kurdist.ru û kurdistan-post.eu-êda (malpera Hejarê Şamil) hatiye çapkirinê û derheqa her sê pirtûkê teda bîr anye. Wekî pirtûkê te nîbûna, ku ketine destê me, Nûrê wê şirovekirina usa nenivîsya.

Gelekî me xweş hat şiklê neferê mala te. Tê kivşê rastîyê jî maleke kurdaye eynsîye. Xênji deb û kûltûra wedê niha ew usa jî xweyê deb û kûltûra xweye mîletîyêne.

Tê bibaxşînî, dibe min kêmasî daha gelek dane kivşê, çimkî min nedixwest efrandinê birakê min da kêmasî hebin. Ew efrandin gelekî Nûrê jî xweş hatin... Nizanim tu zanî yanê na, Nûra min endama Yekîtya nivîskarê Ermenîstanêye.

Bi daxwazê here qenc,
birakê te Emerîkê Serdar.

28.06.2012
Yêrêvan.

Sponsorên pirtûka



Nurhan Beşik. 17 Gulanê 1966-a li Erzûrûmê hatiye dinê. Dibistana amadehiye li Senbolê qedandiyê. Li Enqere Zankoya Texnîkî ya Rojhilata Navîn (Ortadoğu Teknik Üniversitesi - ODTÜ), fakulteya endezyarê elektirik xilas kiriye.

Salên dirêj endezyarê nivîsbarî (software engineer) kar kirinê şunda, 2000 salê da firmayê xwe ava kiriye. A niha li welatên Azerbaycan, Qazaxistan, Gurcîstan û Elmanya da karên bazirganiyê dike.

Dosta malbeta Barîyê Bala û têkarê Eliyê Barî ye. Nurhan Beşik, wek mirovekî demokrat alîkarbûna ji bo pêşxistina çand û hunera Kurdî erkê xwe hesab dike.

Elîyê Barî. 1967 salê Komara Ermenîstanê, nehya Masîsê, gundê Rihanliyê hatiye dinê. Dibistana navîn 1985 salê li nehya Masîsê da qedandiyê. Du sala Arteşa Sor da xîzmet kiriye. Li komara Ûkrayayê, bajarê Kîyêvê da zankoya tendirûstiyê xilaz kiriye, bûye bijîşka dirana.

Girêdayî şerê Qerebaxê ew koçberê komara Azerbaycanê dibe, bajarê Bakûyê da bijîşkê dirana kar dike.

2000 salê cîguhezî komara Qazaxistanê dibe. Niha karsaziyê ra mijûle.

NURHANÊ DELAL

Dema rebb tu xuliqandî,
Dergê rehmê ber te vekir.
Emir da pîr nezêrandî,
Per-baskên xwe ser te werkir.

Nîşa helal hilstirayî,
Hasil kirî paqîş, zelal.
Boynet ruza meêşyayî,
Cem bendê xwe kirî delal.

Boy kîrnên xwe bersiv didî,
Ev şertekî mêraniye.
Xwe boy heqiyê feda didî,
Ne hunerê her kesîye.

Rebbê jorîn dikim rica,
Serbilindbî hergav hêca.
Qezya, bela gelek dûr bî,
Bê ax-keser, xwedî ser bî.

Berna, Îpek herd gulên te,
Kubar bibin bin siya te.
Telp nepaka daîm dûrbin,
Eşq, şa bijîn, heta hebin.

ALFABÊYA KURDÎ / КУРДСКИЙ АЛФАВИТ

	Курдский алфавит (латиница)	Курдский алфавит (кириллица)	Русская транскрипция
1	A a	А а	А а
2	B b	Б б	Б б
3	C c	Щ щ	Дж
4	Ç ç	Ч ч	Ч ч
5	D d	Д д	Д д
6	E e	Э э	...
7	Ê ê	Е е	Э э
8	F f	Ф ф	Ф ф
9	G g	Г г	Г г
10	H h	Н н/Н'н'	...
11	I i	Ь ь	Ы ы
12	Î î	И и	И и
13	J j	Ж ж	Ж ж
14	K k	К к/К'к'	К к
15	L l	Л л	Л л
16	M m	М м	М м
17	N n	Н н	Н н
18	O o	О о	О о
19	P p	П п/П'п'	П п
20	Q q	Q q	...
21	R r	Р р	Р р
22	S s	С с	С с
23	Ş ş	Ш ш	Ш ш
24	T t	Т т/Т'т'	Т т
25	U u	Ö ö	...
26	Û û	У у	У у
27	V v	В в	В в
28	W w	W w	...
29	X x	Х х	Х х
30	Y y	Й й	Й й
31	Z z	З з	З з

NAVEROK

Pêşgotin

HELBEST

Bendê xwedê, mirin heye

Diçim, diçim

Kuda herim, ku bigerim

Barî me ...

Mêze dikim, baş nabînim

Dilo, pir meêşe, gelek zûye

Ya xwedanê erş û kursî ...

Ya xwedanê bê xwedana

Gelê kurda, dem hatiye, hemû rabin

Serok Berzanî li Enqerê axivî

Gelê qazax, cejna bîst saliya serxwebûna te pîroz be

Helbest çiyê ...

Dostê minî pir ji xwe razî

Dostê minî xap-xapok

Hezkirin

Çavbeleka min ..

Geriyam

Berfa ewil

Xwezil

Nazika kurd

Gulê

Nûra min

Çarxet

Rewakirin

Zanyarê navdar

Xizmetkarê gelê kurdî newestiyayî

Tahir Silêman

Xelata te pîroz be!

Xizmetkarê çand û hunera gelê kurd Emerîkê Serdar ra

Dota uris

Hesîp Qeplan ..

Qadirê min

Boy zarokan

Kewrîşka min
 Sala teze
BÎRANÎN ...
 Seyda Şamil
 Qencî nayê bîrkinê ...
DEH HÎKMET (BÛYER)
 Kur got: Bavo, hêştir difroşin
 Patşa dilgê dewrêşa da welatê xwe digere
 Derhega Mûsa kelîmlûlla
 Derheqa dostiya şivan û mar da
 Keça mêrxas
 Patşa diza efu dike
 Mala xwedê li ser sebrê ava bûye
 Patşa û keça mirtiv
 Nivîsara xwedê nayê reşkirinê
 Patşa û gavan ...
HELBESTÊN BI ZIMANÊ RÛSÎ
 В трудные годы (Поэма)
 Надиру Каримовичу Надирову
 Слово поэта
 Джамиля
 Поздравление семье Барие Бала
 Name ji Emerîkê Serdar
 Sponsorên pirtûka
 Alfabêya kurdî

BARIYÊ BALA

Deh bûyer

Rêdaktorê sereke: **Kinyazê Îbrahim Mîrzoyêv**
Rêdaktorê berpirsiyar: **Hejarê Şamîl Esgerov**
Korrekto: **Hesenê Rizgoyê Paşê**
Rêzber: **Nazîle Esgerova**

Главный редактор: **Князь Ибрагимович Мирзоев**
Ответственный редактор: **Гажар Шамилович Аскеров**
Корректор: **Гасане Рызгое Паше**
Набор: **Назила Гажаровна Аскерова**

Tiraj: 500

Weşanên Zengezûr
Bîşkêk

Rêdaktorê sereke: **Hejarê Şamîl**
hejare_shamil@hotmail.com

Rêvebir: **Gulşana Musa Xelîlova**

Wêneya bergê: **Koşka** Îshaq Paşa. Bazîd. Wêne: Sadik Kökoz

Weşanên Zengezûr

KURDÎ

- 1 - *Hejarê Şamil / Madîna Knyaz*. Jiyan di rêya welatparêziyê da. – 2007. (Lêkolîn).
- 2 - *Barîyê Bala*. Dîlbera Min. 2008. (Helbest).
- 3 - *Barîyê Bala*. Dayîk. 2010. (Helbest).
- 4 - *Barîyê Bala*. Kulîlkên Necilmisî. 2011. (Helbest).
- 5 - *Hesenê Hecîsilêman*. Axîna dil. 2011. (Helbest).
- 6 - *Evdile Îbrahîm Şemoyî*. Êşa dil. 2011. (Helbest).
- 7 - *Barîyê Bala*. Deh bûyer. 2012. (Helbest).
- 8 - *Evdile Îbrahîm Şemoyî*. Evîna nemir 2013. (Helbest).

РУССКИЙ

- 10 - *Гажар Аскеров*. Курдская диаспора в станах СНГ. – 2007 (Исследования).
- 11 - *Азизе Зийо Бадырхан*. Красный Курдистан. – 2009. (Исследования).
- 12 - *Вакил Мустафаев*. История кавказского Курдистана. 2011. (Исследования).
- 13 - *Курды Кыргызстана*. Ответственный редактор: Аскеров Г.Ш. 2011. (Каталог).
- 14 - *Традиции и инновации в культуре курдов Кыргызстана*. 2011. Редакторы: Скрипкина С.М., Аскеров Г.Ш. (Материалы круглого стола в рамках проекта ЮНЕСКО).
- 15 - *Камиз Шаддади*. Русско-курдский разговорник. 2012.
- 16 - *Азизе Зийо Бадырхан*. Человек легенда. 2013. (Исследования).

AZƏRBAYCANCA

- 17 - *Həjarê Şamil*. Yalnızam təkəm tenhayam. 2008. (Şerlər).

PDF:

Enstîtuya Kurdî ya Qefqasyayê

Web:

<https://www.ensiklopediyakurdi.com/>

Tel.:

+7 918 073 48 79

